



HEJMAR: 3
Sal: 2 Buha: 500.000 TL

ZEND

400 Sallya
Nivîsandina
Şerafnameyê
■ MEHRODAD IZADY

Kemalîzm û
Pirsgireka Kurdi
■ ISMAİL GÖLDAŞ

Dêrsim ra ve Dare
Estene Seyid Riza
■ J. İHSAN ESPAR

Di Diroknaîvisiya
Kurdan de du
Bawerî
■ CEMİLGÜNDÖĞAN

Lêhûrbûneke Bîçûk
Li Ser Devoka
Semsûrê
■ SAMÎ BERBANG

Serhildana Ismaîl
Axayê Şikak
■ ŞİYAR C.OREMAR

Kîrdar û Kat Le
Zimanî Kurdi
■ KURDO ELİ

Zman
■ F.HUSEYN SAĞNİC





*Osman Sebri
di 1906 an de
li Bakurê
Kurdistanê li
devera
Meletiyê çavêr
xwe ji ronahî
re vekir. Li ber
zilma Romê b
gelek
Welatparêzan
re derbasî
Başûrê biçûk
bû. Di kovari
Hawar ê de
gelek
helbestên wî
batine
weşandin.*

OSMAN SEBRÍ

*Ewîndarê zimên, welatparêzê pejnakar û afirînerê jiyaneyeke watedai
Osman Sebri li hemberî jiyanâ ku bi kul û keseran mişt û tijî û kam-
baxiya kedxwir û neyaran di çarîkeke helbesteke xwe de bi vî rengî di-
qîre:*

*Xwe danînim bo sitem û zorê
Divê serbilind ez biçim gorê
Gava bi rûmet çûme goristan
Hêja ye bibim lawê Kurdistan*

*Osman Sebri di 12 Sermaweba 1993 yan de çû ser dilovaniya xwe. Em
bi rêz û hûrmet û bi evîneke kûr wî bi bîr tinîn.*

Kovara sê mehî ya lêkolîn û

lêgerînen zanistî

(Üç ayda bir yayınlanır)

Li Ser Navê Mezopotamya

Basin Yayın A.Ş.

Xwedî:

Yıldız GÜLTEKİN

Gefnendeyê Giştî yê Weşanê

Hasan KAYA

Berpirsiyara Nivîsaran

Zeynep YAŞ

Cihê Kargeriyê:

İstiklal Cad. Turhol Han

No: 373 Daire: 2

Beyoğlu / İSTANBUL

Navnîşana Kovarê:

Atatürk Bulvarı.

Ceylan Palas Apt.

No: 154/12 Aksaray

Tel: 527 19 11

Fax: 527 61 49

Çapxane:

Ceylan Matbaacılık

Sala Weşanê:

Payîz 1997

Zend Dergisi Mezopotamya Basın Yayın A.Ş.'nin

Bâmsel Araştırmaları yürüten Aksaray şubesinin yayındır.

BUHAYE İLANË

Berha dawîn aliye der: 100 milyon TL. Hundîre

berga pêşin û berga dawîn: 75 milyon TL.

Di nîv kovarê da tam rûpel: 50 milyon TL.

Di nîv kovarê da nîvrûpel: 25 milyon TL.

NAVEROK

400 Saliya Nivîsandina Girîngtirîn Berhema Neteweya Kurd

Şerafnameyê

Mehrdad Izady 3-5

Bingehehê Hesêb bi Kurdî

I. Nasso 6-7

Li Mezopotamyayê Heteredoksî

S. Bulut 8-11

Kemalîzm û Pirsgireka Kurdî .

Ismail Göldas 12-17

Gulaşa Nîjadperestî û Neteweyên Welatparêz

Rodulfostîfhîgen Basingstke 18

Dêrsim ra ve Dare Estene Seyîd Riza

J. İhsan Eşpar 19-24

Bandora Çirokan li Gel û Nivîsandina Wan

Çiya Mazî 25-30

Di Kurmancî de Erk û Fonksiyona "di" yê

Zana Farqîmî 31-34

Di Dîroknîvîsiya Kurdan de Du Bawerî

Cemil Gündoğan 35-40

Lêhûrbûneke Biçük Li Ser Devoka Semsûrê

Samî Berbang 41-46

Dîroka Başûrê Kurdistanê ya Nêzîk

Zülküf Kışanak 47-52

Zargotina Kurdî Metodên Lêgerînê

Ahmet Aras 53-55

Serhildana Îsmaîl Axayê Şikak (Simko 1914-1926)

Şiyan C. Oremar 56-68

Wergerandin ê Ber Bi Sazkirin a Wê Ve

Xalid Muhemed 69-71

Kirdar Q Kat le Zimanî Kurdî

Kurdo Elî 72-82

Zman

Feqî Huseyn Sağnîç 83-85

Hevpariya Şêran

Packer C. - Pusey A. 86-89

Agahîyen ji Cîhana Zanînê 90-92

Çalekiyê Enstituya Kurdî ya Stenbolê 93-94

Xwendevanê Delal,

Beriya her tiştî divê ku em lêborîna xwe ji we bixwazin. Me kovara Zendê, di dema wê de amade nekir û negihand ber destêñ we. Em naxwazin merc û derfetan ji vê kemasiyê re sedem nîşan bidin. Tevgera Azadiyê û têkoşina gelê me, gelek derfet derxistine holê û ji bo ku kovareke demsalî, di dema xwe de, bête weşandin tu astengiyên teknîkî û hwd. tune ne. Belê tenê pirs-girêka kesaniyê dikare rê li ber xebatan bigire. Em mecbûr in ku bi ser vê pirsgirêkê de herin.

Gelek caran tê nîqaşkirin ku neteweke ku di nav şerê serxwebûn û azadiyê de be, gelo dikare çiqasî karê zanistiyê, lêgerîn û lêkolînê bike. Dema ku welat rizgar nebe, mêtî azad nebe dîrok, çand û xebatê akademîk dê çawa azad û rizgar bibin.

Bersiva vê pirsê, iro lí welatê me wiha tê dayîn: Di civaka kurdan de, xerakirin û avakirin bi hev re çedibe. Li gelek deverên cihanê, di pêvajoyen dîrokî yên ku civak pê serûbinî bûne de, di nav tariyê de ronahiyê aj daye. Şoreşa fransiyen a 1789'an, şoreşa bolşewîkan a 1917'an di nav şoreşê de û piştî şoreşê, pêşveçûna çand, huner û zanînê dêrxiştiye holê.

Ên ku çand, wêje û zanîn pêş ve birine nûner û endamên şoreşê ne. Anglo kesên xwediyê jiyanâ nûjen in. Yên ku di kesatî û jiyana xwe de, nêrîn û feraseta berê vedihewîne, nikare berhemên nûjen, bi rêk û pêk û li gorî pîvanên zanistiyê bide. Ji ber vê yekê jî, pêwistî bi hewldana kesên ku nûnerên jiyana nû ne, heye. Lê, kesên ku şoreş di nav mêtîjî xwe de pêk anîbin dikarin, xebatê akademîk ên di sewiya cîhana modern de biafirînin.

Mixabin di vê hêlê de kêmâsiya kurdan heye. Bêje hema, çend sal in, mirovên ku di warê akademîk de dixebeitin heman kes in. Ên ku li ser dîroka kurdî xwedî kariyer in çend kes in, ên ku li ser ziman dibêjin em pispor in çend kes in. Di warêndin de jî rewş wiha ye.

Bi tenê di warê wêjekariyê de ci li zindanên Tirkîyê û Kurdistanê be, ci di nav xortên zankoyê de be, mîldariyek li ser wêjeyê heye. Helbet neteweke ku her roj di jiyana wê de bûyerên erjeng diqewimin û bahozên dilîniyê radibin, dê ji wêjeyê re bibe mijar. Helbet dilê me hemûyan tenik e û weke zarokeke giryok e. Em bivên, nevîn pêtîn gundên ku têne sotin, qîrînên welatparêzan, lehengî û janêş servanên azadiyê dê têkevin nav şîrî kurteçirok, şano û romanên me. Lê rastiyeke din jî heye. Pêwîstiya gelê me, bi xebatê akademîk heye. Lewma hevalên ku hunera wan heye, yên di zindanan de, yên ku li zankoyan şagirt in û hwd. dikarin xwe li ser zanîna arkeoloji, ziman, wêje, felsefe, çand, dîrok, pedagoji, etnoloji, arşîvî û li ser metodolojiyê bigîhînin. Dem dema ku her kesek xwe li ser mijarekê, li ser wareki bigîhîne ye. Divê her kesek branşekê ji xwe re hilbijêre. Em hêvidar in ku di demeke nêzik de gelek mirovên ku di hundirê wan de cewher heye, lê derneketiye holê dê xwe kişf bikin, an jî dê bêne kişf kirin. Dema ku hejmara, zanyaran, lêgerîner û lêkolînvanan zêde bû, Enstîtuya Kurdî û kovara Zend dikare xebatê hêja bike.

Ji ber ku zargotin hîmê kevneşopa me ye. Em pir hêja dibînîn. Lewma me du nivîsarên di derbarê zargotinê de weşandîne. Ya Ahmet Aras û Çiya Mazî.

Di van mehîn bihûrî de gelek çalakî ji bo Şerefnameyê hatin li dar xistin. Yek ji van çalakiyan li New Yorkê bû. Di nav amadekarên wê de Mehrdad Izady jî hebû. "Şerefname", ji bo kurdan, berhemeke bêhempa ye. Şerefhanê Bedlîsi, çarsed sal beriya iroango di 14'ê gelawêja 1597'an de ev berhema hêja nivîsiye. Di vê hejmara Zendê de, di derbarê vê berhemê de, nivîsareke Mehrdad Izady heye. Nivîsarên me yên di derbarê dîroka metodolojiya kurdî de didomin. Dîsa di derbarê rûdanên dîroka Başûrê Kurdistanê ya Nêzik de Rojnamevan Zülküf Kışanak nivîseke lêkolînî amade kiriyê. Beşa duyemîn dê di hejmara Zendê a çaremîn de bê weşandin. Nivîsara Cemîl Gûndoğan li ser metodolojiyê ye. Lêkolînvanê ji Kurdistana Rojhilat, Şîyar C. Oremar, serhildana Simkoyê Şîkakî ji me re vekolandiye. Di vê hejmare de, nivîsarek bi zaraveyê soranî û yek jî bi zaraveyê kirdkî (kirmançkî) heye.

Heta hejmarek din, bimînin di xweşiyê de.

400 saliya nivîsandina giřingtîn berhemâ neteweya kurd Şerefnameyê

MEHRDAD IZADY

Ji Îngilîzî: Samî Berbang

Her çiqas Şerefname pêşî wekî dîroknamyea malbateke xanedan hate nasîn jî, qet şik û guman tê de nîn e ku ew giřingtîn xebata li ser neteweya kurd û dîroka neteweya kurd. Nivîsandina vê berhemê ji hêla Mîr Şerefname dîn Bîdlîsî ve di 14'ê gelawêja 1597 an de hatiye kutakirin.

Dema mirov bala xwe dide rûpelên Şerefnameyê, mirov dibîne ku kurd berî çarsed salî jî, bi çanda xwe ya hevpar, bestêñ neteweyî, welatê xwe yê diyarkirî û dîroka xwe ya hevgirtî neteweyek e. Di nav rezên Şerefnameyê de, împaratoriyeñ ereban, farisan, tirkan û digel van jî împaratoriyeñ kurdêñ ku dîroka wan heta çar hezar salî berî niha diçê, cih digirin. İro ji ber ku kurd her diçê nêzî bidestxistina hemû nîrxên xwe û mafêñ xwe yên suriştî dîbin, êrîşen fizikî û akademik ên li ser hebûna

Girîngiya Şerefnameyê: Ev berhem, ji bo neteweya kurd xwediye cîheki taybet e. Lewre ew reseniya vê neteweya ku nêzî dawiya rîpîvana xwe ya ji bo bidestxistina mafê çarenûsiyê da ku bi riya serxwebûnê li raboriya xwe ya tijî serfirazî vegere. Dema mirov bala xwe dide rûpelên Şerefnameyê, mirov dibîne ku kurd berî çarsed salî jî, bi çanda xwe ya hevpar, bestêñ neteweyî, welatê xwe yê diyarkirî û dîroka xwe ya

wan a dîrokî û neteweyî zêde dîbin. Ev êrîş ji xeniqandina kurdan di nav bendavêñ ku bajarêñ dîrokî yên ku di nav rûpelên Şerefnameyê de qala wan tê kirin noqî bin wan dîbin, heta bi daxistina rûmîta wê neteweyê bi riya "berhemê li ser dîrokê" yên kurdnasêñ ewrûpî yên ji nava xwe têr. Şerefname bersiveke xurt dide vê aşita çewt-agahîyan a gestî. Ev berhem bi

xtêñ stûr dîroka serfiraziya dirêj a neteweyekê mezin nîgar dike. Ev pirtûk, baweriya mirov manîdar dike ku kurd berî

400 sa
lî ,
we-

kî

her ne-

teweyeke

din, neteweyekê hevgirtî, serbix-

we û cuda bûye. Bêgu-

man ev belgeya sereke ye ji bo selmandina reseniya neteweya kurd û gencîneyeke giranbuha ye di meşa neteweyî ya ji bo bidestxistina azađî, wekhevî û serfiraziya



dîrokî ya kurdan.

Nivîskarê berhemê: Şerefedîn Bidlîsî ji binemala xanedanê Rojakî ya kurd ku destpêka wê heta sedsala 9'an diçe ye. Wê malbatê ji paytexta xwe Bidlîsê hin caran keyseriya dewleteke serbixwe, hin caran jî malmeziniya mîrnîşmeke girêdayî dewletê din kiriye. Lewre jî Şerefedîn tu car nasnavê hevpar ê hoza xwe "xan" bi kar neaniye, di cihê wê de nasnavê xanedaniyê "mîr" tercîh kiriye. Bi piranî wekî "Mîr Şeref" hatiye nasîn. Navê pirtûkê "Şeref-name" jî xwediyê du wateyan e: Pirtûka Şeref û pirtûka şeref. Xuya ye ku nivîskar bi zanaflî ev navê ku gelekî li berhemê tê li berhemâ xwe

kiriye. Lewre ew di serî de pirtûka xanedanê kurdan, malmezinan e.

Bajarê nivîskar Bidlîs li bâkurê rojavayê Kurdistanê, bi 20 km'yi dûrî Gola Wanê ye û li başûrê rojavayê wê dikeve. Şerefeddîn Bidlîsî di sala 1542'yan de li bajarokê Karahrûd (navê berê Karjrûd) hatiye cihanê. Ev bajarok li rojavayê Îranê nêzî Araka i-ro ye. Malbata wî, bavê wî Mîr Şemseddîn bi destê Sâfeviyên faris hatibûn nefikirin.

Ev demekê jî ji hêla osmaniyan ve ji cihê xwe hatibûn rakirin, lê di sala 1589 an de osmaniyan ev vexwendin

cihê wan ê berê da ku mîrnîşina Rojakî ava bikin.

Bidlîsî dide zanîn ku rehêne mîrnîşîna wî xwe berdidin ser du xanedanê kurdan ên serdemâ navîn: Mervaniyên Farqîna Amedê û Badîdîn Xelatê (Ahlat). Bi vê yekê jî re ew mîjûya avabûna mîrnîşîna xwe digihîjine sala 836'an. Li aliyê din çavkanîyên îslamî yêna mîna Baladhûrî, didin zanîn ku dema hêzîn îslamî hatin Bidlîsê, dîtin ku ji berê ve, li wir xanedanekî xwecihî heye. Vi xanedanî bi împaratoriya İslâmî re li ser navê xwe û

Bidlîsî dide zanîn ku rehêne mîrnîşîna wî xwe berdidin ser du xanedanê kurdan ên serdemâ navîn: Mervaniyên Farqîna Amedê û Badîdîn Xelatê (Ahlat). Bi vê yekê jî re ew mîjûya avabûna mîrnîşîna xwe digihîjine sala 836'an.

bajar-dewleta Xelatê peymanek girêda. Rojakî li Bidlîsî li ser kar man, heta sala 1847'an ku dewleta osmanî ew herêm girt. Ew mîrnîşîna tekane û xweser e ku zêdetirî hezar salî li ser piyan maye.

Naverok: Şerefname ji pêşekêk û pênc besen ku bi hejmara rûpelên xwe ji hev cuda ne, pêk hatiye. Pêşek li ser binyad, mîtolojî, devok û zaravayê zimên û bawerîyen olî yêna kurdan xebatêke şahane ye. Di beşa yeke-mîn de çêlî dewletê kurd ên ku di dîrokê de bi temamî serbixwe bûne, tê kirin. Di pirtûka duyemîn li ser mîrnî-

şîn û dewletê ku heta dawiyê nikaribûne serbixwe bûna xwe bidomînin, tê rawestîn. Wan dewletan, tevî ku nikaribûne heta dawiyê li ser piyê xwe rawestin jî, li ser navê wan dirav hatine çapkirin û roja ïnê li mizgefstan li ser navê keyserên wan xutbe hatine xwendin. Beşa sêyemîn li ser xanedanê bîçük û mîrnîşînen hozî (eşîri) ye. Di beşa çaran de nivîskar li ser dîroka mîrnîşîna xwe ya bi navê Rojakî û serbajarê wê agahiyê kûr û dûr dide. Beşa pêncan beşa herî dirêj e. Di vê beşê de nivîskar dîroka Rojhilata Navîn û Asyaya Navîn hildide dest. Agahiyê li ser vê mijarê bi awayekî kronolojîk hatin dayîn û bi dagirkirî

na moxolan a Kurdistanê ya di sedsala 13'an de dest pêk dike.

Berevajî toreya wêjeyî û dîroknivîsîna wê demê, mirov bi hêsanî li xwendina Şerefnamê diçe û nivîskar bêyî cil û civ dikeve nava mijara ku li ser tê rawestîn. Agahiyê li ser kurdan jî bo her xanedanê bi awayekî rasterê û kronolojîk hatine pêşkêşkirin. Her wiha di beşa pêncan de cihê xanedanê kurd di dîroka Rojhilata Navîn de jî hatiye destnîşankirin.

Bibliyoloji: Şerefname bi farsiya klasik hatiye nivîsin. Ew ziman wê demê ji Hindistanê heta Stenbolê li

herêmeke berfireh wekî zimanê wêjeyî, civakî, qesr û qonaxan tê bikaranîn. Nivîskar ji pêkanîna karekî baş serî li gelek çavkaniyên bi zimanên cuda, dîroka devkî û kesen ku dijin, daye. Bi baldarî li ser çavkaniyan rawestiyaye da ku agahiyên misoger bi dest bixe. Dema ew nagihêje vê encamê xwendevanên xwe li ser vê yekê agahdar dike û agahiyên kitekit li ser bûyer û xanedanên ji devê kesen bi vî rengî nade. Ev yek vê xebatê ji xebatên din yê wê demê cuda dike û dikê berhemeke sereke ya li ser dîroka kurdan.

Niha ji Petersburgê bigire heta Stenbol û Tehranê, gelek pirtûkxane xwe wekî xwediyyê nûsxaya kevtirîn ê vê berhemê didin pêş. Li wan deran gişan parçeyekî berhema Bidlîsî ku hê orijinalê wê nehatiye dîtin heye. Bi iştîmaleke mezin dagirkirê osmanî dema di sala 1656'an de girtin ser qonaxa biraziyê Şerefxanê Bîdlîsî, Mîr Abdalxan digel hemû pirtûkêni di pirtûkxaneyê de orijinala Şerefnameyê jî bi xwe re birin Stenbolê. Dîsa dibe ku niha ew, li hêviya hinikan e ku wê di nava arşîvê osmanî de keşîf bike:

Ji ber ku Şerefname di nav xwende û xanedanên kurd de xwediyyê buhayekî giran bû, ji ber vê pirtûkê gelek kopî hatine girtin. Ji bo xanedanên kurd, bi kêmî ji bo yekî ji wan (Galabaxiyan) rûmet bûye ku navê wan di nava rûpelên vê pirtûkê de

cih bigire. Lewre jî vê xandanê dîroka xwe xistiye nava rûpelên Şerefnameyê. Tevîku ew dikeve sala 1603'yan ango piştî mirina Bidlîsî jî.

Şerefname, yekemîn car di salên 1858-59'an de ji hêla lêkolînerê kurd, Mahmûd Bayazîdî ve li kurdi hatiye wergerandin. Zimanê nivîskar, kurmanciya rojhilate Bakur e, bi iştîmaleke mezin jî kurmanciya Bidlîsê ye. Bayazîdî navê "Dîroka Kevn a Kurdan" li wergera xwe kiriye. Lê ev werger nehatiye

ya Şerefnameyê jî amade kir û ew berhem piştî mirina wî di salên 1958-62'yan de hate çapkiran. Ev werger paşê ji wergera tirkî (1971) ya nivîskarê kurd Mehmet Emîn Bozarslan re bû bingeh. Folklorist û zimanzanê kurd, Abdul-Rahman Şerefkendî wergereke hêja ya kurdiya soranî kir, (niha çapa duymîn a vê wergerê hatiye kîrin, Târhan, 1981).

Wergera frensi ya Şerefnameyê, wekî du cild, digel car cild agahî û şirove, ji hêla

Şerefname, yekemîn car di salên 1858-59'an de ji hêla lêkolînerê kurd, Mahmûd Bayazîdî ve li kurdi hatiye wergerandin. Zimanê nivîskar, kurmanciya rojhilate Bakur e, bi iştîmaleke mezin jî kurmanciya Bidlîsê ye. Bayazîdî navê "Dîroka Kevn a Kurdan" li wergera xwe kiriye. Lê ev werger nehatiye çapkiran, tenê du cildên wê wekî mîkro-film di salan 1986'an de li Moskovayê derketibûn.

çapkiran, tenê du cildên wê wekî mîkro-film di salan 1986'an de li Moskovayê derketibûn.

Çapa yekemîn a Şerefnameya bi farisi ji hêla-mirohezê kurdiya Bahaî, Faracûllah Zekî al-Kurdî ve di sala 1886'an de li Qahîreyê hatiye kirin. Ji bo çapa duymîn pêsek û ravekirinê bikêr ji hêla lêkolînerê kurde zaza Muhammed Alî Awnî ve hatiye kirin. Awnî bi xwe ji malbateke sîwêregî bû û ji malbata wî gelek nivîskar û xwende derketine bûn.

Awnî paşê wergereke erebî

Charmoy ve di bin navê "Chéref-nameh ou Fases de la nation kourde", di salên 1868-75'an de li Petersburgê çêbû. Hinek parçeyen pirtûkê li almanî jî hate wergerandin, lê ew xebat neçûn serî. Wergera îngilizî ya pirtûkê ji aliyê min ve tê kirin û li ber kutabûnê ye. Şiroveyen berfireh, nexşe û şaxnameyên (soyağacı) malbaşî wî bi qasî şes cildan bigire. Ji bo bibîrxistina salvegera dîrokî, miroyen li seranserî cîhanê dê karibin di internetê de xwe bigihînin vê wergera bi îngilizi.

Bingehêñ Hesêb bi Kurdî

I. NASSO

Di vê mijarê de ez dixwazim, bi awa yekî taybetî, "Bingehêñ Matêmatîk bi kurdî", tîpêñ latînî, cara pêşin bi nivîskî diyar bikim. Ev mijar beşek ji pir-tûka min, ya matêmatîk e, ya ku di vê dem-sala payîzê de, dê were çapkirin û weşan-din. Wek tê zanîn, bingehêñ hesêb li teva-ya cîhanê çar in. Ev bingeh bi zimanê kurdî û bi awayekî zanistî, heya niha, hê neha-tine çesipandin. Di dibistana kurdî de, li Başûrê Kurdistanê, bingehêñ hesêb bi vî a-wayî jîrin hatine danîn:

- (+) : Kokirdin / kokirdinewe (1)
- (-) : Lêderkirdin (2)
- (x) : Lêdan / lêkdan (3)
- (:) : Dabeşkirdin (4)

Bi dîtina min ev bingehêñ jorîn ne ewqas zanistî ne.

Min ev her çar "Bingehêñ Hesêb", wek tîgînêñ latînî, li gor zimanê kurdî û bi tay-betî zaraya bakur û rojava, bî vî awayî ame-de kirine.

Tevbûn:	(+)	"tevîn"
Derbûn:	(-)	"derîn"
Carbûn:	(x)	"carîn"
Parbûn;	(:)	"parîn"

Heke mirov li van "Bingehêñ Hesêb" te-

maşê bike, mirov dibîne, ku ew bi têgînêñ kurdî yên yekser û kurt in. Ew di xwe de ziman û têgînêñ matêmatîk dinimînin. Ew têgîn wek gotin / pevv di zimanê kurdî de hene û ji kîtên "tev, der, car, par" û lêkera "bûn" hatine avakirin:

$$\begin{aligned} \text{tev} + \text{bûn} &= \text{Tebbûn} \\ \text{der} + \text{bûn} &= \text{Derbûn} \\ \text{car} + \text{bûn} &= \text{Carbûn} \\ \text{par} + \text{bûn} &= \text{Parbûn} \end{aligned}$$

Xwendina Yeksaneyêñ Matêmatîk

Di hemû zimanê navnetewî de "Yeksaneyêñ Matêmatîk" wek hevok têñ xwendin. Li Başûrê Kurdistanê ji "Yeksaneyêñ Matêmatîk" re "Hawkêse" dibêjin.(5)

Di dibistana kurdî de, li Başûrê Kurdistanê, yeksaneyêñ matêmatîk wisa têñ xwendin:

$$\begin{array}{rcl} 5 & + & 4 = 9 \\ \text{penc} & \text{ko} & \text{çîwar wisawî/misawî/yeksan no} \end{array}$$

$$\begin{array}{rcl} 5 & - & 4 = 1 \\ \text{penc} & \text{naqîs} & \text{çîwar yeksan yek} \end{array}$$

$$\begin{array}{rcl} 5 & \times & 3 = 15 \\ \text{penc} & \text{zerb/kere/keret sê} & \text{yeksan panzde} \end{array}$$

$$\begin{array}{rcl} 12 & : & 3 = 4 \\ \text{diwanzde} & \text{teqsîm/dabes sê} & \text{yeksan çîwar} \end{array}$$

Şêweyê xwendina "Yeksaneyêñ Matêmatîk", yên ku ez dixwazim pêşkêş bikim, ev in:

$$\text{Tebbûn: } 7 + 5 = 12$$

heft tevin pênc yeksan, dazde
heft û pênc dike, dazde

$$\text{Derbûn: } 10 - 6 = 4$$

deh derîn şes yeksan çar
deh kêm şes dike çar

Carbûn: 7 x 3 = 21

heft carîn sisê yeksan bîst û yek
heft caran sisê dike bist û yek

Parbûn: 8 : 4 = 2

heşt parîn çar yeksan didu
heşt dabeş çar yeksan didu
heşt liser çaran dike didu

Şêweyekî din ji “Yeksaneyên Matêmâtîk”

Yeksaneyên matêmâtîk bi şêweyekî din jî, wek daxwaz yan armanc tê xwestin. Li Başûrê Kurdistanê ev daxwaz wisa ye:

6 + 3

şes zaîd sê ke
şes le gel sê ko kewe

6 - 3

şes naqîs sê ke
şes lê sêyan derke

6 x 3

şes zerbî sê ke
şes le sê de

6 : 3

şes teqsîmî sê ke
şes dabeşî sê ke

Şêweyê ku min amade kiriye, ev e:

Tevbûn: 7 + 5

heftan bi pêncan re bitevîne
heftan û pêncan têxe ser hev
heftan têxe ser pêncan

Derbûn: 7 - 5

pêncan ji heftan derîne

pêncan ji heftan kêm bike
pêncan ji heftan bikuje

Carbûn: 6 x 2

şeşan bi diduyan re bicarîne
şeşan û diduyan li hev bixe
şeşan li diduyan bixe

Parbûn: 8 : 4

heştan li çaran biparîne
heştan li çaran par bi ke
heştan li çaran dabeşîne

Beşên Yeksaneyên Matêmâtîk

Di hemû zimanên navnetewî de “Beşên Yeksaneyên Matêmâtîk” bi navine tâybêtî hatine danîn. Li gor zimanê kurdî û têgînên matêmâtîk min ew nav bi vî awayî çesipandine:

Tevbûn: 12 + 3 = 15

tevmend tevîn tevmend yeksan tevîng

Derbûn: 12 - 3 = 9

dermend derîn derîne yeksan cudahî

Carbûn: 12 x 3 = 36

carmend carîn carmand yeksan berhem

Parbûn: 12 : 3 = 4

parmend parîn parker yeksan parîng

Cavkanî:

(1) Ferhengî Mehabad, Kiyo Mukriyanî, Hewlêr, çapxaneyî Kurdistan

(2) Ferhengî Estêre Geşe, Fazil Nîzameddin, Bexda 1989, çapî dû, r.475

(3) Ferhengî Mehabad, r.561/563

(4) Ferhengî Estêre Geşe, r.217

(5) Ferhengî Mehabad, r.665

Li Mezopotamyayê Heteredoksi

S. BULUT

Ji tirkî: Memed Serhedî

Wekî Enadola ku bi nave Asya biçûk tê nasîn li Mezopotamyaya ku ji Feratê hetanî Wanê ye jî, di hemî qonaxa navîn de pergaleke feodalî li ser kar e. Anglo di navbera mîr û beg û “reaya” gundi, koçber û xizanê bajaran de, herdem li dor destxistina zêde pevçûneke civakî û çînî hebûna xwe parastiye.

Qonaxa feodalî “qonaxeke ronahîbûn”ê nîne. Ji ber vê yekê wekî rewşenbîrên çîna bindest “derwîş, baba, şeyh-ûl cebelêن misilman û waîz û Heretikîn Fileh jî, ji nav ola ku bîrdoziya fermî û çanda serdeste wekî “ji rîderketin-nekê” hatine pê. Bi gelempêri bîrdozî û çanda olî ya ku xwediyê wê ne, ber bi aliyê çînîn bindest ve vîkolane û bi riya mezhebîn “ji rîderketî” têkoşîna sosyalîzma ûtopîk a wekhevî, hevparî û azadixwaz da-ne.

Di gel vê, gelên kurd, turkmen, ermen, ereb û hwd. bi awayê rîbirî, çeteyî û nijdevanî ci serbixweyî û ci jî bi teşeyê bi ber pêlîn mezhebîn “Heteredoksi” ketî, protestoyêni ci-vakî lidarxistine.

Em li ser têkoşînen çînî yên herî hovane yên ku li ser axa Mezopotamyayê hatine dayîn nasekinin. Di sedsalêن VII-XI an de, “Li welatê di navbera

Ferat û Dîjle yê de” li hemberî serdestiya Bîzans û dêra dagirker û kedxwir rum, ermenêñ xizan ên gundi û bajarî li dor “heresiyeke civiyan û li berx-

navê xwe ji “Thondrok” distîne.

Di bin pêlîn êrîşen Bîzansyan de, ev “Fileh” ên şoreşger pelçiqîn. Lê di sedsala XII de, ango di nav yek an jî du sedsalan de, şoreşgerên kurd û turkmen ên gundi û koçber, Tevgera Babaiyan a ku xwediye ferasetekê sosyaliste ya ji herêma Adiyaman, Erzingan, Meletî, Sêwazê dest pê dike û li Amasya û Toqatê belav di-be, tê wê wateyê ku “Paulikyan” neketine bin hîva ewr, an jî ji holê ranebûne.

Dema ku em nivîseke çewt a lêkolînerî ku li ser “Heteredoksi” hatiye nivîsin rast bikin û kîmasiya wê nivîsê ji holê rakin, em dikarin bibêjin ku ya dîroka Mezopotamya ya-Anadola “Paulikiyan, Babaiyan” heye. Ger ku bê nivîsin jî, divê şoreşgerên ew çîna ku dibêje “Kevneşopî û pêşeroj ya meye” û wateya pratîk-ramyarî li sosyalîzmê barkiriye di serî de binivîse. (2)

Arşak Poladyan ji ceribandiye ku dîroka tevgerên kedkar a gelê kurd binivîse. “Di sedsalêن VII-IX an de, kurd”. Lêkolîner diyar dike ku girseyên hêjar û gundi yên kurd li hemberî mîtingeriyê, pîkutiyê, newekheviyê ji bo “pergaleke hempar, wekhev, azad di gel tevgerên, Xaricî, Karmatî, Batînî, Hurremî, Mazdeki Babekî bwd. bi kedkar û bindesten gelên din re, di têkoşîna çînî ya ku li hemberî Feodalî Mîtingeriyê hatiye dayîn de, bi awayekî çalak cih girtiye.

wedan. “Komûnar”ên pêşîn ên Mezopotamyaya feodalî li derdorêñ Sêwaz-Dîvrîgî, Erzêrom, Erzingan, Adiyamenê bi navê “pavlikyan” (1) û derdorêñ Wanê û bakurê wê, ci-yayêñ Tendûrekê, bi navê “Thondrak” tên zanîn. Herwe-kî ku tê zanîn ciyayê Tendûrek

Mazdekkî Babekî hwd. bi kedkar û bindesten gelên din re, di têkoşîna çînî ya ku li hemberî Feodalî-Metingeriye hatiye dayîn de, bi awayekî çalak cih girtiye. Lê lekolîner-nivîskar ev mijar li erdnigarên wekî Iran (Cîbal-Daylam) Azerbaycan, Xorasan, Surî, Iraq, Basra hwd. lêkoliyaye. "Mezopotamya" kedkarên kurd derveyî babetê hiştiye. Tenê li çend cihan qala El-cezîrê kiriye, zêde li ser nesekiniye û derbaz bûye.

Paulikiyanê ku li gorî gotinan navê xwe ji paulê samosatayî girtine, doktrîna xwe ji çavkaniya Zerduşfîzma ku di hundirê xwe de, têkoşîna qencî, xerabiyê, tarî û ronahiyê dihebine ya ku du-alîtiyê dipareze, di mercen "Manîzmî" de, avakirine. Anglo pirtûka pîroz Încîla Filehiyê, ya di destpêkê de, ya tekûz awayekî ku li hemberî hiyeriya dêrê ya feodalî, ya olî derketiye, bi awayekî wekhevîxwaz şîrove kiriye.

Êrîşî dêra ku metîngeri rewadikir, dîkin. Her doktrîna olî di destpêkê de, dema mêtîngeri parastiye ji bo piştgiriya civakî mêzîna ji aliye xizanan ve jî, hildaye naveroka xwe. Divê em, li gorî hin lêkolinênu ku dibêjin Filehî di despêkê de, ola "bindest, xizan û gelên ku Romayê ew bindest kirine" ye fêm bikin.

Divê em li vir bibêjin ku paulikiyên û Thondrakên ku ji bo rêberiya çîhanî ya gundiyên Fileh û çînên bindest tevdigerin, ev lîteratur ji bo utopyaya rizgariya civakî wekî amûr bikaranîne.

Baba İshaqê kurd yê Samsata Hisnî-Mansurê û li gorî hin çavkaniyan jî Kefersudî, Şamî dema li dijî mêtîngeriya Selçukiyan derdiket û hemî kes û saziyên fermî-sivîl ên feodal diperçiqand û di sala 1239 an de dema serhildana gel a mezin dida destpêkirin, Wekî kurd û turkmenan gelên ermen, yewnan û filehîn gundi jî besdar dibûn. Ev jî dipeyitîne ku dive em vêya wekî dil-pakî û tékûziya "Pauliki-

bûnê ji vê tevgerê re Pulikyên digotin.)

Her wiha xuya dike ku tevger wekî baweriya ku di nav gel de, kûr û fireh e nikare di carekê de, tevgera "Alewi" were danasîn. ji ber ku gelekî tevlîhev e. Di van demêna dawin de, hin lêkoliner guftugo dîkin, ku divê bêjenasiya (Etîmoloji) Alewiyan bi "Hz Aliyê Sunnî" ve neyê giredan, bi girêdayî "Agirperestî" yê, "Alaw-Alew" wek ola zerduştîzm a dema kevnare ya Mezopotamyayê ve bê girêdan û dibêjin ku bêjeya Alewîtiyê di sedsala 18 an de, bi cih bûye.

Em têdigihêjin ku Baba İshaq, Sêwaza ku li kêleka Tefrikî (Dîvrîğî) ya ku navenda Pavlîkyane ye bi cih bûye û wekî Amasya û Toqatê li Sêwasê jî rîexistina xwe sazkiriye, pir navdar bûye û ji xwe re bîst hezar alîgir dîtiye. "Sêwaza bajarê kurdan" a ku hejmara ermenan tê de zêde ye aliyekî, Amasya-Toqata ku xeta Alewiyan e ya tê de, bi navê "şadiye" dewletek hatiye avakirin, rayedarê wê kurd bûn. Di gel vê, divê di serhildana "Baba İlyas-Baba İshaq" de rola turkmenen xizan; bi taybetî jî divê bandora karamanen Sêwazê, Tahtaciyan Meraş-Elbistanê û Çepniyân Erzingan-Trabzonê û milen tirk u yên wekî wan neyê jibirkirin.

Piştî vê, bajarê Sêwazê jî, bi destê serhîderan û ji aliye Babaiyên gundi-koçber ve hate talankirin. Divê em vê jî bibêjin ku tiştên hatine bi destxistin, di nav kesen ku besdarî serhildanê bûbûn de, bi wek-



Baba İshaq

yen" an şîrove bikin.

Lêkolinênu ku vê şoreşa gundiyan dinasînin, di vê babetê de, hevpar in ku Baba İlyasê Horasanî yê ku li Amasyayê bi cih bûye Teorîsyenê Baba İshaqe ku li Kefersud/Samsatê bi cih bûye ye jî. Heman wext, ew rîberê şoresger yê vê tevgerê ye: Babaî, Batînî, Vefâî, Mazdekkî, Haricî, Şîî, Bafîzî, Heterodoksî, Alevî, Babekî. (Ez iddia dikim ku gundiyanen Fileh ên besdarî vê serhildanê

hevî hate parve kirin. Tevlîbûn, an jî nebûna serhildana Baba İshaq a H. Bektaşî Velî yê ku li gor hin dîtinan xelîfeyê Baba İlyas e jî, ji aliye lêkolîvanan tê guftugo kirin. Lê birayê wî Menteş tevlî vê serhildanê bûye û li Sêwazê hatiye kuştin. Li gor hin şiroveyan H. Bektaşî Velî doktrîna Babaiyên şoresser kedi kiriye û kiriye bingeha tarîqata ku wê li ser navê wî bê sazkirin. Di "velayetname" ya wî de, beriya ku têkeve Enedolê, li "Kurdistan"ê gelekî maye û bûkeke kurd ji xwe re kiriye

*Li gor bin şiroveyan H.Bektaşî Velî doktrîna
Babaiyên şoresser kedi kiriye û kiriye bingeha
tarîqata ku wê li ser navê wî bê sazkirin. Di
"velayetname" ya wî de, beriya ku têkeve
Enedolê, li "Kurdistan"ê gelekî maye û bûkeke
kurd ji xwe re kiriye zirkeç. Li ser zaroka bûkê
xwendiyeye. Di nav cihê ku lê geriyaye de, Sêwaz,
Heleb, Elbistan jî heye.*

zirkeç. Li ser zaroka bûkê xwendiyeye. Di nav cihê ku lê geriyaye de, Sêwaz, Heleb, Elbistan jî heye. Ji vîr derbasî Qeyseriyê dibe. Yanê axa Mezrabetan naskiriye. Baş e ji 'bo ku doktrîna xwe saz bike, H.Bektaş çîma Mezrabetanâ ku ji aliye cîvakî-şoresseri ve xêr û bereket e hilnejibartiye û Anadolu /Kirşehir /Sulucakarahöyük hilbijartîye û oçaxa xwe li wir avakiriye? Bivê nevê dîtiye, hâskiriye ku Mezrabetan deryaya pêlén jî her ol; ji her zimanî, ji her geltû ji her zayendi, ji kedkarê "Jrederkeretiye" ye.

Saxê Xariciyan ku bi navê sufraî têz zanîn li herêmên Dîyarbekr Mêrdîn Herran ên ku

bi navê parzemîna El Cezîr jî têz bi nav kirin, di nav kurdêñ gundiû koçber de "pêxwasên îslamê" "jakobênen wekhevixwaz" "vîcdana xizanêñ îslamê" dihatin bi nav kirin û van li vê herêmê lotik diavet.

Wisa ku "derwêş"ên li herêma Amedê yên ku sultanê Selçukiyan Keyxusrevê duymîn bi wan re şer dikir, divê tekiliya wan ya bi Xariciyên Sufraî re were lêkolandin.

Ji xeynî vê, piştî ku hem ev tevgera Sufriâ, hem jî serhildanê kedkaran ên gelên ku li Iran û Azerbeycanê pelçiqân a-

ku bi hêjarêñ turkmen û ereban re li hemberî hêzêñ mêtînger ên Moxolan û hevkareñ wan bi Selçükêñ feodal û hêzêñ fileh re şerkirine, di nav wan de ezidiyêñ kurd ên Şêx Adî jî hebûne.

Tê gotin ku êzidî civateke mazdaki (Komînist-SB.) ye ku di kûrahiya dîroka zerduşt de, cih girtiye. Dîsa tê diyarkirin ku sufîtiya êzidiyan qarakte-reki serhildêr nahebine. Lê kurdêñ hêjar-belengaz û gelêñ din ên ku di wê qonaxê de, li serê çiyan azad dijiyan û beriya wê di axa mîr û began de dixebeitin û bi çalak besdarî tevgera Mazdekkî-Babekî dibûn. Li hemberî hişkiya îslamê ya şerîetxwaz "ortadoks" sufîtiya êzidi "heterodoks" dipejirand.

Ji bili vê, di "Bilad-i Ekradê" de, "baniya" "Baba İlyas-Baba İshaq" a "Çanda Ebû'l Vefa" bi bandor bû. Li gor hin kesan, ji babaîyan re vefai jî tê gotin. Lêkolîner iddiâ dîkin ku "ev doktrîna sufîyen kurd nîn buya" li Anadol û Mezrabetan çanda Alewîti nedima.

Bi kurtayî li gorî Nejat Bîrdoğan, Mezrabetanê bir û baweriya axa kedkaran dîtibû, qewin bû. Ji ber wê Hünkar Bektaş Velî derbasî kapadokyayê bû. Bi bingeh girtina hezkirina mirovan bingeha doktrîna "aşfixwaz"iyê, reformyariyê li Anadolê avêt.

Dîsa dema em tevgera Şêx Bedreddîn vedikolin, em digihîjin vê encamê û dibînin ku li ser hemû ol û neteweyan di sedsala 15.an de li hemberî Osmaniyeñ-feodal "di biñ banê civata komînizmeke mi-

lîgirêñ mazdekkî-Babekî yên qomînîst li herêmê Musul, Colemergê, di nav Adavîvaniya (êzidî vaniya) kurd a oleke nû hiristiyan-gnostik de, guherîn, kelijîn. Him ji aliye tevlî-hevbûna erdnîgarî, him jî çandî ve em dikarin ermeneñ Thondrak ên li derdora Wanê jî, di nav vê kelijandinê de, bifîkirin. Dîsa tê gotin ku "Mûellîfe" memlûkî "El-ömer", di bîrhemâ xwe ya bi navê "Mesalikû-Ebsar" de, gotiye ku ger "Karaman, turkmen û kurd tunebûna Mîrê Moxolan Gaganê ku Mezrabetan û Enedol pelçiqandiye û ketiye vê herême u wê hetanî cîhe ku roj lê diçe ava biçiya. Dîsa em ji jêdekerkekê hîn dibin, kurdêñ

rovî” de, alternatifek pêk hatiye.

Jêderk zelal dikan ku dema Şêx Bedreddîn doktrîna xwe afirandiye li herêmên Heleb, Şam, Bitlis (Xelat), Wan û Tebrizê geriyaye, lêgerîn kiriye. Ev herêmên ku kurd bi giranî lê niştecih bûn berî wê doktrîna Manîzmê, Zerduştî belavbûyî bû û herêma ku destpêka derketina Paulikyan bû “Mezopotamya, Ermenistan û bakurê Suriyê bû. Zilamekî wekî Şêx Bedreddînê ramyar û çalak, né tenê ji bo ku ramana xwe bi pêş ve bibe ji bo ku rêexistinkirinê li vê de verê geriyaye, nayê fikirin ku “Paulikyên, Thandrekyen, Mazdekm, Babekînin Hurufî, Babaî nasnekiribe û li ser wan lêgerîn nekiribe. Bi rastî

jî di lêkolînekê de ev hemû doktrînen ku mora axa Mezrabiton ya kedkar dikişinin divê di nav jêderkên doktrînen Şêx Bedreddîn de bêñ nîşandayîn.

Wê demê mirov dikare bi hesanî bersiva pirsa çîma Şêx Bedreddîn ji bo ku doktrîna xwe belav bike, rêexistin bike û di çalakiyan de bide jiyandin Aydin, Manîsa-İzmîr, Gîrît, Sakiz, Rûmelî bijartiye bide. Heke axa Mezrabiton ji herik-bariyên Pavlîkyanî Babaî-Harîcî tijî bûbe, wê demê ji bo Şêx Bedreddîn xeynî Ege/Anadolu ku wextekê welatê filehîn “jirêderketî” kathorasan û Welatê Bogomiliyan li Balkanan belavkirin û jiyandina doktrîna xwe rêyeke din a erdnîgarî tunebû.

Bi kurtayî: Li “herêmê” an-

go li Anadolê, Mezrabiton, Balkan, Qafqasyayê, Iranê, hetanî Basrayê tevgera Babaî Bedreddîn, Mazdekm, Karmatî, Zencî, Paulikyaî, Bogomiliyên ku bi navê “serf” ên “Reaya” yên rojhilat dittekoşîyan mebesta wan a yekemîn hilweşandina Pergela, feodalî, derebeyî û li şûna wê, li vê cîhanê avakirina bihuşteke wekhev bidad bû.

Sosyalîzmê îro li hemû gerdûnê, rastiya xwe daye pejirandin; lê çepgirên, şoresger, sosyalistên ku bi navê wê bi-zav dikan heger wekî derwêşen babayên, heretikên 700 salî 1000 salî beriya dema mejiyane rastiya rizgarî ûtopuya sosyalîzmê nedabin pejirandin mirovan dide fikirandin.

*Disa dema em
tevgera Şêx
Bedreddîn
vedikolin, em
digibîjin vê
encamê û
dibînin ku li ser
bemû ol û
neteweyan di
sedsala 15.an
de li bemberî
Osmaniyê-
feodal “di bin
banê civata
kominizmeke
mirovî” de,
alternatifek pêk
hatiye.*



KEMALİZM Ú PIRSGIRÊKA KURDÎ

İSMAIL GÖLDAŞ

Wergê: Hasan Kaya

Di van salên dawî de, li Tirkiyê nîqaşa di derbarê pirsûrêka kurdan û siyaseta kemalîzmê ya di derbarê kurdan de, her ku diçe zedetîr dibe. Gelek mirov dibêjin û dinivîsin ku M. Kemal xwestiye ku otonomîyiye bide kurdan û di Meclîsê de biryareke bi vi rengî girtiye. Hinek jî dibêjin heke M. Kemal bijiyya dê gelemşeya kurd çareser bibûya. Ev çareserî dê li gorî berjewendîya kurdan bûya. Ev nîqaş di medyayê de pir cih digire. Gelek ronakbîrêna kurd tevlî hestê xwe yê erêni jî besdarî vê nîqaşê dibin. Gelek siyasetmedar, zanyar, lêkolinerê zankoyê, nivîskarêna rojnameyan dibêjin ku M. Kemal di navbera salên 1919-1923 yan de, gelek bêje û gotinêni siyasi di derbarê kurdan de bikaraniye, peyva kurd bikaraniye û li gorî prensîba "Mafi bîryarî çarenûsî netewan" nêzîk bûye. Bi, kurtayî dikare bête gotin ku, nivîskarêna tirk ên pêşketî û gelek ronakbîrêna tirk, di wê

baweriyê de ne ku Kemal, hebûna kurdan a siyasi, qewmî, çandî pejirandiye. Birek ji ronakbîrêna tirk jî, vê baweriyê bi aweyekî din tînine zimên; lê tiştê ku tê gotin yek e û digihêje heman nuqtê: "Di şerê rizgariyê de, kurd û tirk li hemberî dijminan bi hevre, mil û pişt dan hev. Komcivînên Erzerom û Sêwazê bi hev re li dar xistin. TBMM bûye meclîsa her du gelan. Lê mixabin soza ku hatibû dayin bi cih nehat. Kurd hatin ji bîr kirin."

Di gelek panelan de tê gotin ku, di hevdudîtina Amasyayê de mafê kurdan ê siyasi û çandî hatibû pejirandin û di nivîsara protokolê de cih girtibû. Ev hevokên jor bêhtirin, di mahkemeyan de, di nivîsarêna pirsûriyê de û parêznameyan de cih digire. Kesêna ku bi "cudaxwaziya welêt" li gorî qanûnên terorê û yên din têne tawanbarkirin, gotinê M. Kemal ên ku di derbarê kurdan de gotine ji xwe re dikin delîl û zirx, da ku bêne berdan. Bîr û bawerîya çepê tîrk jî hêj ewe ku M. Kemal xwestiye heqê kurdan bide, lê hukumetêna ku li ser kar bûn si-

yasetên çewti meşandin lewma kurd nebûn xwedan heq. Ji Kurdperwerên ku bi "Kemalîzma" kurd têne îtham kirin re, ji ber ku çendan sal di bin bandora zora tirk manê xwaparastin bûye weke refleksê.

Di pêvajoyê de kemalîzm û Atatürkperestî ji ideolojiya fermî cûda bûne. Kemalîzm weke pêşverûtî, hemdemîtî, dijîtiya emperyalîzmê hatiye dîtin. Li gelek deveran kurdêna ku digotin em xwende ne, ez kurd im, wêneyê Atatürk bi berstika xwe ve dizeliqandin. Sedemêna vê yekê ev xalêna jorîn in. Mirov nikare vê rewşê bi tenê bi dijberê vê ve girê de. Perwerdehiya ku li ser mîjîyan bandor kiriye, jiyana têkilhev, siyaseta tirk a dewletê bingeh ji kesatiyek weha re amede kiriye. Esnafêna ku di jiyana siyaseta kurdan de cih digrin, ne bi tenê ji bo peran ango berjewendiyêna xwe wêneyê Atatürk bi dîwarê karxaneya xwe ve dîdaleqînin. Tenê ne ji bo pêdiviya fermî ye jî, li gorî bawerîya min, bandora gotinê politîk ên ku M. Kemal di derbarê kurdan de bi kar anîne heye. Mamos-teyekî gotibû "ez her roj


"Sonda me"(andımız) marşa şovan a tirk didim xwendin". Dema ku min bihîst ku ev mamoste ji ber kurdperweriyê hatiye dari zandin, devê min ji hev ma. Êdî ez gîhiştim bawerîya ku divê mirov, kûr û dorfireh li ser vê gelşê râweste û bifikire.

Kirinê M. Kemal, nêri na wî ya bi navê "yek şef, ebedî şef" yek partî û polîtikaya wî ya siyasi, çandî, di gelek warên jiyanê de derdikevin pêşperî mirov. Lê mixabin ev yek ji ber çavan hatiye xef kirin. Ji bo vê yekê M. Kemal bûye weke tiştekî razber û bi tilsim. Heçku M. Kemal serokêkî têkoşînê yê ku doza

kurdhayetiye ji dil dixwaze, tê nasîn. Bi vê nêrîna çewt, M. Kemal ji dirûvê îdeolojiya fermî derdikeye. Weke berxikekî bê guneh dixuye. Dibêjin, M. Kemal gotiye "ev meclîs a tirk û kurdan e. Meclîseke hevpar e." Ji ber vê bawerîye M. Kemal ne xwediyê îdeolojiya fermî, ne serokê ebedî yê benda gel a Komarê (C.H.F)ye. Gelo kemalîzm ev e? Têkiliyên kemalîzmê û kurdayetiye çawa ne, nakokî û dijberiya wan bi çi awayî ye? Bîr û bawerîya kemalîzmê, polîtîka di derheqê netewa kurd de çawa ye?

Mirov dikare van pirsan bi nêzîkdayineke teorîk bi-

bersivîne. Lê ku mirov bi kirûyan, bi pirazeya ku hattî jiýîn, bi gotin û biwêjên ku hatine bi lêv kîrin ber bi meselê ve here dê baştîrîn bibe. Wê demê biwêjên teorîk jî dê li hemberî zelal-kirina pirêzeya M. Kemal zelal bibin. Kemalîzm /Atatürkperestî/ îdeolojiya dewletê ya fermî /CHP û iktîdara yek partiyê hemû bi serê xwe tevahiya sîstemekî ne. Wateya naveroka kemalîzmê, îdeolojiya dewletê ango feraseta "fermî" ye. Tevahiya dewleta tirk a polîtîk, civakî, çînî qevmî û rêexistina siyasi ye. Di heyama rojêna iktîdara yek partiyê de bi rêk û pêk bûye û domdar bûye. Ke-



malîzm navê sîstema siya-set, çand û civakiya dewle-ta tîrk e. Navê burokrasî, polîs, leşker û politikaya derveyî welêt e. Lîvbaziya M. Kemal a ramanî, leşke-rî û rêxistinî kemalîzm e. Piştî sala 1919 an, kema-lîzmê li Rojhilata Navîn weke kirûyeke girîng cih girtiye û mijara wê “nakokî”, “ji holê rakirina” kur-dan û “pevçûna” wê bûye. Helbet netew û gelên din jî bûne hedefa êrişa kema-

“Tişt” û “gotinê razber” jî helbet girîng in, lê ancax kirûyên rastîn dikarin rawe bikin.

KIRÜYA YEKEMİN

Lîvbaziya kemalîzmê M. Kemal yekpare têgiheke leşkerî tîne zimên. Kirûya netaweya Kurd, tevgerên neteweyî yêñ kurdan; bi vê lîvbaziya “leşkerî” hatiye xwestin ku ji holê rabe. “Koçberî”, “tedîp”, “ope-

şerîn qediya. Şerê vê carê dê weke şerekî bir û baweriyê, weke îdealekê bêtezanîn. Di dîroka me de, ye-kemîn car, leşkerên me di riya mefkureyê de, şer kiri-ne. Leşkerên me, di nav kabokek berf û herî de, bi lez û bez ji bo şer çûne ser Şêx Seîd.” (S.VD.C.V, s.35)

Ev gotar, di dema ku hêj nû tevgera Şêx Seîd hatibû şikandin, lê tam encam ne-hatibû girtin de, bi zimanê kemalîzmê hatiye vegotin. Ev serhîdana ku serê he-kumata Enquerê êşandibû û ji aliye leşkerên tirkan ve hatibû pelçiqandin ji gota-ra M. Kemal a ku li kome-leya tîrk hatibû vegotin re bûbû mijar. Encama vê da-girkirina leşkerî ji aliye M. Kemal ve bes nayê dîtin. Dixwaze piştî “herekatê” hîn tedbîran bigire. Peşni-yar dike ku komeleyen tîrk ên ku li rojavayê tîrkiyê zêde bûne, li rojhilate Tir-kiye jî bêne damezrandin. Dixwazin, piştî tedbîren leşkerî yêñ ramyari û çandî jî bêne girtin. Ev gotar pir girîng e. Mînakek ber bi çav e. Encama herekata Kurdistana Rojhilat weke “bûyereke bextiyar” tête dîtin. Di dîroka xwe de, leşkerên tîrk yekemîn car “ji bo mefkûre” têdikoşin. Di ser de jî, ji bo armancek e pîroz e ev şer. Bi vî awa-yî qala dagirkirina Kurdistanê tê kirin. Dîsa tê gotin ku, leşkerên tîrk bi kêf û şehînet, bi lez û bez çûne şer. Li vir peyvîn weke “cîdal”, “şer” û “herb” bi

*Di sala 1921 ê de, M. Kemal şerokê Meclîsa
Tîrkî (TBMM) ye. Cihê lîvbaziyê Sêwaz e, yêñ ku
lîvbazi pêkanîne, leşkerên hêzên ku bi
fermandariya artêsa navendî ve ne. Hêzên
çekdarî yêñ ku di bin destê M.Kemal de ne, hêj
hêzên arteşa Osmanî ne. M.Kemal li ber çavê
Osmaniyan “Fermandarê isyankar” e.*

lîzmê.” Cerd û kotekî”, “bişavtin û koçberkirin”, “valakirina gundan û qırkı-rin” herî bêtir li ser kurdan hate ceribandin. Ev lîvbaziya kemalîzmê heman wext, lîvbaziye teorîk e jî. Lîvbaziyeke ramanî, rêxistinî, çandî ye jî. Vê kirûye jiyana kurdan a berê, xaka kurdan ango Kurdistan hil-weisandiye. Li vir, çand, ji-yana gelêri, kevneşopî û toreya kurdan hatiye serû-binî kirin. Lewma jî dive ku kemalîzm pêşî bi kirûyan, derketina kirûyan; na-kokî, peşveçûn û dijberbûne kirûyan bêtê têgihiştin.

rasyon”, “tune kirin” û “paqîjî” bicihanînê vê lîvbaziya leşkerî ne. Biwêja ku van salêن dawîn tê bikan-ranîn “pê-şî bi pelçîqîne” dide xuyakirin ku ev lîvbâzî li ser bingeha kevn rûdi-ne. Em dixwazin li vir, bel-geyekê li jêr bidin nîşan. Gotinê ku M. Kemal 27.4.1925 an de gotine:

“Ev komelên weha yêñ civakî her tim li welatêñ rojava hatine damezrandin. Niha welatêñ rojhilat êşa wê dikişînin. Şoreşa komara tîrk baweriyê bi van komeleyan tîne. Dagir-keriya rojhilat bi encameke

hêsanî hatine bi kar anîn.

M. Kemal dibêje ku, di nav tixubê mîsak-i mîllî de, êdî kurd hew dikarin serî rakin. Navê vî şerê ku li hemberî kurdan hatiye dayîn jî, bûye şerê yekemîn, şerê îdealê. Taybetiya kemalîzmê, di vê kiruya yekemîn de veşartiye.

Kemalîzm, îdeolojiya fermî ya dewletê, bi gelempêrî li hemberî kiruya netewiya kurd weke şerekî îdealê derketiye holê û heta sala 1938 an a ku M. Kemal miriye ev xesleta xwe li ser piyan hiştîye. Ev xislet di laşê iktîdar û partiyê de bi cih kiriye. Heke mirov Kemalîzmê ji vê livbaziyyê dûr bigire ev nabe tiştekî maqûl. Wê demê kemalîzm nabe kirûyeke leşke-

rî. Ev jî tiştekî çewt e. Lê kemalîzmê, pêvajoyeke se-ranser livbazî û tevgereke leşkenî derbas kiriye.

KIRUYA DUYEMÎN:

Kemalîzm bi gelempêrî weke firazeyeke qirkirinê hatiye xuyakirin. Jiyana ci-vak û netewa kurdan, bûye şeweyekî jiyanê yê ku herî pir ji vê kiruyê hatiye bandorkirin. Ez dixwazim, ku li rojê 1921 ê yên Koçgirî bête nêrîn. Em bi hev re lê binêrîn û vê belgeya jor baş fam bikin: Bîranînê Ebu-

bekir Hazım Tepeyranê ku waliyê dewletê bû. Burokratikî tirk ê ku ew roj dîti-bû xwestiye ku dewletê ji kîrinê wan rojan cûda big-re. Raporê xwe, li gorî vê baweriye nivîsine. Gulana sala 1921 ê, li Sêwazê dest bi walîtiyê kiriye. (Dawî bûye parlementer) Di nivîsa xwe ya ku ji wezareta der ve re şandibû de, ji Sa-kallî Nureddin Paşayê ku kîrinê hovane li Koçgirî dike, gazinan dike. “....Ev zilam, bi pelçiqandina bû-

artêşa navendî ve ne. Hêzên çekdarî yên ku di bin destê M. Kemal de ne, hêj hêzên arteşa Osmanî ne. M. Kemal li ber çavên Osmaniyan “Fermandarê îsyankar”e. Lê di vê mijarê de her du hêz weke hev difikirin. Heke mirov li dest-nivîsên Meclîsê yên wê rojê binêrê, ev dê bête dîtin:

“Sînorê me yê neteweyî ci ye?”, “Divê ku cihê ku kurd û tirk lê dijîn sînorê neteweyî be?” Nexêr, na.

Ev dê pir fireh be.” Di van gotinan de, M. Kemal, kurdan weke birayên çarenûsî dinir-xîne. Kurdêñ ku M. Kemal behsa wan dike, helbet yên Iraq, Sûri û Iranê ne. Ne yên Koçgirî ne. Ewêñ Koçgirî, dê piştî pênc

yera Umräniyê (Koçgiriyê) wezifedar e, lê 123 gund hatine hilweşandin. Nêzî 300 kes hatiye kuştin û bi hezaran mirovên bê guneh avêtine nav lepêñ birçibûn, jarî û mirinê.” (Belgelerle Savaş Anıları s.66) 132 gundêñ ku hatine hilweşandin, 300 mirovên ku hatine kuştin, hezaran mirovên ku ketine nav pencen birçibûn û mirinê. Di sala 1921 ê de, M. Kemal serokê Meclîsâ Tirkî (TBMM) ye. Cihê livbaziyyê Sêwaz e, yên ku livbazi pêkanîne, leşkerên hêzên ku bi fermandariya

mehan ji cih û warêñ wan ên Sêwazê bêtin koçberkîrin û tar û markirin. Ji bo tevgereke herî biçûk a li hemberî oterîta navendî serê wan dikeve bela herî mezin û ew têne hilweşandin. Tepeyran weha dibêje: Ji herêma Umräniyeyê û navçeya Zarayê 76 û ji derdora Dîvrîgiyê 57, di zik hev de 132 gund hêçku yên dijmin bin hatine sotin, bi sedan mirov hatine kuştin. Wekî din jî, hemû terş û talanê wan, sewal û pezê wan hatiye talankirin. Bi hezaran mirov li ci-

*“Em li ber cibê cîbanê yê ku tirkî jê re tê
gotin, dijîn, tu cibê ji vir azadtir ê ku
mirov ramana xwe lê bîne zimên tune ye.
Lewma ez dê raman û bestê xwe eşkere
bînim zimên. Tirk, yekane mîrê vî
welatî ye. Yekane xwedîye vî welatî ye.
Ji bo yên ku ne ji nîjada tirk a safî ne, bi tenê
mafek heye. Mafê xizmetkariyê, mafê
koletiyê.”*

yan, li deşt û baniyan avêti-ne nav pencên mirin, birçî-bûn û xizaniyê. (Berhemâ ku navê wê dibihurê, rûpel: 75)

"Nureddin Paşa ev çend hejmar ne di şer û pevçûnê de, bi awayê qirkirinê dane kuştin.", "Nureddin Paşa, ev 76 gundên ku bi hêrs û çavşorî hilweşandine, careke din ava nekirine, lê fer-man pê daye ku wan li 16 gundan bicivînin." Tepeyran, di 6.6.1921 an de, ji Enqera heyeteke lêkolînê xwestiye, da ku were û vê bûyera erjeng ji nêzîk de bibîne. MM (Meclîsa Mezin), bîryar daye ku heyetek ji bo lêkolînê here herêmê. Dema ku heyeta lêkolînê çûye heremê, E. Hazım Tepeyran, ne waliyê Sêwazê ye. Mecbûr maye ku ji Sêwazê dûr bikeve.

Ev bûyer li meclîsê jî, di danişînekê de, hatiye guftûgokirin. Di cotmeha 1921 ê de, danişin bi nîqaşêke ser û ber derbas bûye. Bi taybetî jî, parlementerên şerqê (Kurdistanê) yê wê demê, rexneyên tûj, kirine. Parlementerê Erzeromê Durak Beg: "Mîrzano, hu-kumet mîna dizekî çavşor, destê xwe kiriye gewriya gel, hemû tiştên gel talan dike, lê dixe, dikuje. Kesê ku lê bipirse tune ye. Ez dipirsim, di nav sal û nîvê de ev çend neçeyî, kotekî hati-ne kirin, yek karmend be jî hatiye darizandin? Kîjan karmend çûye ber sêdarê?"

Her çiqas, li ser daxwaza rapora heyeta lekolînê, ji

kar avêtîna Nureddin Paşa hatibe xwestin jî, ew ne ji kar hatiye avêtîn û ne jî çû-ye Dîwana şer. M. Kemal gotiye, her roj buyerên kirêt çedibin, Nureddin Paşa jî, fermandar e, mecbûr maye ku bî vî awayî hel-westê nîşan bide. M. Kemal, ew parastiye. Dawî Nureddin Paşa bûye parlementer.

M. Kemal, bi sifetê serokfermandariyê, li ser kursiyê meclîsê Nureddin

Paşa parastiye. Osmanê kulek (Topal Osman) jî, li Koçgiriyê di qirkirina kur-dan de, hatiye bikaranîn. Topal Osman, fermandarê Alayıyê yê parastinê ye, li nik M. Kemal. Di pêjerojê de, Nureddin Paşa bû dijber, Topal Osman jî di êrîşa ku hatiye ser Çankayayê de hatiye kuştin û laşê wî li ber meclîsê hatiye teşhîr kirin. Li bal kemalîstan her gav "girêdayîna bi sozê re" tune ye. Kemalîzmê, her



Topal Osman

dem, di pirsgireka kurdan de, “veqetandin” û “sîxurî” bi hev re bikaraniye.

KIRÜYA SÊYEMÎN:

Kiruya “Kemalîzmê” bîrdoziya dewletê ya fermî, CHF û yek partiyê ji yana kurdan a cîvakî, çandî, ramyarî û neteweyî, herdem xwestiye ku bîhelîne, bike tîrk û asîmîle bike. M. Esat Bozkurt, 19 ê Rezbera, 1930 î, di rojnameya Milliyetê de, bi van gotinan hebûna kurdan red kiriye.

“Em li her cihê cîhanê yê ku tîrkî jê re tê gotin, dijîn, tu cihê ji vir azadtir ê ku mirov ramana xwe lê bîne zimên tune ye. Lewma ez dê raman û hestê xwe eşke-re bînim zimên. Tîrk, yekane mîrê vî welatî ye. Yekane xwediye vî welatî ye. Ji bo yên ku ne ji nîjada tîrk a safî ne, bi tenê mafek heye. Mafê xizmetkariyê, mafê koletiyê.”

Dema ku Mahmut Esat Bozkurtê ku li zankoyan dersêن dîroka “Inqilabê di-da xwendin, parlementer, wezîr û tîrkperest, kemalist bû, wêdemê, M. Kemal hêj şefê ebedî bû. Di vê demê de gotina kurdan û mafê wan hîç ji devê vî dernakeve. İktîdara yek partiyê, hemû dijber pelçiqandine, daxwaza kurdan jî, bi darê zorê yê leşkeriyê daye paş.

Abidin Özmen jî, yek ji şivanê polîtikayêñ kemalist e. Mufetişê yekemîn ê giştî ye. Abidin Özmen li herêma mufetişiya yeke-

mîn a giştî, geriya û raporek bi dizî, di derbarê buyerêñ ramyarî û cîvakî yêñ herêmê de amede kir û pêşkeşî iktîdara navendî kir. Ji ber ku ev rapor rûyê iktîdarê yê li hemberî kurdan derdixe holê, balder û girîng e. Wê demê mufetişiya yekemîn a giştî, Bedlîs, Amed, Wan, Hekarî, Mûş, Mîrdîn, Riha û Sîrt bû. Rapor, ji bo ji holê rakirina pirsgirêka kurd bû. Di raporê de kurd, hêj weke “çiyayıyan” têne nîşandan. Axaftina nifşen nû ya

bi kurdî, tiştekî metersî tê dîtin. Axaftina bi kurdî weke li paş mayînekê tê dîtin. Ev kirû heta berî 15-16 salan hêj jî weha bû. Navê “kurd” li ba “çiyayı”, “hov” û “tiştekî ku jê tê şermkirin” cih digirt. Van panzdeh salêñ dawîn, li şuna şermkirinê, xwenasînê cih girt. Bi saya şerê gerîtiyê, kurd ji vê rewşa jar û xirab, bi lez dûr dikevin. Èdî xwe biçûkdîtin, ji jiyanâ wan derdikeve.

Kemalîzmê, di dema yek partiyê de, gotiye, “Xwezi bi wî yê ku bêje ez Tîrk im”, “Tîrkek berdêla hemû cîhanê ye” û “Tîrko bixebite, bipesine û bi xwe bawer be.” Divê mirov karektera kemalîzmê ya bîrdoziya dewletê û nêrinêñ jor, ji hev cuda neke. Hêjayiyêñ tîrkîtiyê û hestê tîrkîtiyê bi saya serê bîrdoziya dewletê ya fermî û siyaseta dewletê ji holê hatiye rakirin. Ji da-wiya sedsala bîstemîn heta roja îro, bîrdoziya kemalîzmê, ji zankoyan, ji saziyêñ sivîl û yêñ dewletê, ji nav artêşê, polîsan, siyaset-vanan, weqfan û komeleyan xelas nebûye. Her cih weke maña kemalîzmê ye.

Kemalîzm bê navber û seraqt didome. Li gorî kemalistên kevn, pirsgirêka kurd, “pirsgirêkeke derveyîn” e. Ango ev problem ji derve tê û tê vekolîn. Kemalîzm hîç ne fikriye ku kurd jî mirov in û mafê wan yê siyaset, giyanî, dadgerî û mirovahiyê heye. “Yekîtiya welêt û dewletê”, di ser her tişti re ye.

*M. Esat Bozkurt,
19 ê Rezbera, 1930 î,
di rojnameya
Milliyetê de, bi van
gotinan bebûna
kurdan red kiriye.
“Em li ber cihê cîhanê
yê ku tîrkî jê re tê
gotin, dijîn, tu cihê ji
vir azadtir ê ku
mirov ramana xwe lê
bîne zimên tune ye.
Lewma ez dê raman
û bestê xwe eşkere
bînim zimên. Tîrk,
yekane mîrê vî welatî
ye. Yekane xwediye vî
welatî ye. Ji bo yên ku
ne ji nîjada tîrk a safî
ne, bi tenê mafek
heye. Mafê
xizmetkariyê, mafê
koletiyê.”*

GULAŞA NİJADPERESTÎ Ú NETEWEYÊN WELATPARÊZ

RODULFOSTIFNHIGEN BASINGSTKE

Wergêr: M. Reşid Irgat

Ev pirtûk di sala 1996 an a zayînî de, hâte weşandin. 324 rûpel e û bihayê wê 45 cuneyhê sterlinî ye. Despêka pirtûkê wiha ye: Paqikirina gemara nijadperestiyê bûye azîneke edetî. Sehkirina wê gelek hêsan e, belav û diyar e. Mînak û rasthatina wê pi-re, wekî Bosna-Hersek û Rowanda û ji bilî wan jî, ji welatên cihanê. Ji sedema nakokî û dijberiya nijadperestiyê û berze kirin, bin pê kirin û pê pes kirina mafen komelên nijadî, olî û kêşî (mezhebî) gulaşa nijad perestiyê hêşîn dibe, derdike ve holê. Ev gulaş dibe sedema encama têkoşîna paqikirina gelan, ji qiriya nijadperestiya gemar. Ev pirtûk, dixwaze pêşberê vê gulaşê çend mijarên bingehîn dayne ber çavan, raxe ber çavêن xwendevanan û ji wan bingehan çend rê û rêçikên zanistî û girîng li ser sedem û rehêن vê gulaşê diyar biket. Ev pirtûk behsê ji têkiyên her du hêzan dike. Lê dibêjin ku herdu ji hev cûda ne, ji ber ku yek homata wê li ser bingeha welatparezî û gelparêziyê û ya din jî li ser xîmên nijadperestî û kêşî ye. Ji ber van sedemên dijberî, navberek dijîti û berberî derdikey pêş her du rexan. Pirtûk di berhevoka mijarên xwe yên bija re de behs ji çend welat û herêmên cihanê yên hejmare diket. Mîna Asya, Afrîqa. Rojhilata na-vîn, Komarêن Yekitiya Sovyetê yên berê,

Emrîka latînî û hwd. Çawa ku Enstîtuya neteweyêن yekbuyî ji bo karêن pêşveçûna komelan jî, behsa vê mijarê dike. Ev pirtûk ji deh (10) beşan pêk tê. Di despêkê de behsa ji rewşa geşbûna gulaşa nijadperestî û welatparêziyê di çend Welat û herêmên cihanê diket, mînak ji wan ev in: Kurdistan, Lubnan, Malezya, Efrîqa, Burindî, Nîcerrya, Guatemala û Yekitiya Sovyetê kevn. Pirtûk rewşa nasnama nijadî, peywendiyêن wan û hacêtên nijadperestiyê bi pêş ketina aborî, konevaniya nijadî û bi dûr ketina neteweyêن yekbuyî jî bi vê gulaşê ve girê dide. Yek ji her deh beşen pirtûkê behsa ji pêşveçûnya hiş û hedam û tevgera nijadperestî di welatên rojavayêن xwedî pîşkar (sanayî) bi taybetî jî yekîtiya

Emrîka de dike.

Pirtûk beşa xwe ya dehemîn ji bo guf tû go û dîtinêن ramyarî ji bo çareseriya vê pirsgirêkê vediqetîne bi navê: (Rêveberiya-gulaşa nijadperestî û dewletên, pir nijad) dinivise. Nivîskar di pirtûka xwe de, behsa ji encama pelişîna vê tekosînê di çend cihan de dike, mîna Burindî û Lubnan. Dîsa nivîskar behsa ji serkeftina çend welatan dike. Mîna Senegal û Efrîqa û bi vî rengî vê pirsgirêkê yek ji pirsgirêkên cîhana nûjen dijmêre.

Weşaner: *Macmillan Press, Houndsills, Hampshire RG21 6xs, U.K.*
Kovara ElAlem (Erebi)

J. İHSAN ESPAR

Mi demewo ki kitabê Mehmet Gülmезî "Dêrsim ra ve Dare Estene/Seyid Riza (1)" wendinê, yew çiyo ki caran ez ser o nêfikiryaya ame mi vîrî: gelo mi raya verêni namey Dêrsimî, namey Seyid Rizay key, senê (çi turî) û kotî eşnawito? Ez yew demewo derg û dila fikiraya, nêame mi vîrî ki ez key û senê raştê namedê Seyid Rizay ameya. Labelê Dêrsim,

Dêrsim ra ve Dare Estene

SEYİD RİZA

qeçkeya mi di zî mi rê cayêdo xam nêbi. Çimkî yew pîranjî, xal Mih, serrarê cengê Dêrsimî di ay cayan ra eskerey kerdbî. Sey na heli mi vîrî yeno, demewo ki ez hime qeçek (doman) bîya gege şar xal Mihî persaynî vatinî "de vaji xal Mih, şima Dêrsim di se kerd?" Ey vatinî "ez durî bîya, mi hêrb-merb nêkerdo." Ebi abi hewa, mi fahm kerdinî ki ebi name bê Dêrsimî yew ca esto û ay ca di yew deme herb bîyo. Kamî vera kamî herb kerd, ci rê herb kerd, persê inasarênî ay wext mi rê zaf bar nêbî.

1970 ra pey, gama ki ma mefhûmê kurd û Kurdistanî nas kerdî, ma fahm kerd ki cayo ki xal Mihî eskerey kerd, Kurdistan di

cayêdo muhîm o. 1980 ra pey derheqê Dêrsimî di zanayışê ma serri bi serri hina zaf bi. Çaxo ki ma kitabê Nuri Dêrsimî û Zinar Silopî wendî, ma va qey rasteya Dêrsimî hemen endi ya. Labelê mesela wina nêbi. Hergû raya ki derheqê Dêrsimî di kitab yan zî nuşteyêdo newe ma dest kewt, ma dî ki zanayışê ma zaf tanî yo û tanî çiyê ki ma rast zanay-nî şas î. Eki ma kitabê Memet Gülmезî yo ki ez wazena tiya bido naskerdene, ebi dîqqet biwanî, ma veynenî ki derheqê cengê Dêrsimî di, derheqê Seyid Rizay û embazanê ci di, çiyê ki ma hima ganî (gerek) bimusî geleki yî. No kitabo ki Zed Yayın, 1996 di İstanbul di çap kерdo, 192 riperrî yo û peynîya kitabî di yew albumê fotografan esto.

Nuştox Memet Gülmez 1950 di Dêrsim di dayka xo ra bîyo û hetanî serra 1993 Dêrsim di mendo. Hewawo ki o nuseno semedê (seva) nuştena nê kitabî, o gelekî cayanê Dêrsimî ra geyrewo, ci cenî ci camêrd, tanî kesan di meselaya Dêrsimî ser o qisey kerd. Keynay Seyid Rizay, Leyla Xatuni(2), nê kesan ra yew a. Keso bîno ki me'lumat dawo nuştoxi, vistewrey Seyid Rizay (birayê Beseri Xatuni) Hemê Boxî (3) yo. Sewbî zî nuştoxi nê dêrsimjan reydi qisey kerd, ïnan perso wo: lacê datê (apê) Seyid Rizay, Sahêyderê lacê Sêy Kekoy, Çeqperîye ra Heyderê Çolaxî, Heyderû ra Aliyê Uşenê Hemedî ve Feratê Aliyê, Bornege ra Baba Momid, Korte ra lacê Dewreşî Şukrî, Hêniyê Dizdu ra Alî Ekber, lacê Aliyê Uşenê Hemedî Cefer û keynay Polat Axay Seweliye.

Gama ki ez dest bi wendişê riperrê verêni kena, Dêrsim di hamnan o, serrî 1937 a, Seyid Riza Gogane (4) di yo; wazeno Alışerî biveyno. Alışer Palaxine (5) di ebi Zerîfa Xanîmi û lacê birazay xo ki ci ra vanî Lazê

1 Namey kitabî yo orijinal wina wo: Dêrsim'ra ve Dare Estene/Seyid Riza. Mi no name gore bê rastnuştena (îmlaya) kurdî nuş. Seki yeno zanayene rastnuştena kurdî di postpozisyon cîya nuseno û ci ra ver apostrof (') neronêno. Namey Seyid Rizay zî mi hezey telafuzê kurdî nuş. Tena kurdê Dêrsimî, ebi lehçeya kirmancî, Seyid Rizay ra vanî "Seyid Riza".

2 Leyla Xatuni, surgun ra pey ageyrawa ameya Dêrsim; gama ki dewleti, 1994 di, dewê Dêrsimî veşnay aye welat terk kerd, şîya Almanya (biewnî, ripper 78).

3 Hemê Boxî surgun ra pey ageyrawo amewo Dêrsim, gama ki dewleti, 1994 di, dewê Dêrsimî veşnay ey bar kerdî şîyo Mersin. O, 1994 di Mersin di merdo, o wext 'emrî ci 120 serrî ra vîşer bîyo. (b. r. 19)

4 Gogane nizdî dewa Seyid Rizay, Axdade, namey cayek o. (b.r.9)

5 Palaxine, Koyê Tujik ser o namey cayek o. Semedo ki Alışerî Uja yew mixara di mendinî, ewro zî na maxara ra vanî "Mixara Alışer Efendi". (b. r.9)

Usê Kergû, yew mixara di manenî. Alîşêr ye-wa Seyîd Rizay di nêkeno, ca di yeno Gogane, Seyîd Rizay veyneno. Seyîd Riza, Alîşêrî ra wazeno ki o şero dugelanê teberî û úja bixebetîyo. Seyîd Riza karê ki dugelanê teberî di ganî bêrî kerdene, yew bi yew hûmareno (6). Labelê Reyberê Qopî (7) semedê kiştena Alîşêrî Zeynel Top(8) xapênawo, Zeynel bîyo mîlisê dewletî. Ay

rojo ki Alîşêrî Dêrsim ra vejjîyêno, Zeynel ebî çend kesan (9) xo Alîşêrî resneno; A-lîşêrî, Zerîfa û Lazê Usê Ker-gû kişeno. Zeynel Top, serey Alîşêrî û yê Ze-rîfa Xanimi be-no karargaha tirkan a ki Koyê Bokire dir a, teslîmê zabitê tirkan Nazmî Sevgeni (10) keno.

Ebi kiştena Alîşêrî derbêka girani Seyîd Rizay ginena. Şerî zanayey Dêrsimî, ebi destê mîrdimanê ey kişiyawo. O paweno ki ‘eşîri, Zeynel û Reyberî bikşa û qesasê Alîşêrî bigîra. Labelê ‘e-

şîri xo nêdana nê gurî ver. Seyîd Rizay Ax-dad ra bar keno şono Şorşîvank (11) ‘eşîra Dewrêşcemelan miyan.

Cengê Dêrsimî dewam keno; Seyîd Rîza wesêneno Şahan Axay ser ki o bêro ey heti ki weziyetê Dêrsimî ser o qisey bikî. Şahan

(12) Axa yeno, qisekerdena ïnan ra fahm be-no ki bêtîfaqey miyanê ‘eşiranê Dêrsim di girs a: heta Xozatî ra hal rind niyo. Hukmatî serekê ‘eşîra Şîxû, Sêy Uşen, berdo Xarpêt; aw semed ra ïnan tifing nêteqna-wo. Ridê ïnan ra Hêyderû ra zaf mîrdimî kişiyay. Demenû herb kenî la Alû û Arêzû dixalet dawo dewleti; pilê Kurêsu ra Alî Efendiyê Qilaçkiye polê dewleti yo. ‘Eşiranê dormê Koyê Bovere û Gurkî ra xeberi

çîna, dormê Çemê binê Pulemiriye di tanî ‘eşîri bêveng î, tanî polê dewleti yî. Heta Xozatî di, cepheyê Bextiyarûn di, ceng roj bi roj girs beno yanî Şahan Axa cepheyê xo di diş-

M E H M E T G U L M E Z

Dêrsim'ra ve Dare Ester

6 Ebi kilmey nê karê nê yî: a) Dinya weziyetê Dêrsimî ra xeberdar bikî. b) Çek û cepxane peyda biki. c) Xeberî bidi kurdan, wa bêrê hewara Dêrsimî (b. r. 12)

7 Namey Reyberê Qopî yo rastikên, Reyberê Seyîd Axay o, Seyîd Axa, birayê Seyîd Rizay o. (b.r.14)

8 Zeynel mîrdimê Seyîd Riza yo. Semedo bi bawkê Zeynelî, Alî Axa, rew kişiyyawo, Zeynel key Seyîd Rizay pîl bîyo. (b. r.14)

9 Kesê ki Zeynelî reyra şîbî mixara Alîşêrî nê yî: Usê Xidê Murî, Vank ra Efendî, Mistê Tornê Surê, Calê Usê Ferî û çend kêsî bînî. (b.r. 19)

10 Nazmî Sevgeno ki ay wext rutbey ci ustegmen bîyo, dim a ebi rutbe bê albayey ordiyê tirkan teqawit bîyo. Kurdan ser o gore bê ideolojîyê dewleti gelekî kovaran di nuştey nuşti. Dim a nê nuştey ci, “Türk Kültürünu Araştırma Enstitüsü”, 1982 di, ebi name bê “Doğu ve Güneydoğu Anadolu’da Türk Beylikleri/Osmanlı Belgeleriyle Kürt-Türkleri Tarihi” heze kitab çap kerdî.

11 Namey na dewi ebi hîre hewayanê cîyayan nusiyawo: Şorşîvank (r.41), Sorsivank (r.42), Sorsvank (r. 42)

12 Namey Şahanî gege heze Sahan (r. 52) nusiyawo.

menî perîşan keno.

Usiv Axawo Laçnij pey hesiyêno ki dewleti cay Seyîd Rizay ca kerdo, eskeranê Xozatî tedarikê xo dîyo, erzenî Seyîd Rizay ser. Usiv Axa xeberi dano lacê Seyîd Rizay, Şêx Hesenî, labelê Şêx Hesen nêweş o, nêwazeño cayê xo bivurno. Semedê cavurnayene Seyîd Riza keno nêkeno nîşno lacê xo îqna biko. Seyîd Riza ebi çar peyanê (13) xo şono Qula Toqmaq Bavay. Sodir di Seyîd Riza ameyena eskerî veyneno, xeberdayışê Seyîd Rizay ra pey, Şêx Hesen, cenî û qeçekî benî hîrê qifley û Pulê Çequerî di yew xendeqî mîyan di xo nimnenî. Eskerê tîrkan ìnan veyneñî, ebi bomban hemînî kişenî. Kiştoxan ra hîrê camerdi, şes cenî û vîst zî qeçekî yî (14). Key Seyîd Rizay ra keynaya Seyîd Rizay Leyla, keyneyê Şêx Hesenî, Nare û Cemîla, nê qetlüamî ra sax xelesiyêñî. (15)

Qesbay gonîweranê tîrkan, ebi kiştena qeçekan û tornanê Seyîd Rizay, honik nêbena; wazeni Şahan Axay zî orte ra wederî. Çimkî Şahan Axa gelekî cayan di zor dano dewleti;

semedo ki dewleti bişa (bese bika) Xozat di, Qerevlanî di ebi asaney hereket bika, ganî Şahan Axay ra pank ba. General Abdullah Alpdoğan semedê kiştena Şahan Axay emirêdo xususî vejeno. Albay İsmail Hakkı Tekçey ebi nimitikî embazanê Şahanî veyneño û semedê kiştena Şahanî ìnan xapênenô.

Şahan şono ‘eşîra Qozû mîyan ra geyreno ki ê zî vera dewleti dest bi lejî bikî; I*vê Mistê Sate, Lilê Verojî, Memê Pirçoy zî ey reydi yî, Demewo ki Şahan xo di şono, ê Şahanî kişenî. Kiştena Şahanî ra pey ‘eynî roj, ebi dek û dilavan, datê Şahanî, Alışan Axay zî kişenî. Nê xayînî, serey Şahanî û yê Alışanî benî teslimê qumandarê tîrkan kenî. Serek û reyberê Dêrsimî ebi xayîney û bêbextey yew bi yew kişiyêñî. Seyîd Riza tena maneno. Dewleti, ebi name bê walîyê Erzinganî Fahrî Özenî, di qasidan ruşnena Seyîd Rizay heti. Qasîdan ra yew talîvê Seyîd Rizay Cansal Axa wo. Cansal, Seyîd Rizay Gogane di veyneno mektubî dano bide. Mektubî di walî nuseno ki yew heyetê



**Rêberê
Serhildanê
1938 ê
Seyîd Riza,
Fermandarê
xo Üsen û
Findik ra.**

13 Kesê ki Seyîd Rizay reydi yî nê yî: Têslîm, Alî Avas, Memê Bêjî, Use Kelecî.

14 Nurî Dêrsimî, kitabê xo “Kurdistan Tarihinde Dersim” di nuseno ki hinzar çekdarê Seyîd Rizay tiya kişiyay. Wina a-seno ki me’lumato ki Dersimî dano rast nîyo.

15 Hewawo ki nuştox nuseno, demewo ki no kitab nusiyawo, Cemîla û Nare weşî bîy û Dêrsim di mendinî.

Mistefa Kemalî wazeno ey di qisey biko. Seyid Riza şiyayena xo ya Erzinganî ser o ta-ket-naket keno. Peynî di qerar dano ki şero Erzingan. Rizê Bertî û şwaney Sêkîna (16), Welî, Seyid Rizay reydi kewenê rayirê Erzinganî ser, gama ki yenî purdê Alî Çawişî ser cendirmey purdî ser o vinderte benî. Cendirmey ìnan ‘edelnenî, paşilê Seyid Rizay di durbun û şeşadirî veynenî û aw semed ra ey tepşenî (17). Seyid Rizay benî Erzingan, ûja ra zî benî Xarpêt.

Seyid Rizay, lacê ci Reşik Use, Şey Usenê Pirgiçi, Hesenê Qızı, Alîyê Mirzê Silî, lacê Qemer Axayê Usivan Findiq Axay, Civrayîl Axayê Arekiye û lacê ci Hesenî Xarpêt di xeneqnenî (18). Dareştena Seyid Rizay ra pey yew deme vêreno, gardiyan Mistefa wesêneno Xidirê Avasızî ser ano xo heti, de rê wesîya Seyid Rizay vano. Mistafa vano ki Seyid Rizay mi ra vato: to mi rê xizmet kerdo, ez tora weş a, polê qaputê mi di hîris zer-nî estî, wa zernî sey şitê maya to to re helal bî labelê gama ki ez berda binê dari, ci qiseyê ki mi fek ra vejiyyat mîleta mi ra vaji; qiseyê mi emanetê to yî.

Ordiyê tirkan dareştena Seyid Rizay ra pey zî Dêrsim ra nêvejiyêno. Wisarê serra 1938 di Zeynel Top newe fahm keno ki Reyberê Qopî o xapînawo. Zeynel newe ra vera dewleti dest bi cengî keno labelê aşmî ra pey ki-

Seyid Rizay, lacê ci Reşik Use, Şey Usenê Pirgiçi, Hesenê Qızı, Alîyê Mirzê Silî, lacê Qemer Axayê Usivan Findiq Axay, Civrayîl Axayê Arekiye û lacê ci Hesenî Xarpêt di xeneqnenî

şiyêno. Yew mîlisê hukmati ki namey ey Nûralî yo, ebi desturê qumandarê qarargaha tu-meni Cevdet Sunay, cenîya Zeynelî xo rê mare keno.

Nê hedîseyan ra pey nuştox çend serî te-pa (apey) şono û kiştena Bava İ*vrayîmî, rasterast fekê Hemê Boxî ra nuseno. Hewa-wo ki Hemê Boxî vano, Bava İ*vrayîm 1933 di kişiyawo (19). Herçiqas ki çar kesan (20) pîya nawo pa la Bava İ*vrayîm ebi guleyê lacê Sileman Axay Memedi kişiyawo. Kiştena Bava İ*vrayîm ra pey Seyid Riza erzeno dewanê Qırxû ser, Şîne veşneno. Usenê Sîyîdi wazeno ‘eşîran pê biyaro. Pîlê Qırxû, Seyid Riza û pîlê tanê ‘eşîranê bînan yenî yew cemât di roşenî. No cemât di kiştena Bava İvrayîmî di rolê Reyberê Qopî vejiyyêno meydan. Reyberî verê yew sened nuşto, dawo Mîmedî ki eki Memed Bava İ*vra-

17 Memet Gürmezî tarîxê tepşîyayışê Seyid Rizay nênuşto. Nê tarîxî ser o fîkrê cîyay estî: Nurî Dêrsîmî nuseno ki Seyid Riza 5ê aşma elule (05.09.1937) di amewo Erzingan. Dr. Şivan (Sait Kirmizitoprak) zî nuseno ki Seyid Riza 5ê elule di tepşîyawo (bîewnî, Dr.Şivan, Kurt Millet Hareketleri ve Irak'ta Kürdistan İhtilali, Apec, 1997 Stockholm, r.86) Kovara Berhemî kitabdî Türkiye Cumhuriyetinde Ayaklanması, 1924-1938” neqil kena ki no tarîx 10ê aşma elule (10.09.1937) yo. İsmail Beşikçi kitabê “Tunceli Kanunu (1935) ve Dersim Jenosidi” di nuseno ki Seyid Riza 5ê aşma elule di tepşîyawo. Pars Tuğlaci kitabê “Çağdaş Türkiye Tarihi” di nuseno ki Seyid Riza, 12ê aşma elule di (12.09.1937) tepşîyawo. Hewna nuştoxê Berhemî neqil keno ko kovara “Medya Güneşi” di nusiyawo ki Seyid Riza, 5ê aşma elule di tepşîyawo. Seki yeno zanayış İhsan Sabri Çağlayangilî xatirayanê xo di behsê na mesela kerdî. Labelê tarîxê tepşîyayışê Seyid Rizay ser o çî nêvato.

18 Rojê xeneqnayışê Seyid Rizay zelal nîyo. Kitabê Gürmezî di, binê fotografê Seyid Rizay di wîna nusiyawo: “Seyid Rizawo ki 18ê aşma qanûne 1937 di amewo xeneqnayış û veşnayış.” Beşikçi û Dêrsîmî nusenî ki Seyid Riza, 18ê aşma teşrifîne 1937 di Xarpêt di amewo xeneqnayış. Nuştoxê Berhemî, vano no tarîx, 15ê aşma teşrifîne yo. Gore bê Pars Tuğlaci zî, Seyid Riza 15ê aşma teşrifîne 1927 di amewo xeneqnayış. Eşkera wo ki 1927 yew şâşeya çapî ya.

19 Serra kiştena Bava İvrayîmî ser o Münzûr Çem wîna nuseno “Serra 1934 ya ki 1935 ine wa ez rind nêzonen...” (bîewnî, Münzûr Çem, Tayê Kilamê Dêrsîmî, Stockholm, 1993, r.144)

20 Kesê bînî ki Mîmedî reyra Bava İvrayîmî re nañî, nê yî: Lacê Guli Qusê Müslîmî, key Satoxlî ra lacê Hesenî Axay Xidikan û tornê Rizayê Wêlî Bakê Momî.

yîmî bikşo pâncas zernî û yew tifingê alamanî dano bide. Memed nê senedî huzirê cemati dî waneno. Hini çîyo ki kes biwajo nêmaneno, cemât vila bêno.

Nuştox yewna meselaya muhimî, herbê Şêx Se'îdî, Hemê Boxî ra perseno. Vatisê Hemê Boxî gore, wexto ki eskerê Şêx Se'îdî erzenî Xarpêt ser û şaristanî hukmatî ra gênî, Hesen Xeyrî Seyîd Rizay mektub nuseno; mektubê xo di vano ki o zî embazê Şêxî yo û wazeno ki Seyîd Riza Dêrsim di berzo hukmatî ser. Seyîd Riza mektubî waneno û çend rêzan binê mektubî di nuseno û ruşneno Ali Axayê Kalû rê, vano: ez erzeno Xozatî ser, Xozatî gêno. Ti zî Kalû, Kaçalû, Bolîyû û sewbi 'eşiranê bînan banci pêser û berzê Erzinganî ser.

Hesen Xeyrî rojo bî rayna xeberi ruşneno, vano ki eskerê Şêx Se'îdî cepxaney hukmatî nêdiyo, taynan dikanî talan kerdî, xarpeti-jî qorrî bîyê embazê hukmatî, eskerê Şêxî pey ser ancîyawo şîyo heta Palî ra. Na xeberi ra pey Seyîd Riza nêerzeno Xozatî ser.

Nê hedîseyê ki mi ebi kilmey behsê inan kerd, kitabê Gulmezî di derg û dila amey nuştene. Bêguman wendena nê kitabî ra pey kes şêno hereketê Dêrsimî ser o gelekî analîzanê sîyasîyan biko. Labelê ez tena wazena çend hedîseyanê müşexessan (konkretan) ser o fikrê xo vaja:

Hesen Xeyrî Seyîd Rizay mektub nuseno; mektubê xo di vano ki o zî embazê Şêxî yo û wazeno ki Seyîd Riza Dêrsim di berzo hukmatî ser. Seyîd Riza mektubî waneno û çend rêzan binê mektubî di nuseno û ruşneno Ali Axayê Kalû rê, vano: ez erzeno Xozatî ser, Xozatî gêno.
Ti zî Kalû, Kaçalû, Bolîyû û sewbi 'eşiranê bînan banci pêser û berzê Erzinganî ser.

a) Wendişê nê kitabî ra pey kiştena Alîşer û Zerîfa Xatuni ser o hetanî nika ma ci wen-do yan zî eşnawito ganî ma xo vîr a bikî. Çimkî hetanî nika çîyo ki derheqê na mese-la di nusiyawo, salixan gore nusiyawo. Me-met Gülmezi, kesê ki ay wext na mesela mî-yan di bî, inan di qisey kredo. Semedo ki zaf mîrdiman reydi qisey kredo şîyawo vatisê i-nan bido pê ver, muqayese biko. Yanî çimey ey şima çend vajî endi saxlem î. Mesela, Hemê Boxî him mîrdimê Seyîd Rizay o, him embazê ey o û him zî timûtüm Seyîd Rizay heti bîyo. Leyla keynaya Seyîd Rizay a, Sahêyder datîzay ey o.

b) Derheqê qirkerdene cenî, qeçek û tor-nanê Seyîd Rizay di çiyê kî hetanî nika nusiyay xelet î. Gelek cayan di mi wendo ki Pulê Çeqere di, cawo key Seyîd Rizay ra hî-ris tenî kişiyay, herbêdo derg û dila biyo; no me'lumat rast nîyo, çimkî kiştoxan ra tena hîrê tenî camêrd î, ê bînî cenî û qeçekî yî. Seyîd Riza û çar peyey xo zî Pulê Çeqere ra dur î.

c) Reyberô Qop tena kiştena Alîşerî di nê, labelê heme merhelanê sarewederdena Dêrsimî di wayirê rolêko gelekî xirabî yo. Nê serran di ci xayîneya ki Dêrsim di bîya engîsta Reyberî te de esta.

d) Seyîd Rizay ci rî şîyo Erzingan? Senê û kotî teşşîyawo? Cewabê persanê ina-sarênan ma nê kitabî di veynenî. Heta bîni ra wendoxî, do Seyîd Rizay ne tena heze se-rekê Dêrsimî labelê heze bawk, heze mîrdim hina weş nas bikî. Portreya Seyîd Rizay zaf realist a.

e) Kiştena Şahan û Alîşan Axay, kiştena Bava İvrayîmî û çend meseleyê muhîmê bî-nî ebi nuştene nê kîtabî zelal bî.

Tanî kemaney û şâşeyê werdî zî mi çiman vera kewtî. Kitab ebi di teknîkanê ciyayan nusiyawo. Babeta Şêx Se'îdî û a Bava İvra-yîmî rasterast fekê Hemê Boxî ra nusiyaya. Labelê zafaney kitabî di nuştoxî, yewna tek-nîkê nuştene gurênavo, waşto karekterêko edebî bido xebata xo. Fikrê mi gore eki nuş-toxî no kitab di tena ca bidaynî vateyanê ê kesanê ki ey te dir qisey kredo ka ki hina rind bo. Heta rastnuştene ra tanî çiyê şâşî ki-tabî di estî. Herçiqas ki nuştox bo xo vano

“...Kirmancî nusnayêne ser o tecrubê mi çinê bi, mi rê zof zor amêne” zî kîtabêdo endi bi qiyemet û muhîm, ganî ebi nê xetayan çapi ro nêginaynî. Mi heta rastnuşena ra bebet babet şâşey dî, ez hergû babeti ra numûnan dana:

Rast	Şas
nîyo	nî yo (21) (r.6)
berxudar	berx û dar (r.8)
Gogane	gogane (r.10)
gerek e	gerek (r.12)
biyêne zêdîye	biyêne zêdî ye (r.13)
bifetilne	bi fetilne (r.17)
werte ra	vertera (r.18)
esto	est o (r.20)
vişiyayme	vişiyay me (r.41)
çêver	çever (r.44)
naye kî	nayekî (r.53)
dewletêda	dewlête da (r.63)
hîrê rojî yo	hîrê rojîyo (r.66)
ma hermet û domon îme	
	ma hermet û domonîme (r.73)
amika xo de	amikaxodê (r.74)
Sayêkerdene de çêna	Sayêkerdenede çêna
Şix Hesenî Cemîla kî	Şix Hesenî cemîlakî (r.80)
Nonê ma qedîyo	Nonê ma qedî yo (r.86)
sifî	sif rî (r.96)
dayra qaymeqamî	day ra Qaymeqamî (r.99)
biye tengे	biye teng e (r.103)
kerem ke	keremke (r.111)
Ez elçiyê walîyê Erzinganî yûne	
Ez elçiyê Valîyê Erzinganîyû ne(r.111)	
mekero	me kero (r.122)

Rast Şas

Xatune ti sen a, wes a, rind a
Xatun ti sena wesa rinda (r.169)

biyaro biya ro (r.185)

Nuştoxî nuşena hûmar û tarîxan di zî formêdo müşterek nêxebetnawo. Mesela yew riperrî di hûmarî û tarîx ebi hîrê hewayanê ciyayan nuşti: 16ê asma ammoniya pêyêne 1937'de (...) 21 ye asme ra dime (b. r. 71).

*Wendena nê kitabî re pey tanî
çiyê ki ma verê wendbi ma ganî xo
vîr a bikî. Ebi nuşena nê kitabî
Memet Gülmезi raşa zî karêdo
erjaye kerdo. Semedê na xebatî ganî
ma Memet Gülmезi rê, zerrida
safî ra, spas bikî. Eki ma wazenî
Seyîd Riza nas bikî ma ganî nê
kitabî biwanî!*

Yewna xeta nuşena notanê binê riperran di esta. Tanî cayan di hûmar yew riperr di not bi xo yewna riperr di yo. Labelê geleki cayan di hûmar esto, not çîno; tanî riperran di not esto hûmar çîno. Mesela riperr 71 di notê 18 û 19; riperr 85 di notê 1 û 2; riperr 86 di not 4; riperr 117 di notê 1, 2, 3 nênusiyay. Riperr 104 di çar notê binê riperrî di nusiyay labelê hûmarî nênusiyay.

Belê, mi verê vaibi, ez rayna vana; wendena nê kitabî re pey tanî çiyê ki ma verê wendbi ma ganî xo vîr a bikî. Ebi nuşena nê kitabî Memet Gülmезi raşa zî karêdo erjaye kerdo. Semedê na xebatî ganî ma Memet Gülmезi rê, zerrida safî ra, spas bikî. Eki ma wazenî Seyîd Riza nas bikî ma ganî nê kitabî biwanî! Eki ma wazenî sarewederdena Dêrsimî fahm bikî ganî ma rayna nê kitabî biwanî! 10.10.1997

BANDORA ÇIROKAN LI SER GEL Ú NIVİSANDINA WAN

Çiya Mazî

Wekî tê zanîn wêje, bingeh û rûmeta zimanê netewan û çanda gelan e. Wêje jiyanâ gel rast dike, pêş ve dibe, xweş dike û dilxweş dike. Şaristaniya netewan bi wêjeya wan ve girêdayî ye. Wêje li jiyanâ di nava gel de jî bandorê çêdike.

Ji Konfiçyus pirsîne: "Heke em te bînin serê dewletê, karê yekemîn tu dê çi bikî." Konfiçyus wiha bersiv daye: "Ez dê di serî de, dest bavêjim zimên. Lewre, dema zimanê gel ne rast be, zimanê zagonan jî ne rast e. Zimanê di zagonan de tê bikaranîn ne rast be û gel baş jê fam neke, dê tevlihevî çêbibe û ew zagon bi awayekî bi rêk û pêk nayêñ bikaranîn. Wê demê jî, dadmendî sôdê nade gel û dewletê û wê gengeşî her tim hebe."

Bê guman, ji bo ku zimanê netewan bi rêk û pek bibe, divê sazî hebin û ji bo ku ev sazî bandorê li ser zimanê gel û rastkirina zimên bike jî, divê dewlet hebe. Neteweyêñ ku dewleta wan heye, bi awayekî, zimanêñ xwe tîmin ser riya rast. Lî yên ku dewleta wan tune be zimanê wan bela wela ye û ji ber ku çanda nivískî tune ye jî, her diçe ew

ziman winda dibe.

Wêje ji roman, çîrok, zargotin, şîr û hwd. pêk tê. Emê di vê nivîsê de, mijara çirokan û bandora wan a li ser gel bînin zimên. Bi taybetî çirokêndî.

Çîrok, bi piranî bûyerên ku hatine jiyanî tîne zimên. Ji ber ku di dîroka kurdan de, ew

nehatine nivîsandin, valahiya wan, dengbêjan tijî kiriye. Heke tijî ne kiribe jî, dilşînêñ gel pir, hindik anîye zimên. Iro mirov baş bala xwe bidê mirovê bibîne ku dengbêj heñe ku dema distirêñ, him çîrokê bi awayê vegotinî û him bi awayê stranî dibêjin. Ji ber vê yekê jî kasetêñ ku dadigî



rin pir dûvdirêj in. Dema mirov li dengbêjan guhdarî dike mirov dibîne ku hîmen zimanê kurdî dihewîne. Çîrokên dengbêjan çanda kurdan giştî radixîne berçavêن mirov. Çanda kurdan bi bandora van dengbêjan heta îro hatiye. Bê guman wêjeya nivîskî hebûya, wê cîhê dengbêjan ewqas ne girîng bûya. Ji ber ku di dîroka kurdan de bûyerên dîrokî, bûyerên li ser jiyana gel çêbûne, nehâtine nivîsandin, an jî serdestan wekî dilê xwe bi zimanê xwe nivîsandine. Tenê bûyerên ku li ser jiyana gelê herêmî pir bandor çêkirine, ew jî ji dehan yek ji aliyê dengbêjan ve hatine gotin. Ji ber bandora bûyeran, dengbêj û çîrokbej derketine holê. Dengbêj ne ji bo çanda kurd bi pêş ve bibin derketin holê. Ji ber ku bandora wan li ser gel çêbûye, li ser wan jî çêbûye û wan jî anîne zimên. Mirov tu carî nikare bibêje dengbêjan bi rastî ev valahî tijî kirine. Bûyerên girîng bi hezaran jî nehatine gotin û nivîsandin. Ew bûyerana di pêvajoya dîrokê de, winda bûne. Em van bûyeran carinan di arşîvê biyanan de dibînin. Ji vê yekê re tenê em dikarin bibêjin, mixabin!

Divê mirov rûmeta berhemên dengbêjan bigire. Ji bo ku mirov hînî fikirandina kurdî bibe, divê mirov pir li dengbêjan guhdarî bike. Lewre di stranên dengbêjan de, gelek biwêj, gotinêñ pêşîyan, peyvîn cûr bi cûr ku ji aliyê gel ve, berê dibatin bikaranîn bene û bevolkên hîmê zimên têne bikaranîn.

Dema ku bavêne me li dengbêjan guhdarî dikirin (an mirovên me yên berê, ne xwende) û pê dilxweş dibûn me xortan qerfê xwe bi wan dikirin û me wekî paşverûtiyê, kevnepereştiyê diditîn. Ji ber wê yeke, êdî wan jî ji fedîyan guhdarî nedikirin. Niha jî, li hin deveran ev heye û hin kes wekî paşverûtiyê dibînin, dibêjin "eee, de ev çiye sê seetan lê lê, lo lo!" Lîro em dibînin stranên dengbêjan; dîrok e, wêje ye, çîrok e û roman e.

Ez 37 salî me û ez gihîştîm dema dengbêjîn li derdora me bi nav û deng bûn. Bavê min dema li dengbêjîn wekî Fadilê Kufragî, Mahmûdê Hesê, Necmedînê Dêrikî guhdarî dikir û keser dikişand û hêşir dibarandin, min jê fam nedikir. Dema ku Necmedînê Dêrikî Siyabend û Xecê digot û bavê min sed a-

xîn dikişand jî, tenê dilsewatiyek bi min re çedîkir, ew jî ne ji stranê, ji axîna bavê min bû, û min axîna wî fam nedikir. Lewre min dibistan dixwend û min dinya bi ziman û çanda biyanan fam kiribû û mîjiyê min li gorî çanda biyanan hatibû neqîsandin. Di salêñ berî heşteyî de, dema ku zanîna sosyalîzmê kete serê me, me wê demê bi temamî dev ji çanda xwe berbabû û dengbêj ne li ser bala me bûn. Me ev yek wekî kevnepereştiyê didit. Şivan Perwer wê demê em pir xistin peroşiyê. Helbet hunermendêñ me yên nûjen pir bandor û alîkarî ji hişyarbûna gel re çedîkirin, lê her ku çû me hêj pir bingeha wejeya kurdî û estetîka jiyana kurdan ji bîr dikir. Hêj jî hinek nizanîn, dibêjin: "Dev ji van dengbêjan berdin." Dema min xwest ku ez kasetêñ dengbêjan li welêt berhev bikim, ev peyy ketin guhê min.

Belê... Hêj jî keç û xorten me bi stranên nûjen dilxweş û kîfxweş dibin. Lê nizanîn ku bingeha van stranîn, stranên dengbejan in, lorikên dayikan in, dûrik û lawijên jinêñ kurd in.

Stranên dengbêjan bandor li ser jiyana gel jî çêkirine û rola wêjeyê lîstine. Çîrokên îroyîn jî, divê bandorê li ser jiyana gel çebikin, hêjahiyan vebêjin, tiştekî rayî gel bikin; gelê me di ci astengîyan re derbas bûye, di warê xelasîyê de ci kiriye, çawa derfet ji xwe re afirandiye? Jiyana gel çawa hatiye guhertin, jiyana berê çawa bû ya niha çawa ye? Jiyana jinan çawa bû niha

*Divê mirov rûmeta
berhemên dengbêjan
bigire. Ji bo ku mirov
hînî fikirandina kurdî
bibe, divê mirov pir li
dengbêjan guhdarî
bike. Lewre di stranên
dengbêjan de, gelek
biwêj, gotinêñ pêşîyan,
peyvîn cûr bi cûr ku ji
aliyê gel ve, berê
dibatin bikaranîn
bene û bevolkên hîmê
zimên têne bikaranîn.*

çawa ye? Ya xortan, têkiliya wan û qîzan berê çawa bû, niha çawa ye? Jin çiqasî tevlî jiyanê bûne, ci pêkutî li ser wan çêbûne? Ci bûyer li nava gel çêbûne? Van bûyeran ci anîne holê, ci sûda wan ji xe-bata xelasiyê re çêbûye? Di warê folklorê de gelê me çawa tevdigere? Ev tişt divê bi awayê rastîn bêne nivîsandin. Divê xeyalên gel jî bêne nivîsandin. Xeyalên wan ci ne? Dixwazin di jiyanekê çawa de bijîn? Ramanêwan ên di derbarê pêşerojê de ci ne? Ramanêwan ên ji bo demêñ borî ci ne? Ramanêwan û zanîna wan, ji bo gelên dinê ci ne? Jiyanâ zarokan di pêvajoya şer de çawa ye? Çawa bandorê li ser wan dike? Divê çîrok li ser her tiştî bêne nivîsandin.

Divê mirov bi çîrokan dest bavêje guhertina jiyanâ ci-vakê jî. Heta niha dagirkeran kesayeti-ye kurd a ecêb afi-randine. Bi ci awayî ev yek pêk anîne? Bê gûman ev yek bi çîrokê xwe, bi romanêwan xwe, bi zargotina xwe jî kesayetiya kurd guhertine.

Ramanêwan xwe bi vî awayî xistine serê kesen kurd. Divê em jî çîrokan ji bo jiyanâ gel bê guherandin û guhertineke şarîstanî û mirovhez binivîsin. Ji bo cîvakeke pêşketî, ji bo mirovîn kesayetiya xwe nas bike û ji bo jiyanekê bi rûmet derkeve holê jî, divê mirov çîrokan binivîsine û ev

tişt divê her tim di bîra çîrok-zanan de be. Dema ku nivîs-karê çîrokê, çîroka xwe xelas kir divê bifikire, ka ev çîroka min wê ci bandorê li ser jiyanâ gel û mirovîn kurd bike? Wê çawa bê famkirin? Dema mirov çîrok nivîsand divê mi-rov sûda gel bi bîra xwe bîne. Çîrokênu ku iro bi kurdî têne nivîsandin gelekî hêja ne. Ev çîrokan bi taybetî li ser guhe-rîn û tevgera mirovîn kurd ên iro ne. Carinan tu dinihêri şervanek, carinan tu dinehêri

xwe, divê çîrok bibe dîroka civakê û bibe belge ji pêse-rojê re. Ji ber vê yekê jî heke mirov bikaribe, divê ci bûyer li der û dora wî qewimîbin bi-nivîse. An bi awayê çîrokî an bi awayê romanî an jî bi awayê zargotinî. Heke mirov karibe bûyeran bi awayê lêkolînî binivîse baştir e. Lê mirov nikaribe, wê demê bi çîrok an jî bi roman û helbes-tan bîne zimên. Lê miheqeq divê bêne nivîsandin û divê tu tiştêkî nehatibe nivîsandin nemîne.

Tiştin û bûyerin he-ne ku, iro mirov dibêje ne girîng in. Lê di rojêñ pêş de, dibe ku bibin bingeha tiştinan û pir pêwist bibin. Ji ber vê yekê divê ci bû-yerên ku mirov pê hesiyabe binivîsîne. Li ku be bila bibe, kî zanibe, divê mirov li pey bigere û derxîne holê. Ev bûyer dê him di demêñ pêş de, jî dîrokzanan re bibin ronahî û him wê bibin hîmîn wêjeya kurd.

Wekî me di-serî de jî got çîrok divê li ser her tiştî bêne nivîsandin. Helbet divê tiştêni di rojeva gelê me de ne, hêj pir bêne nivîsandin. Lê cari-nan ku mirov dibêje ev bûyer ne hêjâyî nivîsandinê ye, di dêmén pêş de mirov fam dike ku gelekî girîng e. Bi ya min tiştêni di jiyanâ herî asayî de jî divê bêne nivîsandin. Gelek tiştêni balkêş hene û jiyanâ mirovan radixin ber çavan. Mîna jiyanâ zarokekî, ya şâ-



ye kî şehîd û malbata wî, cari-nan tu dinihêrejin an zarokekî di bin bandora şer de mayî derdikeye pêşberî me. Ev çîrok ji ber ku bi kurdî têne ni-vîsandin pir hêja ne. Ev yek nivîsandina kurdîku çiqasî bi pêşketiye, bi mirov dide fam-kirin. Dîsa ev çîrok wêneyêni jiyanâ kurdan ên demekê ne. Dibe ku wêneyê rojekê, me-hekê an salekê bin. Lê mihe-qeq bûyereke rojêñ me tê de xuyaye. Ev tiştêkî pir baş e. Ji

girtekî, şahiya jin an qîzekê, jiyanâ êzingvanekî, karekî karkeran û karekî ku di hundirê malê de tê kirin, carinan guherîna civakê tê de xuya dibe.

Heke îro em bibêjin, emên li ser şervanan an li ser şer binivîsin ev tiştekî xelet e û jiyanâ civakê guherîna cîvakê wedişêre. Ji xwe mirov li ser zarokekî jî binivîsine bandora şoreşê xuya dibe.

ÇIROK Ü FIKIRANDINA BI KURDÎ

Ji aliyekî din ve jî divê çîrok, roman û nivîs; mirovên

Di çirokên kurdî de, divê bi kurdî bê fikirandin. Ji bo ku nivîskar hînî fikirandina kurdî bibe, pêwist e ku pir li dengbêjan û çirokbêjan guhdarî bike, divê di nava gundiyan de rûnê û bi wan re bipeyive. Ji bo ci min got "gundî" ji ber ku fikirandina kurdî li gundên Kurdistanê hêj nemiriye. Bi taybetî jî mirovên me yên pir xweşik bi kurdî difikirin û dipeyivin. Helbet bandora fikirandina tirkî an jî erebî li ser wan jî çebûye, lê ne pir. Mirovên me yên bajarî, dema bi kurdî dipeyivin, mirov dibêje qey bi tirkî dipeyivin. Ji ber vê yekê divê mirov ji gundiyan sûdê bigire. Dibe ku peyvên wan ne li gorî rîzimana kurdî be peyv hattine guherindin, lê fikirandinek xweşik bi kar tînin.

kurd bide fikirandin û li jiyanâ wî bandorê çêbike, wî bi aliyê xebat û têkoşînê ve bikişîne. Bawer bikin hin mirov hene ku salekê jî, tiştin bi devkî jê re bê gotin dîsa nakeve serê wî û dîsa ya xwe difikire. Lê dema bi awayê çîrokî bixwîne, bandorekê li ser çêdike.

Ji xwe mirov bifikire, di dibistanan de çiqas pêwistiya xwendinê û nivîsandinê heye. Heke ne pêwist bûya ji xwe ne hewcebû ku mamosteyan û şagirtan ew giraniya pirtûk û defteran bikişandanâ. Wê demê nê hewcebû ku mirov jî hînî xwendin û nivîsandinê bibûna. Ji ber vê yekê divê nivîskarê çirokan mamostiyê jî ji mirovan re bike û mirovan fêrî tiştinan bike.

Dîsa ji bo ku gelek mirov bixwînin û jê fam bikin divê çîrok xwerû bêne nivîsandin. Divê mirov ji bîr neke ku çîrok ne têne ji alî nivîskar û rewşenbîran ve têne xwendin. Divê her tim di hişê mirov de be ku, yên nû hînî xwendina kurdî dibin jî dixwînin. Mînak, çîrokên di Rojnameya Azadiya Welat de têne weşandin ji alî 4 hezar mirov û hêj pirtirî ve têne xwendin. Di nava van 4-5 hezar mirovan de mirovên pisporê zimanê kurdî, rewşenbîren kurd, karker, karmend, gundi, jin, zarok û yên nû hînî xwendina kurdî dibin hene. Ez nabêjim bila mirov pir sivik û ji wêjeyê dûr binivîsine, lê xwerû binivîsine. Ji bo ku xwendevan ji xwendina kurdî zivê nebin û jê hez bikin, ji xwe re wateyekê jê derxin.

Di çirokên kurdî de, divê bi

kurdî bê fikirandin. Ji bo ku nivîskar hînî fikirandina kurdî bibe, pêwist e ku pir li dengbêjan û çirokbêjan guhdarî bike, divê di nava gundiyan de rûnê û bi wan re bipeyive. Ji bo ci min got "gundî" ji ber ku fikirandina kurdî li gundên Kurdistanê hêj nemiriye. Bi taybetî jî mirovên me yên pir xweşik bi kurdî difikirin û dipeyivin. Helbet bandora fikirandina tirkî an jî erebî li ser wan jî çebûye, lê ne pir. Mirovên me yên bajarî, dema bi kurdî dipeyivin, mirov dibêje qey bi tirkî dipeyivin. Ji ber vê yekê divê mirov ji gundiyan sûdê bigire. Dibe ku peyvên wan ne li gorî rîzimana kurdî be peyv hattine guherindin, lê fikirandinek xweşik bi kar tînin.

Serpêhatiyeke min a balkeş heye. Rojekê mirovekî kal li ba min rûniştibû û em dipeyivin. Peyvek ji devê wî derket, ew peyv li gorî rîzimana kurdî ne rast bû, min jî jê re got: "Apo ev eslê vê peyvê wiha-ye." Apê me keserek kişand û weha got: "Erê lawo, we rewşenbîran di serî de, zimanê me bi me, ji bîrkirin da û we henekê xwe bi peyivîna me dikirin, içar niha hûn rabûne dibêjin ev ne li gorî rîzimana kurdî ye." Bê guman sedema ji bîr kîrinê pişawtina dewletê ye. Lê rewşenbir û xwendevanên kurd heta 15 sal berê jî zimanê xwe fedî dikirin. Ev mijara hêj pir fireh e, em naxwazin di vê derê de bînin zimên.

ÇIROK Ü ZIMANÊ ARGO

Di çirokan de, divê mirov li

zimanê argo miqate be. Îro çawa mirov dibîne li gundan fikirandina kurdî heye, zimanê argo jî tê bikranîn. Zimanê kurdî demeke pir dirêj e ku bi nivîskî nehatiye bikaranîn ji ber wê yekê jî di zimanê peyva gundiyan de terbiye kêm e. Dema ku wan peyvîn argo bikartînin wekî tiştekî ji rêzê bi wan xuya ye. Çiroknîvîs divê terbiyeya ziman jî ji bûr neke û zimanê argo hêdî hêdî ji holê rake. Divê êdî zimanê peyvê jî bi terbiye, nerm û li gorî rêzmanê bê bikaranîn.

ÇIROKÊN LI WELÊT Û YÊN LI EWRÛPA TÊN NIVÎSANDIN

Çirokên li welêt têne nivîsandin, bi ya min hêj pir afrîner in. Yêن li metrepolan an jî li Ewrûpa têne nivîsandin hebekî xwêya wan kêm e. Ne giş lê gelek jê weha xuya ye. Dema nivîskarê li welêt diniyîsine, bûyer li dorî wî ye, ew kesen di çirokê de derbas dibin li ba wî ne û dikare baş wî bide naskirin. Serê xwe di pencerê re derxe wê gelek tiştan bibîne û ne hewcaye ku lêkolînê bike, her tişt li berçavan e. Ew şewat wî jî dişewitîne û ew jî bi xwe wan bûyerên li dorî wî çêdibin dijî. Bi wan ke-sên di çirokê de ne dikene bi wan re digirî û xemgîn dibe. Wekî ku ew bi xwe di çirokê de be. Lî çiroknîvîs kurd ên li Ewrûpa ne divê xeyalên wî pir fireh û kûr bin. Lêkolîna wî divê pir bi hêz be. Divê xwe têxe na-va bûyerê, divê xwe li welêt bibîne û wisa bifikire. Lewra ne wisa be bingeha çirokî

qels dimîne û bê xwe dimîne. Carinan tamsarı xuya dibe. Ji vê yekê jî xwendevan zivêr dibin û her weha ji zimanê kurdî jî sar dibin.

ÇIROKÊN BI ZIMANÊ DIN

Çiqasî pêwist be ku mirov çirokên dinyayê bixwîne û mirov tiştinan jê hîn bibe jî, dîsa divê mirov (çiroknîvîs) teqlîte neke. Çawa di hişê mirov re derbas bibe li gorî çanda xwe divê mirov binivîsine. Divê mirov afirîner be. Divê mirov ewqas afirîner be ku yên biyan taqlîta mirov bikin. An bandora çirokên kurdî li ser nivîskarêni biyanî çêbibe. Hér tim divê mirov li pey tişte nû be û çanda xwe bi awayekî nûjen, lê ji eslê xwe ne bi dûrketi bide naskirin. Ku mirov di bin bandora biyanan de bimîne û mirov teşeya wan bi kar bîne, wê demê ew çirok an nivîs bi gişî nabe ya mirov. Ne ku mirov hîç guh nede nivîskarêni biyan, divê mirov ramanên wekî din û teşeyen wekî din jî bibîne. Lî divê mirov li ser wan uslûban hînî afirîneriyê bibe û tiştîn xweştir binivîsine, ekolên nû derxînê holê. Lewra çanda me pir dewlemend e. Mirov wekî eslê wê binivîse û bineqîşne bes e. Taybetiya çanda me bixwe wê mirov bi pêş ve bibe û di nava wêjeya dinê de me serbilind bike. Lî belê ji bo çanda me, çirokên me, zargotina me, li dinyayê bê naskirin hewldan pêwist e, xebat pêwist e û nivîsandin pêwist e.

Wekî di sergotara pirtûka

Memê Alan de tê gotin: "Heke ev çirok (efsane) di destê Ewropiyan de bûya wê bi sedan cilt pirtûk binivîsanda." Lewra taybetiya çanda kurdan e, taybetiya jiyana kurdan e. Ji bo wê yekê jî, divê mirov taybetiya jiyana kurd her tim derxe pêş û binivîsine.

WERGERA ÇIROKAN Û FIKIRANDINA BI KURDÎ

Gelek çirokên nivîskarêni tirk hene ku li ser kurdan hatine nivîsandin. Ev çirok pir bi nav û deng in û li gelek deveran xelat stendine. Ev yek dide xuyakirin ku çanda kurdî çiqasî dewlemende, bi taybet û xwedî estetîkek cûda ye. Ji xwe hin ji van nivîskaran bi eslê xwe kurd in. Başî û nebaşıya wan li aliyekî, lê heke mirov bikaribe, ji wan çirokan ji bo jiyana gelê me süd werbigire, mirov wergerîne baş e. Dibe ku hinek bibêjin "ma em ji tirkî jî fem dîkin û dikarin bixwînin". Lî divê mirov ji bir neke ku kurd ne li tirkîyeyê tenê dijîn û kurdêni bi tirkî nizanîn bi milyonan in. Lî belê dema wergerandina çirokan çêbibe, divê li gor rêzmanê û fiki-

Çirokên li welêt têne nivîsandin, bi ya min hêj pir afrîner in. Yêن li metrepolan an jî li Ewrûpa têne nivîsandin hebekî xwêya wan kêm e. Ne giş lê gelek jê weha xuya ye.

randina kurdî be. Hinek çîrokên li ser gelê kurd, bi zimanê Ewropiyan jî dibe ku hatibin nivîsandin. Wê demê divê mirov pirtirîn li wergerê miqate be. Biwêjên zimanê cîran dibe ku nêzî zimanê kurdî bin û nivîskar di wergerê de, pir zehmetê nekişîne, lê zimanê dûrî kurdî divê mirov lê miqate be û li gorî fikirandina kurdî werge-rîne. Lewre biwêjin hene, di zimanê biyan de, bi wateyekê ye, lê dema werdigere kurdî wateyeke din distîne. Ew jî nivîsê an çîrokê diguhérîne û famkirineke şas çêdibe. Ev mînaka li jêr di Rojnameya **Welatê Me** de, hatibû weşandin. Ji ber ku balkêş e û fikirandina kurdî derdixe holê ez dixwazim li vir jî diyar bikim. Mînak wiha ye:

gerê. Mînakeke din: heke ji bo mirov vê biwêja tirkî: "Îş iştan geçti" wergerina kurdî û mirov bibêje "Kar ji kar derbas bû", ev nabe kurdî û tu wateyê jî nade famkirin çiqas nivîs bi kurdî ye jî dîsa bi tirkî xuya ye. Lê mirov ji dêleva wê bibêje "hasil di mûsilê re derbas bû." Wê demê heman wateyê derdixe û dibe fikirandina bi kurdî.

Divê miheqeq nivîskarê kurd hînî fikirandina kurdî bibin. Wekî me di serî de jî got, hêj gundiyan me yên pîr winda nebûne, hêj jî pire-jinê me bi kurdî difikirin û dûrik û zêmaran dibêjin, divê em vana bi lez û bez bidin hev û din, hêj ku neketine bin erdê.

Bavê min di dema xortani-ya xwe de wekî şanogeran li gundem ku dawet çêdibûn

DI ÇİROKAN DE ZIMAN Ü REXNE

Wekî me got divê zimanê çîrokên kurdî li gorî fikirandina kurdî be û li gorî rîzimanâ kurdî be. Ji aliye kî din jî divê bi zimanekî hêsan û xwerû bê nivîsandin. Em, niha nikarin ji sedî sed bi kurdî binivîsin, ji xwe kîmasya yekîtiya zimanê kurdî heye. Heke mirov bixwaze gelek mirov çîrokên me bixwîne û jê fam bike, divê devokên ku gelek kurd dizanin bi kar bîne. Divê mirov ji ber xwe devokan ne afirîne yên kîjan zaravayî pir têr bikaranîn, mirov wan bi kar bîne. Heke peyvek an navê tiştekî di kurdî de tune be, wê demê, navê wê yê navnetewî an yekî nû bi kar bîne. Di vê yekê de jî, divê nivîskar ji hev û din haydar bin. Heta, ji bo vê yekê divê lijneyek hebe. Divê em zanibin, heke em zimanê xwe rast nekin û li ser piyan nese-kinîn tu kes nayê zimanê me ji me re rast nake. Dost û xwedîyê zimanê xwe em in. Esil em in.

Ji bo çîrokan û nivîsên din, divê her tim rexne bêñ kirin. Heta divê hinek vê yekê ji xwe re bike pîse û çîrokan, nivîsên kurdî rexne bikin. Divê nivîskarê kurd jî, her tim rexneyan hilgire. Lewre rexne tune bin mirov riya rast nabîne. Di wêjeyê de, rexne pir pêwîst e, di zimanekî wekî yê kurdî ku nû li ser hîmê xwe rûdinê de hêj pirtir pêwist e.

Min ev nivîsar ne wekî pis-porekî, wekî xwendevane kî nivîsand. Heke sûda wê çêbibê baş e.

Bi Tirkî

Güneş doğdu	Roj za
Kadin çocu... doğurdu	Jinik za
Keçi doğurdu	Bizin za
Köpek doğurdu	Küçük za
İçime doğdu	Hundîrê min za

Peyv Bi Peyv Werger

	Tav derket
	Pîrekê zarok anî
	Bizin za
	Küçük teliqi
	Li min eyan bû

Bi Fikirandina kurdî

	Tav derket
	Pîrekê zarok anî
	Bizin za
	Küçük teliqi
	Li min eyan bû

Di vê derê de tenê "bizin za" wekî ya tirkî ye, peyvên din û biwêjên din dema bi kurdî têr wergerandin peyv û biwêjên cûda derdikevin pêşberî me.

Ji bo ku em çîrokan bi fikirandina kurdî binivîsin, divê em biwêjên kurdî bi kar bînin, gotinê kurdan bi kar bînin lewre ne wisa be di çîrok an jî nivîsê de fikirandina kurdî tunebe dibe wekî wer-

skeç çêdikirin û gundiyan gişan lê temâse dikir. Lê wan nizanîbûn ka şano çiye. Li aliye kî behsa "Tiyatro" dihat holê, tiştekî pir şerm didîtin. Lê wan bi xwe "Tiyatro çêdikirin". Yanê pirên me zargotinan dibêjin, çîrokan dibêjin kilam û dûrikan dibêjin, lê nizanin ev tiştan di wêjeya kurd de, çiqas girîng in. Heta nizanin wêjeye jî çîl ye. Ji ber vê yekê ev peywira nivîskaran e ku binivîsin û berhev bikin.

Di kurmancî de erk û fonksiyona “di” yê

ZANA FARQÎNÎ

Gava di helbest û stranen de ev /di/ derkeste pêsiya min, wê gelek bala min kişande ser xwe. Ji ber ku ew li herêma me di pratikê de nemaye, hîn bêhtir tatêla (meraqqa) min jê re çebû. Hêdî hêdî min hişê xwe da serê û min xwest ku ez hîn bibim ka fonksiyon, erk û vatiniyên wê ci ne. Di destpêkê em vê jî ronî bikin ku, /di/ya em jê behs dikan ne /di/ya pêşdaçek e. Ji bo zelaliya mijarê em nimûneyek bidin: Ez di mal de dixe-bitim.... Weki hate dîtin, ev /di/ digel paşdaçekên mîna /de/ û /re/yê tê bikaranîn. Lê ya ku em li serê disekinin ev e: Hevalên di min... Çawa di nimûneyê de hate dîtin, ev /di/ bi serê xwe ye.

Cara pêşin, di Hawarê de, ez li agahiyên li ser /di/yê vebûm. Xwediye Hawarê Celadet Bedirxan, di hejmarra 34'an de li ser /di/yê rawestiyabû, di bin navê "Bingehêne Gramêra Kurdmancî -8" de. Agahiyên wî wê gavê ez têr kiribûm. Ez dibêjim ku wan agahiyân ez têr kiribûm, çimkî pişt re ew daxuyanî qîma min nekirin.

Lêgerînen min, hay û zanebûna min a di der barê

/di/yê de firehtir kirin. Agahiyên nû ketin destê min. Li ser vê yekê me biryara xwe da ku em wê bikin mijara bendekê (meqaleyekê).

Pêşî, em gotinên ziman-zanê xwe yê hêja pêşkêş bikin, ku em wan ji Hawarê vediguhêzin. Em destê xwe nadîn ziman û vekîteya wî:

"Belê, vegetandekên me ên binavkirî ji pronavine me en işarkî bi der hatine. Herwekî pêşdetir dê bête gotin <<yê, ya, yê>> pronavine işarkî ne û vegetandekên me ên binavkirî ji wan hatine pê. Di esl û bingehî de gava ev pronav diketin pêsiya navderekê û dibûn navdérine işarkî <<di>> yek diket navbera wan û navdérê. Mesela gotina <<Hespê Soro>> di eslê xwe de <<Hespê di Soro>> [1] ye." 1

Di jêrenotê de (ku bi [1]yê daye xuyakirin), ev agahî di der barê heman mijarê de dane. Em wan jî veguhêzin vir:

"Ev şikil hetanî iro di hin cihêne Kurdistanê de peyda dibe. Lê bi tenê di gelejmariye de tête gotin. Yanî li şûna ku bibêjin <<hespên Soro>> <<hespê di soro>> dibêjin û gelejmariye hespan bi <<di>> yê didin zanîn." 2

Bi rastî di destpêkê de vê

ravekirinê ez îqna kiribûm. Min jî digot qey /di/, tenê di rewşa gelejmariye de tê bikaranîn. Lê, lêgerînen min kirin ku ez ji vê yekê re itîraz bikim. Her wiha daxuyanîniyên di pirtûka bi navê "Kürtçe Grameri" de, ku ji aliyê Celadet Bedirxan û Roger Lescot ve hatiye amadekirin û ji aliyê Weşanên Dozê ve di sala 1990'ı de hatiye weşandin (çapa duymîn), gotinên jorîn ên Celadet Bedirxan pûç dikan. Ji ber ku em dê pişt re jî, li ser wan daxuyaniyan rawestin, niha em bi van gotinan dimînin.

Tiştê ku ez dê di dawiyê de daxuyînim, ez dixwazim di destpêkê de bibêjim. Ev /di/, di her du rewşan de jî, ango hem du rewşa yekejmariye de (ji bo her du zayandan) û hem jî di ya gelejmariya herduyan de de tê bikaranîn. Lê belê, me divê ku em vê xalê jî vebêjim. Iro bi piranî di rewşa gelejmariye de derdi-keve pêsiya me.

Beriya ku ez têkevim babêtê, ez dê li ser pirtûka ku ji hêla Celadet Bedirxan û Roger Lescot ve hatiye amadekirin û ji aliyê Weşanên Dozê ve bi navê "Kürtçe Dilbilgisi" hatiye weşandin (çapa sêyemîn, 1997) rawestim: Ev berhem çawa ku li

yorê hate diyarkirin, di sala 1990'ı de bi navê "Kürtçe Grameri" hatibû weşandin. Tê de li ser awayên /di/yê yên gelejmar û yekejmariyê bi awayekî berfireh hatiye sekinandin.

Roger Lescot dide zanîn ku Celadet Bedirxan der barê /di/yê de gihiyaye van peyt û tespîtan. Ji bo /di/yê em nimûneyinan bidin:

Yê di wî
Ya di wî
Yên di wî 3

A pêşî ji bo zayenda nêr a yekejmariyê, ya duduyan ji bo zayenda mêt ya yekejmariyê û ya sisiyan jî, ji bo gelejmarya her du zayandan.

Sasıyên yên ku Celadet Bedirxan di Hawarê de, der barê /di/yê de kiribûn, di vê xebatê de hatine sererastkirin. Lê, bi ya min ev yek jî dîsa têr ronî nexistiye ser erk û fonksiyona /di/yê.

Piştî van daxuyaniyan min divê ku ez nimûneyan der barê /di/yê de, ji bo gelejmaryê pêşkêş bikim. Ev nimûne, bi taybetî der barê awayê bikaranîna gelejmaryê de ne. Pêşî ez dê nimûneyan bîdim û di pey de jî li ser şêweya bikaranîna /di/yê, di rewşa gelejmaryê de, bisekinim. Em vê jî daxuyînin, me dest neda ziman, vekîte û alfabeşa nimûneyan. Çawa hatine nivîsin me ew welê veguhastine vé derê. Serê pêşîn em ji Nûbara Biçûkan a Ehmedê Xanî dest bi dayîna nimûneyen xwe bikin:

Min ev nivîsi ne jî bo sahib rewarcan

Belkî ji bo biçükê di Kurmancan 4

Ji hevokê xweş xuya dibe ku "biçükê di Kurmancan" di rewşa gelejmariyê de ye û dengê /n/yê ketiye. Rastiya wê "biçükên di kurmancan" e.

Ev rewş jî, ji ber ku dengê /n/ û /d/yê têne ba hev diqewime. Ji ber ku bilêvkirina wan bi hev re hinnek zor e. Lewma jî /d/, /n/yê dixîne û pişt re jî /i/ya li dawiya dengê /d/yê dikeve. Ji bo ku bilêvkirin wisa hin bêhtir hêsan dibe. Her wiha, hin herêm îcar di şûna /d/yê de dengê /t/yê derdixin. Bi gotineke din di devoka wan de dengê /d/yê li yê /t/yê dageriyaye.

Îcar jî, ji berhemâ nemir, ji Mem û Zîna helbestvanê me yî neteweyî em mînakek bidin:

Ev neh sedefed-1 pir mirari

Durrêd-1 sefid, şefaf û tarî 5
Tiştek heye ku gerekî bê gotin, ez dibêjim qey ev awa bikaranîn tercîha M. Emin Bozarslan e, çimkî wî ev berhem li herfîn latînî û zimanê tirkî wergerandiye. Em dibêjin qey dê eslê wan bi awayê jêrîn be:

Ev neh sedefê di pir mirarı Durrê di sefid, şefaf û tarî 3

Dengê /n/yê, li vir jî nehatiye bikaranîn. Em qenc dizanin ku di zimanê devkî de ev awa bilêvkirin, ji ya bi dengê /n/yê siviktir e û ji lewre jî wisa hatiye nivisan din. Lê me divê kû em ligel vê yekê dîsa şêweya rast bi-

nivîsin: Ev neh sedefen di pir mirarı/ Durrê di sefid, şefaf û tarî

Me li jorê dabû zanîn ku ev li hin herêman cuda tê bikaranîn. Ev /di/, li nav kurdên Kafkasyayê wekî teşeya jêrîn e:

Bagerê wan bişo, hewayê wan xerabke

Ü cimaetê axirîyê pê komeyt direke

Tê dernaxin, wekî Napoléon jîye.

Na! Şiklê sêwirandinê nesazkirî

Êd xiyalêd efrandinêd mine hizkirî

Ez dixwazim têkime komeytê hevdu.... 6

Wekî tê dîtin, vegetandeka /ê/, bi dengê /d/yê re bûye yek û bûye /êd/. Dengê /n/ya li paşıya /ê/yê nehatiye bikaranîn û dengê /i/ya ku tê paşıya /d/yê jî ,ketiye.

Niha jî, em ji Behdînan nimûneyek bidin, îcar di cihê /êd/a kurdên Kafkasê de /êt/ derdikeve ber me.

"Vê dîtina beheştin an hêlinêt teyra, an dengê bilbilla, an xişexişa belkêt dara yên ko hewayê nazik diket. An ava tazî û sipî û zelal, an wan şikeftêt ko Xudê bi himeta xo diris kîrîn. An tîroşkêt rojê wextê beyana spêdê tê de derê serê çiyan û çelixtan..." 7

Tiştê ku bi qonaxa demê re ji bo /ed/ê çêbûye, ji bo /êt/ê jî derbas dibe. Tenê tiştekî cuda li vir ev'e ku, dengê /d/yê li vir li /t/yê dageriyaye. Jixwe der barê vê yekê de, ango der barê bi hev guherîna dengen /d/ û /t/yê, ge-

lek nimûne di zaravayê kurmancî de hene; mîna xirat û xirad ...

Di rastiya xwe de, ji bo yekejmariya binavkirî ya zayenda nêr veqetandeka /ê/, ji bo yekejmariya binavkirî ya zayenda mê veqetandeka /a/ û ji bo gelejmariya binavkirî ya her du zayendan jî veqetandeka /ên/ tênen pêsiya /di/yê. Nimûne:

Hevala di min

Hevalê di min

Hevalên di min

Me di destpêkê de dabû xuyakirin ku, /di/ ne tenê di rewşa gelejmariyê de, di ya yekejmariyê de jî tê bikaranîn. Niha jî, em ji bo vê, nimûneyên xwe yên ku me ew ji çanda me ya devkî û ya niviskî berhev kîrine, pêşkêş bikin.

Gulê bankir, eman Bego, de wer mebêje, ji dinê bavê mi ra pir xerab e, keşe rabû ji ber rahib e, heta ez li darê dinyayê sax bim, cotê memikê mi wê ji Miqsiyê lawê apê di mi ra be. 8

Ji min ra dagire heqibek ji perane,

Têxe kevirên cewher bi kulmane,

Bişidîne li terkiya kuriyê behrê,

Bozê di Rewane. 9

Muh'uba dilhe mino, Memê di Alane,

Bavê te qumandarê sed û h'eyştê bajarane,

Ezê ji kurê xora bînim qîzê mîran û h'ekimane,

Memê lao, yekê hatîye

serê te, hatîye serê me h'e Miyane,

Nee'let lê bîne, kû şeyt'a-ne. 10

... Dilber tu were ezê ramûsanek bixwazim çiftê ser memika,

Xala di gerdenê, ez iro li ba te me,

Tê sibê berhe xwe bidî we-lathe xerîba

Di ser te ra yar û dosta nagrim,

iro pê va li qîz û bûkê xelqê nakim merheba ye,

Tu silav e, emrê min, emrê min.... 11

... Go bira belkî agirhe gulê bikeve mala Nedâîm Begê,

Seet şesê di şevê bû

Ji ba xwe da derxistî ferma serê di kurda

Ji Taşxana Bazîda şewîfî dibijêre egîda, erfita û cindiyâ... 12

... Hecî Mûsa Begê Hesenî gotî:Tê ji bêriyê...

Ev e serê sê rojan e, sê şevan e, ezê çûme lolo lolo, bi deqîqa, bi sietan li pêsiyê

Ezê bêjim Gulo ji mi ra bi-de xeber, galgal û şitexaliya di rastiyê

Lê lê lê Gulo...

Heke ne ji mi ra bidî xeber, galgal û şitexaliya di rastiyê

Sê qirarê Xwedê li canê Hecî Mûsa Bego ketibe,

Ezê te bînim, bi qevda xencerâ zêrîn ser dinê di heqiyê.. 13

Ji bo peyitîna ku /di/ di rewşa yekejmariyê de jî tê bikaranîn ev çend nimûne

bes in: Ev yekejmariji bo her du zayandan e, angô hem ji bo yekejmariya mî û hem jî, ji bo yekejmariya nêr e.

Di mînakêñ jorê de xuya bû ku, ev /di/ di rewşa terkîbî de hem tê paşıya navdêrê û hem jî tê paşıya rengdêrê. Ligel vê yekê, me tiştekî din jî peyitand ku bi awayekî din jî ev /di/ dertê ber me. Jî bo vê yekê jî em /belgeyêñ pê selmîn pêşkêş bikin:

Enwaê mîlel xwedan kitêbin

Kurmanc-i tenê di bê hesêbin 14

Têkda ne di talîbin, ne metlûb

Vêkra nemihîbbin ew, ne mehbûb 15

Kurmanc-ine pir di bê kemaîlin

Emma di yetîm û bê macalîn 16

Fîlcimle ne cahil û nezanîn Belkî di sefil û bê xwedanîn 17

Gerçî di berhema nemir Mem û Zîna Ehmedê Xanî de gelek nimûne ji bo vê he-ne û me gelek not girtibûn jî, lê bi ya me çend mînak bes in. Ligel vê me gerek dît ku em nimûneyekê ji Zargotina Kurda ya birayêñ Celîlan bidin:

Bira zivirîn, hatibûne di male

Aqu-p'êxember go: "K'a Ûsibê minî delale?"

Go: "Bavo, em çûbhune di rîda,

Gur hatibûne di rêda,
Em revîn, hil bibûn,
Gura Ûsib girtibû xari-
bûn.” 18

Em pêdivî nabînim ku li
ser van nimûneyên zelal go-
tinan bibêjin, ji ber ku her-
tişt eşkere li ber çavan e.

Niha jî em dixwazin bêne
ser erk û fonksiyona /di/yê.
Di pirtûka “Kürtçe Dilbilgisi” de,
di derbarê wê de wi-
ha tê gotin:

“Di, fikra aîdiyet, rewş û
wekî wan dide.” 19

Em jî van gotinan li wan
zêde dikan û dibêjin; /di/ya
me eynî mîna /the/ya di zi-
manê îngilizî de erk û pey-

wira diyarkeriyê tîne cih.. Bi
gotineke din, /di/ artikil e.

Ev /di/ ya hanê di zaravayê
kirmanckî (dimilkî/ kirdkî/
zazakî) de jî heye. Lê, veko-
laneke kûr û baş ji vê yekê re
heye. Em pir bi awayekî
hêsan di vî zaravayê me de li
rastî teşeyê hevokeke wiha
tên: Hevalan di.mi, ew wiha
jî dikare bê gotin; hevalanê
mi. Ji bo ku ev rewş hîn pir-
tir ronî û zelal bibe em çend
mînakine din jî, ji zaravayê
kirmanckî bidin:

Wo bizêkê daye keno zere
(Wo bizêkê di aye keno ze-
re)

Wo bizêke dêyî keno zere

(Wo bizêkê di êyî keno ze-
re)

Sise dênan rê perojîye be-
na

(Sise di ïnan rê perojîye
bena) 20

Nimûneyên di nav kevan
(parantez) ê de aîdê me ne û
yên din jî yên xwediyê pirtû-
ka bi navê Razarê Dimilki,
Çeko ne. Ji ber ku ez bi xwe
li ser zaravayê kirmanckî ne
serdest im, min nikaribû ku
ez bi awayekî kûr û fireh li
ser mijara /di/ rawestiyama û
min hişê xwe bida serê. Em
vê bi taybetî, ji kesen ku li
ser vî zaravayê me serê xwe
diêşînin re dihêlin...

Çavkanî

1. Celadet Bedirxan, Hawar, hejmar 14, rûpel 16
2. Celadet bedirxan, heman berhem, rûpel 16
3. Emîr Celadet Bedir Xan & Roger Lescot, Kürtçe Dilbilgisi, rûpel 91 – 5 Doz Yayınları, Stenbol, 1997
4. Ehmedê xanî, Nûbara Biçûkan, rûpel 8, Fırat Yayınları (Zeynelabidîn Zinar ji herfîn erebî wergerandiye herfîn latîni)
5. Ehmedê Xanî, Mem û Zîn, rûpel 26, Hasat Yayınları (M. Emin Bozarslan hem herfîn erebî wergerandiyê yên latînî û hem jî, ji kurmancî wergerandiye tirkî) Stenbol, 1990
6. Férîk Egît Polatbegov, Antolojiya Edebiyatâ Kurdi, Cild 1, rûpel 182, Tûmzamanlar Yayıncılık ?, Stenbol, 199..?
7. Salih Reşîd Amedî, Ronahî, hejmar 15, rûpel 15
8. Strana Hecî Mûsa Begê Xêlî û Gulo, Roja Nû, hejmar 18, rûpel 4
9. Roger Lescot, Memê Alan, rûpel 32, Beyrûd, 1942
10. Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl, Zargotina Kurda, cîld 1, ji Memê Alan (şaxa 3), rûpe I 95, Moskova 1978
11. Şakiro, Kasetâ bi navê Helîmcانê, Mazlum Kasetçilik, strana bi navê Stenbol
12. Şakiroyê Mûşî, min bi xwe nexwest ku ez bi xwe nav li vê stranê bikim, ji lew re bênav ma. Ji hêla din ve em nikarin navê kasetâ wî jî diyar bikin. Ji me tevan re diyar û eşkere ye ku derfeta wî çenebüye ku bi awayekî fermî kasetan derxe.
13. M. Arifê Cîzrawî, Strana bi navê Hecî Mûsa Begî Hesenî û Guloka Fileh (Cîhê dax û mixabînê ye
ku em nikarin navê kasetâ wî bidin, aqûbeta wî jî, ji vî aliyî ve mîna yê Şakiroyê Mûşî ye)
14. Ehmedê Xanî, Mem û Zîn, rûpel 60, Hasat Yayınları Stenbol, 1990
15. Heman berhem, rûpel 62
16. Heman berhem, rûpel 62
17. Heman berhem, rûpel 62
18. Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl, Zargotina Kurda, cîld 1, ji Üsibê Nebiya, rûpe I 95, Moskova 1978
19. 3. Emîr Celadet Bedir Xan & Roger Lescot, Kürtçe Dilbilgisi, rûpel 233, Doz Yayınları, Stenbol, 1997
20. Çeko, Razarê Dimilki, rûpel 92

DI DÎROKNIVÎSIYA KURDAN DE DU BAWERÎ

CEMİL GÜNDÖĞAN

Ji tirkî: Hasan KAYA

Ez dê pêşî, li ser du taybetiyan rawestim. Ya yekemîn, li ser navgînên ku di daxuya-niya min de cih digrin e. Naygînên ku di nirxandinê de cih girtine, bi mercen ku girêdayî dîroka kurdan bin, bingeh hatine stendin. Lewra, li ber çavan nehatiye girtin ku ev navgîn rengdêriya hebata dîrokê heq dîkin an nakin.

Ez dizanim ku di mercen normal de, helwesteke weha dê hebata zanyariyê qels bike. Lî, ji ber xweseriya mîjara ku me hildaye desten xwe, pêwistî pê heye ku em hinekî bi tolerans bin.

Sedema vê ya yekane, ji ber ku xebatênu ku di derbarê dîroka kurdan a nêzîk û dûr de hatine nivîsin bi awayekî hêsan nikare bête gotin kîjan ji wan zanistî ye. Hilbijartina bi vî awayî, hilbijartineke subjektif e. Weke din van her du veje-nan bandor li ser encamê çekirine:

1) Heta demeke nêzîk, xebateke dîroka kurdan a ku bi destê akademîsyenan

an jî dîrokzanan hatibe kîrin tune bû, ku hebe jî pir hindik e. Lewma di bikaranîna navgînan de, xwestina krîteren profesyonelî, dê gelek navgînên di derbarê dîroka kurdî de ji holê rake. Nayê wê wateyê ku xebatênu akademîsyen û dîrokzanan herdem li gorî metoda zanistiyê ne.

2) Hilbijartineke bi vê a-veyî, dê mîldariyekê ya ku yet ji ya nivîsina dîroka kurdî ya klasik e, dê pêşîn ji holê rake. Tiştekî weha li gorî min ne gengaz e.

Di çarçoveya daxuyaniya min de, taybetiya duyemîn a ku li ber çavan were girtin, nirxandinê ku tene kîrin bi sînor in. Bi tenê kurdênu ku li aliyê tirkî tene nirxandin. Xebatênu dîrokî yên Kurdênu Başûr, rojhilat û yên Sovyetîstanê li derveyê vê daxuyaniyê hatine girtin.

Di çarçoveya

*daxuyaniya min de,
taybetiya duyemîn a
ku li ber çavan were
girtin, nirxandinê ku
tene kîrin bi sînor in.
Bi tenê kurdênu ku li
aliyê tirkî tene
nirxandin. Xebatênu
dîrokî yên Kurdênu
Başûr, rojhilat û yên
Sovyetîstanê li derveyê
vê daxuyaniyê hatine
girtin.*

DU MÊLDARIYÊN DÎROKNIVÎSIYÊ

Dema ku bi awayekî bal-dar li pirtükên peyasê yên ku di derbarê dîroka kurdan de hatine nivîsin binêre, mirov dê bibîne ku xwediyêvan pirtûkan, ji gelek aliyen ve hevbes in û gelek taybetiyen wan ên li paş jî hene. Heke em, hevbesiyen wan kifş bikin û bi awayekî hilbijerîn, wê demê dîmenekî zelal yê dîrokzaniya kurd û rewşa dîrokzaniyê dê were ber çavan. Ev dîmen dê derfeta derxistina holê ya pirsgirêken bingehîn ên dîrokzanan û yên dîrokzaniyê bide mirov. Xebateke bi vî rengî wê nî-

qaşen ku berî demekê, di derbarê dîroknivîsîna kurdî de çêbûn û di çêcoveya problemîkê de bûn, ji holê rake. Xebata weha, dê xebata dîrokê li ser bingehekî bi rêk û pêk rûnîne.

Dema ku bi vê awayê û bi gelempêrî bête nêrîn, di dîroknivîsîna kurdan de, du mîldarî derdi Kevin pêşberî mirov. Di gelek xalan de, ev her du mîldarî, ji hev vediqe-


1992 yan de, li gorî metodên wan, ew bi nav kiri-bûn. Min ew mîldar li gorî, dîroknivîsîna reaksiyoner û nereaksiyoner ji hev veqetand.

Heta ku yeke baştîrin bête dîtin, ez dê vê ravekirinê bikar bînîm. Lewra weke ku min di wê nivîsara ku qala wê

bi hev re bête têkildarkirin.

DÎROKNIVÎSÎNA REAKSIYONER

Metoda ku ev mîldarî bikartîne, "metoda ravekirina neyîni" ye. Bingehê ve metodê, li ser gotinê berevajiyê dîroka devleta serdest e. Ew ci bêjin dîrokzanê reaksiyoner dijê wan dibê. Weke mînak, em bêjin heke dîroknivîsîna tirkî ya ser-



tin. Dema ku mirov navan li wan bike, ji gelek hêlan ve dikare werin ravekirin. Belê cûdahiya wan a ber çav, ferqâ metodên wan ên ku dixebeitînin e. Ji ber vê yekê, min di xebata xwe ya

dikim de, gotibû, ev binavkirin, ne têne dîroknivîsîna kurdî, li gorî mîldariya rave dike, heman wext dîroknivîsîna kurdî û tevgera netewî ya kurd hesanî dikare

dest, gotibe ji Sumeriyan heta îro, qewmîn ku li Endolê jiyîne, hemû tirk in, dîroknivîsî kurd e xwedîyê metoda ravekirina neyîni jî, van qewman an kurd an jî lêzimên kurdan dipejirîne. Heke dîroknivîsarê tirk ê serdest, bêje felan raperîn bi têkildariya emperyalîzmê hatiye li dar xistin, dîroknivîsariya reak-

siyoner a kurd dibêje, na ev raperîn pêşverû ye û tu têkiliya wê bi emperya-lîzmê re tune ye. Vê teza xwe jî, bi ramana ku tekîldarê mezin ê ku raperîn pelçiqandiye, ango dewleta tîrk dide qewî kirin. Em di-karin mînakan zêdetir bikin. Heke mirov bala xwe bidê, tiştê ku rê dide vê cu-reyê dîroknivîsiyê, ne kirûne, dîroknivîsariya fermî ya ku ew li hemberê wê ye.

Bi şeweyeke din, dîrok-nivîsiya ravekirina ne-yînî, hêj ji binê bandora dîroknivîsiya fermî rizgar nebûye. Referansên xwe yên ram-yarı, hêj jî, ji dîrokni-vîsiya fermî digre. Bi tenê diqîre û dibêje: "Ev derew in." Lê hêj nikare ya rastin têxe şûna ya derewîn. Nikare ya rast bîne zimên. Di vê babetê de, ramanên wî yên xweser tune ne. Tiştê ku ew dibêje, dîroka fermî ya ku hatiye berevajîkirin e.

Ev peywendî zor gîring e. Lewra ev yek wê destûrê bide ku em taybetiyêن vê mîldariyê têbigihijin. Em bir kurtasî rêz bikin:

Referansên xweser ên dîroknivîsiya reaksiyoner tune ne, hebin jî hindik in. Ew, xalêñ refaransê yên dîroknivîsiya serdest (fermî) bingeh digre. Ravekirin û teoriya xwe li ser van xalêñ referansê ava dike.

Weke ku ji vê tê fêmkirin, her çiqas dîroknivîsiya reaksiyoner, ji rastiya kirde-bûna kurdan derdikeve holê jî, ew bîr nabe ku kurd kirde ne. Weke mînaka cîhan û heyvî, li dora dîroknivîsiya kurdî dizîvire. Bi şeweyeke din, dîroknivîsiya ravekirina neyînî, hêj ji binê bandora dîroknivîsiya fermî rizgar nebûye. Referansên xwe yên ram-yarı, hêj jî, ji dîrokni-vîsiya fermî digre. Bi tenê diqîre û dibêje: "Ev derew in." Lê hêj nikare ya rastin têxe şûna ya derewîn. Nikare ya rast bîne zimên. Di vê babetê de, ramanên wî yên xweser tune ne. Tiştê ku ew dibêje, dîroka fermî ya ku hatiye berevajîkirin e.

Weke ku ji van yekan tête fêmkirin, dîroknivîsiya reaksiyoner pir zêde hatiye politize kirin. Mirov dikare bibêje ku ew kopyaya dîroka fermî ye. Her weke dema ku mirov li nivîsarekê ku lî gorî vê baweriyê hatiye nivîsin dinêre, naye za-

nîn ku çiqas jê dîrok e û ci-qas jê gotareke politîk e. Ji xwe, bi serê xwe nivîsina dîrokê ne warek e. Li gorî pêdiviya ramyari û pêşve-çûna siyasetê, ber bi dîrokê ve tê çuyin. Nivîsina dîrokê, di encama pêvajoyeke weha de pêk hatiye.

Nivîsarêñ dîrokê yên ku li gorî metoda ravekirina neyînî hatine nivîsin, bi gelemerî, bi destê nivskarêñ ku pîseyê wan ne dîrokza-niye hatine nivîsin. Gelek ji wan siyasetvan in. Ev jî rastiyeke din e.

Her du xisusiyetêñ dawîn, ne ji bo karê ku tê kirin, bi-çûk bîbinim, dibêjim. Çunki ev rewş li her derê weha ye. Netewêñ ku dîroka wan bi destê biyaniyan hatiye nivîsin, pêvajoyeke ku nivîsina dîrokê weke mecburiyetê ye dibuhurînin. Yanê em û rewşeke navneteweyî rû bi rû ne.

Ev rastî, dewra ku dîrok-nivîsina reaksiyoner a kurdî lê jiyan dîtiye jî bi me dide zanîn. Dîroknivîsina reaksiyoner, di dewreke ku miroyen pispor ên ku li ser dîrokê dixebeitin hêj tunebun de derkete holê. Wê demê rewşenbîrêñ kurdan pêşkeşî ji muhalefeta kurdan re dikîr. Ev rewşenbîr bêhtirîn siyasetvan bûn. Yên ku li ser dîroka kurdan dixebeitin bi piranî pêşkeşvanêñ rêexistinêñ kurdan ên illegal bûn. Ev yek rastiya dîrok-nivîsina reaksiyoner zelal-

tir dike. Ji aliyê vê taybetiya xwe ve, dîroknivîsîna raverker a neyînî, di dema zarakatiya tevgera kurd de, dérketiye holê.

Taybetiyeke herî girîng a dîroknivîsîna weha, romantikbûna wê ye. Ev jî qarektereke navneteweyî ya dîroknivîsîna reaksiyoner û neteweparêz e. Li vir, romantizm, dema-ku xwe bi

Ev "xwesbêjên Medi" dîroknivîsîna reaksiyoner dikemîlîne û weke ku di nav bênderekê de bêne kutandin, xweşik û delal dibine mînak.

Li vê deverê, feraseta dîroknivîsîna ravekar a neyînî derdikeve holê. Dîroknivîsîna bi vê awayê, ji metoda berî dema xwe pêşketîtir e. Lê ne xwediyê çarçoveyeke

vê awayê, mirov pêsiyê neteweya.ku niha dê were sazkirin, ji nav dewra antîk derxe. Dewra reş hêzê ji serdema kevnare ango, ji heyama spî digre û dixwaze bilind bike. her çiqas xwe bilind dike, ewqasî dema beriya xwe nimz dike.

Dema ku dîroknivîsîna Misrê ya neteweparêz, beriya netewebûnê û dema Os-

Mirov dikare beşê vê pradigmaya ku leqayê dîroknivîsinê tê weba rave bike. Dema ku dîrok were nivîsin, heyama dîrokî ku bertya netewibûnê tê zêde tarî bike û heyama antîk a ku beriya tariyê ye pir zêde ronî û spî bide xuyakirin. Bi vê awayê, mirov pêsiyê neteweya ku niha dê were sazkirin, ji nav dewra antîk derxe. Dewra reş hêzê ji serdema kevnare ango, ji heyama spî digre û dixwaze bilind bike. her çiqas xwe bilind dike, ewqasî dema beriya xwe nimz dike. Dema ku dîroknivîsîna Misrê ya netewparêz, beriya netewebûnê û dema Osmaniyan û hinekî jî dema beriya îslamiyetê dinirxîne, weke rûpelekî reş dide nîşandan.

awayekî navneteweyî saz dike, du qeraseyan bi kar tîne:

1) Qelskirina di navbera Destan û Dîrokî de.

2) Afirandina serdemeke zêrin a ku di demeke pir kevn de çêbûye û ji bo parâdigma neteweyî ya îroyîn re bûye bingeh.

Di dîroknivîsîna kurdî ya reaksiyoner de, "Xwesbêjên Medi", Keyakserê ku di esaneyê de Împareretoriya Asuriyan hildiweşîne weke serdema zêrin tê taswîrkin.

dorfereh e. Ji xwe, heyama zarakotiya tevgerê radighîne, lewma je nayê xwestin ku xwediyê naverokeke dorfereh be. Çarçovaya wê ya ku heye, ji pradigmaya dewleta neteweyî ya ku li gorî şecerê ye pêk tê.

Mirov dikare beşê vê pradigmaya ku leqayê dîroknivîsinê tê weba rave bike. Dema ku dîrok were nivîsin, heyama dîrokî ku beriya netewibûnê tê zêde tarî bike û heyama antîk a ku beriya tariyê ye pir zêde ronî û spî bide xuyakirin. Bi

manîyan û hinekî jî dema beriya îslamiyetê dinirxîne, weke rûpelekî reş dide nîşandan. Pêşengên sazibûna netewebûnê yên serdema nûjen, ji Misra dema Fîrawûnan hatine hilbijartîn. İraqî jî dîroka xwe ya dewra îslamiyetê pir tarî didine xuyakirin.

Pêşengên pradigmaya netewî ya modern, li ser bingehê, Babîl, Akad, Aram û Asuriyan tê avakirin. Fars, dewra piştî ku artêşen îslamiyetê welatê Persan dagerkîn reş dîkin. Pradigm-

maya netewî ye modern, dewra berî vê yekê didine nîşan. Dîroknivîsına dema şah, li ser vê bingehê hatiye avakirin. Dîroknivîsına tîrkan a fermî, dewra Osmaniyan reş dide nîşan û pêşengiya dîrokî ya pradîg-maya netewî li nav Etî û Sumeriyan tê gerin.

Ev mînak hemû, heman prensîba navnetewî ya ku li welatên cihê hatiye bikaranîn e. Heman model, di dîroknivîsına me ya ravekar a neyînî de jî xwe dide der. Bi gelempêrî, dîroka kurdî ya dewra İslâmîyetê, bi taybetî jî ya dewra Osmaniyan tê bin pê kirin. Dewra Medan jî tê pesindayîn. Pêşengiya sazbûna netewî ya îroyîn, li wê derê tê gerîn. Em weşanxaneyekê saz dikin, navê "Roja Medya" lêdikin, televîzyonekê ava dikin, navê "Med-Tv" lê dikin. Ev helwest, ji nêrîna dîroknivîsına ku qala wê tê kirin, derdikeve holê û xwe li ser jiyana me ya civakî û siyasî dide der. Biwêja ku pir rojane ye; "gelê ku hatiye êexistin" ji vê mantalîteyê tê.

Taybetiyeke dîroknivîsına reaksiyener a din, ev e: Dema ku dîroka kurdan a kevn û ya nêzîk tê nirxandin, bi awayekî rexneyî li çavkaniyên kurdan nayê nêrîn. Lewma jî hemû tiştên ku li ser xaka ku iro kurd lê dijin hatine afirandin weke malê kurdan tê nîşandayîn. Dîro-

ka nêzîk jî weke bîranînê çend welatparêzan ên ku piştî bûyerê nivîsîne tê dî-

tin. Nayê dîtin ku xwediyêvan bîranînan, xwediyêmantalîteya vê dîroknivîsına eletewş in. Dîroknivîsına reaksiyoner bîra tewsbûnê nabe.

Nûnerên vê metodê İhsan Nurî Paşa, Cemşîd Bender û Ethem Xemgîn û hwd. in. Weke mînak ev dikarin bêne nîşandan.

DÎROKNIVÎSINA NEREAKSIYONER

*Diji dîroknivîsına
reaksiyoner,
dîroknivîsına
nereaksiyoner, di
demek weba ku
tevgera kurd, girseyî
bûbû bawerî bi xwe
anîbû û pêşve çûbû
derkete holê. Çunkî,
incex di vê demê de
gengaz e ku,
dîroknivîsin ji pey
dûvî siyasetê veqete.
Dîsa, di vê demê de,
kesatiya kesen ku
dîrokê dînîvîsin ji,
cibêreng bûye.
Bandora kadroyen
politîk a li ser
dîroknivîsinê, kêm
bûye. Dîrokzanen
pişkar û lêkolînvanen
profesyonel di vê demê
de, gîbiştine. Di vê
demê de, nîqaşa di
derbarê metoda
dîroknivîsinê de zêde
bûye. Edî baweriya
nasnameya netewî
xurt buye. Lewma,
nasnameya netewî û
netew, bi awayekî
bêsan kariye bête
ravekirin. Teorî jî xurt
bûye.*

Taybetiyeke vê dîroknivîsinê ya ber bi çav, ew e ku dîroknivîsına serdest ji xwe re weke navendê nagire.. Ev ekol, ji çarçoveya referansa dîroknivîsına serdest derketiye. Metoda, teqlîd û berevajîkirinê li paş xwe hiştiye. Refaransên çîroka xwe, ji kirûyên dîroka kurdan digre. Lê nanêre, ka li gorî dîroka fermî ye an na. Li gorî vê metodê, tişta gi-ring ew e li gorî rastiya dîrokê û civakê be. Lê ji ber ku dîroknivîsına reaksiyoner bi hênceta têkiliyê mêtîngerî, dîroknivîsinê bi awayekî îdeolojîk dinirxîne û dîroknivîsinê beradayî dike. Bi kurtasî, di vegotina dîroknivîsına reaksiyoner de, li gorî mantalîteya yê ku vedibêje kurd kirde ne.

Dijî dîroknivîsına reaksiyoner, dîroknivîsına nereaksiyoner, di demek weba ku tevgera kurd, girseyî bûbû bawerî bi xwe anîbû û pêşve çûbû derkete holê. Çunkî, incex di vê demê de

gengaz e ku, dîroknivîsin ji pey dûvê siyasetê veqete. Dîsa, di vê demê de, kesatiya kesên ku dîrokê dînivîsin jî, cihêreg bûye. Bandora kadroyên politîk a li ser dîroknivîsinê, kêm bûye. Dîrokzanêن pîşekar û lîkîlîvanêن profesyonel di vê deme de, gihîstine. Di vê demê de, nîqaşa di derbarê metoda dîroknivîsinê de zêde bûye. Îdî baweriya nasnameya netewî xurt buye. Lewma, nasnameya netewî û netew, bi awayekî hêsan kariye bête ravekirin. Teorî jî xurt bûye.

Bi kurtasî, dîroknivîsina nereaksiyoner, ne ku antîteza dîroka fermî ye, sentezke nûjen e.

Mînakêن vê cureya dîroknivîsinê, pir kem in. Berî ner tiştê, rabirdûya vê metodê ne dûvdirêj e. Lewma jî yên ku bi awayekî rêk û pêk jî vê metodê re nûneviyê bikin, hêj derneketine holê.

TÊKILIYÊN DI NAVBERA HER DU MËLDARAN DE

Ev her du mëldarî bi dîwarê çinê ji hew ne veqtandine. Berevajiyê wê, bi awayekî dîyalektîk, bandorê li hev û din dikin. Ji bo ku vê yekê zelatir bikim, dikarim du mînakân li jêr bêjim:

Ya yekemîn ji Gûrdal Aksoy da. Aksoy, di berhemâ xwe ya bi navê "Noten li

ser Xwedayê Bav" de, ji Cemşîd Benderê ku nûnerê metoda yekemîn e û her tiştê dixe kurd bêtir, hindik maye ku Xwedê bi xwe jî, kurd bipejirîne. Di pirtûka xwe ya binavê "Kurdêñ ku dîroka wan nehatiye nivîsin" de ev çewtiya xwe dîtiye, xwe rexne kiriye û çewti rast kiriye.

Mînaka duyemîn a İsmail Beşikçi ye. Li gorî vebijartina vê daxuyaniyê, Beşikçi di nav dîroknivîsarê reaksiyoner de cih digre. Lê di nîvisarêñ wî yên kevn de, şopâ dîroknivîsina modern jî cih digre.

Bê şik, yek ji sedemê ketina nav hev û din, a vê mijarê ne niqaşkirina teorîk a vê meselê ye. Pêwistiya bi metoda dîroknivîsinê salêñ dawîn bêtir xwe da xuyakirin. Pê re weşanêñ kurdî jî zêde bûn. Polêmika ku di navbera Cemşîd Bender û Gûrdal Aksoy de ji pirtûkan re bû mijar, pêşî Gûrdal Aksoy, bi pirtûka xwe ya bi navê "gelê ku dîroka wan nehatiye nivîsin, rexne li dîroknivîsîn reaksiyoner girt. Cemşîd bi berhemâ xwe ya bi navê, "Korku ve Cesaret Kürt Tarihine Sataşanlar" bersiva Gûrdal Aksoy da. Belê, bêhna polmîkê ji her du berheman jî dihat. Zirekbûna xwa ya derbarê tezêñ zanistî bi kar neanîbûn.

Wekî din dîroknivîsina reaksiyoner û ya ne reaksi-

yoner reng û neqşan ji hev digrin. Lê weha dixuye ku ya duyemîn ji ya yekemîn bêtir bi pêş ve diçe.

Ev tesbît, bi tenê ji bo cîhana entelektuel a kurd dikare bête gotin. Lê bi gişî û bi aweyekî populer ev tesbît nayê pejirandin.

Bê şik, yek ji sedemê ketina nav hev û din, a vê mijarê ne niqaşkirina teorîk a vê meselê ye. Pêwistiya bi metoda dîroknivîsinê salêñ dawîn bêtir xwe da xuyakirin. Pê re weşanêñ kurdî jî zêde bûn.

Polêmika ku di navbera Cemşîd Bender û Gûrdal Aksoy de ji pirtûkan re bû mijar, pêşî Gûrdal Aksoy, bi pirtûka xwe ya bi navê "gelê ku dîroka wan nehatiye nivîsin, rexne li dîroknivîsîn reaksiyoner girt. Cemşîd bi berhemâ xwe ya bi navê, "Korku ve Cesaret Kürt Tarihine Sataşanlar" bersiva Gûrdal Aksoy da. Belê, bêhna polmîkê ji her du berheman jî dihat. Zirekbûna xwa ya derbarê tezêñ zanistî bi kar neanîbûn.

Lêbûrbûneke biçük li ser devoka Semsûrê

SAMÎ BERBANG

Jî mêt ve me dil hebû, li ser devoka derdora Semsûr û Meletî ye, gotarekê bini-vîsin, lê ji ber ku têrî pêdiviyê materyal bi dest nediketin, me ev kar taloq dikir. Niha tevî ku têrî daxwazê materyal tune ye jî, hinek stranên gelêri me berhev kirin. Di van stranan de ji aliyê rîzimanî û rastnivîsê ve xalêng girîng balê dikişînin. Me divê li ser van xâlan lêhûrbûneke kurt bikin. Her çiqas devoka ku em qalê dikan li herêmeke berfirêh belavbûyî be jî materyalê di destê me de rî nade ku em lêkolîneke berfirêh bikin. Ji bo vê yekê bar zêdetir dikeve ser mirovên ku li vê herêmê dijîn. Divê ew stran, gotinê

de hinek sînor xêz kirine, em ji hev dûr xistîne, bi vê yekê re di nava zimanê de me zara va û devok pêk hatine. Niha bi geşbûna tevgera azadîxwaz re, ev dubendî û cudasî ji navê radibin, lê ji bo pêkhatinâ zimanekî hevgirtî hinekî dem û dezgeh divê. Niha neyar dubendî û cudatiyê di nava civaka kurd de ji bo berjewendiyê xwe bi kar tîne. Heta jê tê dixwaze destê me ji hev qut bike, me ji hev dûr bixe. Divê em li hemberî vê yekê gelekî hişyar bikin.

Hin caran mirov dibîne kesekî ji Semsûr, Riha û Meletiyê li saziyeke neteweyî bi tirkî dipeyive, dema mirov jê dixwaze ku bi kurdî bipeyive, dibêje: "Heval kurmanciya me degişig e." Li aliyê din hinekên din jî kurdêñ li van herêma biçük dibînin, heta wan wekî "kurdêñ xas" nahesibînin. Ev bawerî çewt e û bi tenê dagirkeran kêfxweş dike, hemû devokên kurmancî ji hev cuda ne, her wiha di nava zaravayê kirdkî de jî gelek devok bene, lê divê ew cudadî nebe ji hev dûrketina me.

Hin caran mirov dibîne kesekî ji Semsûr, Riba û Meletiyê li saziyeke neteweyî bi tirkî dipeyive, dema mirov jê dixwaze ku bi kurdî bipeyive, dibêje: "Heval kurmanciya me degişig e."

Li aliyê din hinekên din jî kurdêñ li van herêma biçük dibînin, heta wan wekî "kurdêñ xas" nahesibînin. Ev bawerî çewt e û bi tenê dagirkeran kêfxweş dike, hemû devokên kurmancî ji hev cuda ne, her wiha di nava zaravayê kirdkî de jî gelek devok bene, lê divê ew cudadî nebe ji hev dûrketina me.

pêşîyan, metelokên derdora xwe berhev bikin û ji saziyeke neteweyî bi tirkî dipeyive, dema mirov jê dixwaze ku bi kurdî bipeyive, dibêje: "Heval kurmanciya me degişig e."

Berî ku em dest bi mijara xwe bikin, me divê em li ser bawerî çewt a ku li nav mirovên kurd belay bûye, rawestin. Kurd netewyeke bindest e, hêzên dagirker sînor di nava welatê me de kîsandine, dest me ji hev qut kiriye. Bi vê yekê jî nemaye, di serê me

"kurdêñ xas" nahesibînin. Ev bawerî çewt e û bi tenê dagirkeran kêfxweş dike, hemû devokên kurmancî ji hev cuda ne, her wiha di nava zaravayê kirdkî de jî gelek devok bene, lê divê ew cudadî nebe ji hev dûrketina me. Her çiqas kurmanciya herêma Semsûr û Meletiyê hinekî asîmîle bûbe û hinek xelitiyê rîzimanî di nava xwe de bihewîne jî, di gelek waran de ji devokên din ne lawaztir e.

Niha vegeerin ser mijara xwe, devoka vê herêmê her wekî hûnê ji stranên li xwarê jî fêhm bikin, xwediyê hinek cudatî û xweserîyan e.

Cudatiya herî berbiçav, di vê devokê de ev ku daçeka /ji/ tuneye. di cihê /ji/ de jî, daçeka /li/ tê bikaranîn. Bo nimûne di strana Zeynewê de li cihê ku bibêje avê ji kaniya me nebe, "Avê li kaniya me mewe" hatiye gotin. Dîsa di cihê Xwedê ji çavan kor bike de, "Xadê li çavan kûr bike" hatiye gotin. Her wiha di strana bi navê "Çavzêrê" de "loxê li kevirî mermer e" mirov dikare wekî mînaka heman mijarê pêşkêş bike. Dîsa di strana "Bêmalê" de di cihê ji xwe re, li "li xa ra" hatiye gotin. Lê divê bê gotin ku di bin peyvan de vê daçekê hebûna xwe parastiye. Nimûneyek ji vê yekê re peyva "jêkirin" e. Hinek peyvîn hevedudanî wekî "serjêkirin" jî hebûna xwe parastine. Dîsa di peyveke din de jî bi awayekî veşarî vê daçekê hebûna xwe parastiye. Bo nimûneya vê jî peyva "hayjêbûn" li nava gelê herêmê dibêjin "te hacê nîn e." Xuya ye ku li vê derê dengê /j/ bi dengê /c/yê guheriye.

Tiştîkî din ku wekî taybetiya vê devokê balê dikişîne, guherîna ku di serê /b/yê de hatiye ye. Her wekî ji mînakêñ xwarê jî diyar e, piraniya /b/yêñ di devokêñ din de bûne /w/.

Bo nimûne:

- Biwîne (bibîne)
- Biwê (bibê)
- Zeynew (Zeyneb)
- Erew (ereb)
- Mewe (nebe)
- Qewiqew (qebeqeb)
- Wîne (bîne)
- Rawiye (rabûye)

Tiştîkî din ku di vê devokê de ji devokêñ din cihêrengtir xuya dike, bikaranîna veqtandeka binavkirî ya navdêrên nêr e. Di vê devokê de /-ê/ hin caran dibe /-î/

Bo nimûne

- Dilî min (dilê min)
- Darâ tuyê (darê tuyê)

berî xa (berê xwe)

bavî te (bavê te)

Sêni me (şeniyê me)

Kewî Evdilezizê (kewê Evdilezîzê)

Çend mînakêñ vê yekê ne.

Her wiha guherîneke din jî di warê pevdenga /xw/ de balê dikişîne. Ev pevdeng di vê devokê de nîn e.

Peyva xwe wekî "xa" tê bilêvkirin. Peyvîn "weki", "xwedî", "xwes", bûne "xadî" û "xaş".

Taybetiyeke devoka navborî jî bikaranîna cînavkê xwe ye. Her wekî li jor me daxuya-kirin, "xwe" bûye "xa", digel vê yekê ev cînavk di cihê cînavkê "wî/wê" de tê bikaranîn.

Bo nimûne:

Digo te nedîye pêşî şîrîn e, paşıya **xa (wî karî)** tim û timî tal e

Dîsa di şûna cînavkê işarkî "ev" de, "va" tê bikaranîn. Hêjeya gotinê ye ku li hinek herêmê din "eve, eva" belavbûyî ye, li vê herêmê jî /e/ya destpêkê ketiye.

Xaleke girîng jî xurdepaşen daçekên /di...de/, /ji....re/ û /bi ...ve/ ne, li vê herêmê ev xurdepaş wekî "va, ra, da" tên bilêvkirin.

Mînak:

Bi jîn û mîra va mîna qulî kîrgûya

Ya di zik **da** keçikê

Di parî dilî min **ra** darî tuyê

Aliyekî xurt yê vê devokê mijara tewangê ye, hemû navdêrên mî ast têne tewandin û ji navdêrên nîreza jî bi tenê yên ku tê de tipêñ /a/ û /e/ hene têne tewandin, ew her du deng dîbin /ê/, bo mînak di strana "Wer lo lawo" de peyvîn derî û serî bûne /dêrî/ û /sêrî/. Her wiha cînavk di cihê xwe de tên bikaranîn, tu car "min te dît" nayê gotin, "min tu dîti" tê gotin.

Mihemedê Zelxê

Lo lo bejnê Mihemedê minî zirav e

Di parî dilî min **ra** darî tuyê

Digo çîma bira negotana Mihemed kuştine

Bira bigotana dosya wî rakirine axircezê

Bira berê wî bidana Meletiyê
(Berê Meletî axir ceza wî)
Lo lo Mihemed darê e (ez) nemînim
Digo ezê lawekî şêra li ku biwînim
Digo k'ezî heyfa Mihemedî eşqiya
Li gundî Kosey rezîl law k'e hilînim
Lo lo Mihemedo di parê dilî mi ra
Çiyay Qizilqayê gundi kose bi neqew e
Lo lo Mihemedo gundi Kosay rezîl e
Bi jin û mîra va mîna qulî kîrgûya
Têne pêda qewi qew e
Digo Mihemedê mi di bin kelemê
Benîstokê da kirine xew e
Mihemedo darê minê te ra go dar e
Lo lo berxê bar e
Miyê berx e, bizinê kar e
Karî ki tu dikî, berxikê ne tu kar e
Digo te nediyî pêşî şîrîn e, paşıya xa tim
û timî tal e
Digo bejna Mihemedî min dirêj e, tayê sûsê
Digo di pî de mewzer e
Digo li ber qama lezgê dibirûse
Digo Mihemedî mi ra diwên
Mihemedê Henê, Mihemedê Zelxe
Digo tim û tim tûrê vê namûsê

Zeynewê

Lê Zeynê, lê zeynewê
Dê tirkê bav erekê
Kurmancê diran şewê
Avê li kaniya me mewe
K'e bimrim tu sewewê
Lê Zeynê lê Zeynewê
Tişfîrê li nav cêlewê
Lê Zeynê karan berde
Lê rindê karan berde
Kara bi girê himber de
Sê çarîk wenda bûna
pê(nc) şesik wenda bûne
Zirara wan tunîne
Ê'k mayî vegeŕîne
Ê'ki mayî şunda wîne
Lê Zeynê, lê Zeynikê
Li serê çoga neynikê
Li ber hemêzê lawikê
Ya di zik da keçikê
Xwedê bi nisîbê mi kê

Kî loma li mi bikê
Xadê li çava kûr bikê
Li hurdi jiniya kût bikê
Mi Zeyn dî li ber êxur e
Mi rind dî li ber êxur e
Teşiyê gure gur e, teşiyê gure gur e
Heyrana zenda gewr bim
Heyrana îsma gewr bim
Daye ber çavê qir e.

Wer lo lawo

Wer lo wer lo wer lo lawo
Wer lo lawo gewindewo (3)
Rê kiriye mala mewo
Xencer kiriye mehnêwo
Mehne li bejna te tinewo
Wer lo lawo tu ney mîr i
Tu bîskêniñe kîlîta dêrî
Tu birevîne şara sêrî
Şara reş ne tu şar e
Jina bî ne tu yar e
Keçika di mala bavê da
Mîna hespa bi timar e
Lawikê di mala bavê da
Mîna şîva di xiwar e
Wer lo lawo, wer lo kuro
Siyarê hespa quriquro
Tu dihatî hér ro di ro (2)
Her ro di ro hindik in (2)
Memik seva bi sindik in (2)
Dev di biniya guhu kin (2)
Bimijiye bi pemi kin(2)
Birîsîne bi dezî kin
Berin ser çilaga çêkin
Her nivî ki li ber mayî
Bi axret kunegiya mi kin (2)
Rokê li berê mirinê
Wînin di ustiyê mi kin.

Çavzerê virda werê

Ha lox e, lox e lox e
Loxê li kevirî mermere
Ketî cîkî seger e (2)
Lê didime nîye der e (2)
Çel keçkî bazda ser e (2)
Nav da yeka çavzer e (2)
Çavzerê virda were (2)

Rehme li bavê te were
 Mi rind dî li serê soqî
 Mi gewr dî li serê soqî
 Yawaş yawaş diloqî
 Hedî hedî diloqî
 Heyrana zendê gewr bim
 Heyranê îsmê gewr bim
 Tê da bazine dindoqî
 Di lemê lemi xuftano
 Xuftano di mala me da
 Xuftan pemiyê kitlîsê
 Mi top kir kir gidîşê
 Helandim te lorikê
 Helandim te dergûşê
 Xeftan pemiyê miştaqê
 Mi Zeyn dî li ziqaqê
 Te ez kuştım helandim
 Kirim qulpê şemşaqqê
 De limê lem xuftano
 Xeftano di mala me da

Sakîne

Kirîva te me lorikê
 Şûrê Şamê lorikê
 Li pişta te me lorikê
 Sakîne me lorikê
 Bêmane me lorikê
 Digo bira gundê Çimeyê bişewite
 Lorikê sî mahle ye lorikê
 Ezê derim mala kirîvê Sînan lorikê
 Li mal tuneye lorikê
 Digo ezê herima mala kirîvê Sînan
 Lorikê ki li mal heye lorikê
 Mi ra mîna bajarê Stenbolê lorikê
 Çayxane û aşxane û lorikê loqente ye lorikê
 Lo mi te va xanikî xa çêkir lorikê
 Me qapîkî lêxist, lorikê li textê wanê
 Lorikê li textê wanê lorikê
 K'êmê tê da idare kin lorikê
 Van her sê mehengê lorikê
 Zivistanê lorikê
 Lo lo were destê mi bigire
 Bavêje paş Evdila Begê lorikê
 Li Hîlwanê lorikê
 Gundê Çimê bira bişewite lorikê
 Li hember e lorikê
 Kirîvê Sînan nexaş e lorikê

Milay li ser e,
 Ezê tirsa mala kûçik Elî ra lorikê
 Newerim herme ser e lorikê
 Digo li wî bayî lorikê
 Li wî bakurî lorikê
 Digo li wî çemî lorikê şafir pirî lorikê
 Bira mala Kûçik Elî bişewite lorikê
 Ez nedame Kirîvê Sînan lorikê
 Ez dame lawê Hesê çavgemarî lorikê
 Serî gûrî lorikê

Baran (olf)

Hew dîbarî di baran e, hew dîbarî di baran e
 Baran maye li erşan e
 Tene hişt bû li ser erdan e
 Qinat rawî pênc û sesan e
 Ew nifira şêx Sultan e
 Şêx rabiye li ibretê,
 Dest vegirt li ber izevê
 Ellah bidî rihmetê, ellah bidî rihmetê
 Hew dîbarî di baran e
 Baran barî biharê
 Lê dixist pelkê darê
 Weşandin gulkê darê
 Weşandin hûrkê darê
 Erdê reş da ambarê
 Hew dîbarî di baran e
 Baran lêxist li havînê
 Lêxist pelkê zeytûnê
 Weşand hûrkê zeytûnê
 Erdê reş daye bînê
 Erşê daye Mirûnê
 (neqaret)
 Barî barî payîzê
 Lêxistî li pelkê gûzê
 Erşê daye Bidlîsê
 Erdê reş daye telbisê
 Erşê xa daye Bidlîsê

Cewelî Mîrê Hekariya

Cewelî Mîrê Hekariya mîrê Kurmanciyê
 Siweda dike here (te nedîye) sêlan û
 vêrgi ya hikûmetêwo
 Digo te nedîye carê balê xa dayê lo² loo...
 Lo lo gewindaw dilî min diwêyo
 Digo ketiye dewra salikê, şey miha ne
 Me top nekiriye sêlan û vêrgiya hikûmetê

Digo te nedîye li Cewelî Mîrê Hekariya tê xastinê
Axayê kurmanciyê
Go lo lo gewindaw ezê dikim berî xa bige rînim
Kunikê deştêwo
Digo li şûna min rûne bike axalikê
Li eşîra kurmanciyêwo lo lo...
Gewinde go lo lo axawo
Ezî bi vî kisvetî xirawo
Li 33 hezar kûlikê deştê ra
Nikam bikim axalixiyê...
Lo lo çito ezê bidim cewawê
Go te nedîye Cewelî Mîrê Hekariya
Berî xa gerande aliyê malê
Digo çîma kîlîte avite ser sendiqê
Li gewindey mi ra derxisto
Qatek kincî zabitlixiyê
Hanî digo li xa kiro
Digot te nedîye çimanê
Qundirak ardîlanê
Şewlerekî utmanî
Serda berde çimanê ceketê çitara
Digo bi dest xa kiriye
Bawşînî xetê, tim û tim yek caran
Li kêfi ci wo dixe li pozkî qundirawo
Law ...
Digo çîma axê berî xa gerandiye
Sêlan û vêrgiya nav eşîre
Digo te nedîye gewindê cînerawê
Siweda rakiro misafirî qiblêyo
Digo siweda law...
Digo misafirê rawiye ro tikilmış biy nîvro
Digo çîma, digo dû cixarê û avê qewê
Cîgerê wî reş kiriye, digo çîma nan nêye odêyo
Law...
Digo gewinde berî xa gerand aliyê malê
Go lê lê xatûnê malê bavî te şewitiyê rawe li xewêyo
Digo çîma navê axay minî mezin e, meke erdêyo
Siweda digo te nedîye misafirî eybê rawi ye pê ye
Dike biterikîne odêyo
Rawe wîne qewaltiya siwêyo
Go law here, gewindê pîsî heramo
Ezê nikam bîdim nanê odê

Here misafirê xawo bike bi rê...

Bêmal

Ax...
Lê lê lê Bêmalê
Ezê ne bêmal wîm
Lê Bêmalê te li xa ra bêmal kirim lê
Lê Bêmalê dînê sondxarina ku min sond xarî
Di parî hesret û hewesê dilî min û te ra Karikî li karî Xadê nakim lê...
Ezê xa berdim çiya Adiyamanê
Digo qa kil û qa tutînî te nedîtiye çîmanê K'ezê rakim lê Bêmalê k'ezê rakim lê
K'ezê xa berdim Adiyamanê
Cotik şîmîkî xawardan û heşaşa nîgî xa kim lê
Ezê şewqakê sekiz parça bi serî xa dim Di çatê bîriya kim, lê Bêmalê lê lê Ezê werim li nav şenî mey şewitî bigerim û Malê te neketê tim û tim xa li ba kim lê lê Ezê cuخارê vêxim, dûwa bela kim Di çavî gelî dijmin û parî neyara kim lê lê Ezê dijmina biqarînim, lê Bêmalê dilê dos ta li xa şâ kim lê
Werî lê lê, lê Bêmalê lê lê lê
Ezê ne bêmal wîm te li xa ra bêmal kirim lê lê
Werî lê...
Ez nikanim xelkî xay bilmez û Bêmala xawo Berhemêza pirî diya da li xewa siwê, barî şîrîn rakim lê
Ezê xa berdim Urfey şewitî
Çiftik bilbil û şalûlo di parê dilê xa û te ra rakim lê
Xa berdim çiyay Evdilezîzê digo kewikî gozel
Çiftik kewî Evdilezîz gozelo k'ezî rakim lê Ezê bi dest xa kim darî tembûrê
Siweda li berî birbangê digo çîma ênîşkê di ser
Bêmalê xa da xar kim lê lê...
Ezê bi berkirinê cotariyan, bi qîrîniyê den gî dikî siwê
Bi wîqîniyê bilbil û şalûla, qupîniyê kewî Evdilezîzê
Bi tînginiyê darî tembûrê, tim û timû xelkî xa

Bilmeza li ber hemêza pîrê diya da li xewê
siwê rakim lê lê...

Werî lê lê, lê Bêmalê lêl lê
Ezê ne bêmal wîm, te li xa ra bêmal kirim lê
lê

Were lê sewdalîyê, lê Bêmalê lê lê
Qîra qametê di yaxê min û sewî xelkê
Geriyaye lê Bêmalê lê lê

Siyahmedê Silêvî

De lo lo...

Siweda Xecê ban kir

Dilî mi dîn e (2)

Dilê min bi kulanî bi birîn e

Bala xa vê din

Digo te nedîye

Siwarê Demirê rê li surê

Xadiyê xana lenterê

Ahmedê Silêvî

Hevalê cin û cinawirê çolê

Berî xa dayê alî çiyayê Xelat û Sîpanê

Dem lo dem lo...

Felekê xa bide yane

Digot te nedîye Xecê daw û dêlên xa

Hildane, berî da çiyay Xelatê Sîpanê

Wê çarê balê xa dayê

Carê Xecê ban kir

Go: la la law...

Bira mawînê çiya Xelat û Sîpanê bişewite

Ezê balê xa didimê

Digot li kulê barê derketiye

Kewê sokinê têye pêda qewiqew e.

Digo ecew û elameta giran hew e
digot ki sêdê hewe, sekman li ser tinewe

Dem lo dem lo ...

Dem lo dem lo dewranê dinê ne

Digo balê xa dayê ku çi balê xa vê de

Digo nalînê nexasa têne di zikê şikakê da
Carê digo Xecê baz diyarî şikakê

Balê xa vê de di kûrî de têye nalinalê Si
yahmedî Silêvî

Go la la maxmûrî minî maxmûra

Hespê mexmûra tim û tim bi sê nigan e

Digo balê xa dayê di ûrî zinê da

Bostikê çar tilian kelemê benîstokê

Li ser piştê kiriye der û pê da têye nalînên
birîndara

Digo la la ...

Siyêhmed go lê Xecê ti meke melerzîne

Tu megrî, melorîne

Digo malê bavî te neketê tu xa berde baja
rî Çiyay Maçînê

Malê te neketê top ke kendir tu li xa ra bîne
Digo berde ûrê zinêr û

Tu min li ûrê zinêr bi derxîne

Digo li qilêra serê ser memika

Bi sîng i taxam û berê xa

Birînê min neçarî feqîrî bikewîne

Digo lê lê Xezalê tu megirî, lê lê Xecê me
lorîne

Digo çîma hêstirêne te têne dikevine li ûrê
zinêr

Digo çîma newê ku kêmî benîstokê

tadê didine dil û kezewê min e

Wê wextê ku eger negihêstê

Ku te şe nekir min li vir bi derxîne

Tu here Demirqirê li Surê berde

Hewsarê wî heywanî li ustû bişidîne

Digo çîrpîkî lêxe, eger ku biyom be

Ê here siwarekî li min çêtir

Lê lê xezala li xa ra biwîne

Eger digo ku bêyom we

Ê here rastî yekî pîsik were

Ê pê barê xa bikişîne

Tu jî meke, melerzîne

Xa berde bajarî Çînmaçînê

Çîma te nedîye xortekî li teng û tala xa ra
tu biwîne

Eger ku Xadê bedenê te ter kiro

Tu navê kekê min lê ke, Sadûn wexta ser û
binê

Lorikê tu navê Ahmedê Silêvî digo tu
vêxîne

La la ...

Xecê ban kir go la la...

Xecê go Siyahmedo ezê li te ra diwêm

Nîvro da te nedîye ketim şevreşa

Malê te neketo, têye dengê dikê eşâ eşan

Sîng û berê mi keçikê, mi qızî

Biye dilimê zeweşê li balgî nexasa

La la...

Ma te neketo dêr e

Digo hemêza xa veke

Ezî tême jêr e

Dem lo dem lo dem lo...

DÎROKA BAŞÛRÊ KURDISTAN YA NÊZÎK (I)

ZÜLKÜF KİŞANAK

Ji tirkî: Hesenê Çelo

Ger Qral Faysal di welatê xwe de hîna xwedî gotin be; bi giştî, bi saya balafirên Brîtanyayê ye. Heke balafir jê vekişin felişin li serê rê ye.” (Lord Amery 1995, Dosya Aurasî, Bihara 1996, Cild:3 Hejmar:1 rupel:61)

Bi vekişina Artêşa Osmaniyan re, li Başûrê Kurdistanê, balafirên Brîtanyayê li hemberî hêzên rizgarîxwaz ên netewa kurd; bi taybetî jî li himberî çalakiyên Şex Mehmûd Berzencî hatine bikaranîn. Balafirên malbata qraliyetê û Qral Faysal ê ku bi alikariya vê malbatê hate ser hikmê Bexdayê, bi destê hêzên alîgirên wî, bi awayekî hovane êrîş dibirine ser serkêşen kurd ên wê demê. Deshilatdariya emperyalîstan bi tu awayî napejirîne, serdestiyê qebûl nake. Li gel ku kurdan bi vê helwesta di beriya emperyalîzmê de bi serbilindiya netewa kurdрагirtibin jî, avakirina yekitiya netewî jî pêk neşanîne. Ji bo vê belkî yekem car di derke-

tina şerê cîhanê yê yekemîn de, tu tişt bi dest nexistine û têkçûne.

Piştî têkçûna şerê cîhanê yê yekemîn, împaratoriya Osmaniyan hilweiya û di şûna wê de dewleta Komara Tirkîyê hate damezrandin. Eli Şefiqê ku navê Özdemîr Paşa li xwe danîbû, li ser hesabê Komara tirk, li Rewandûz û Ranyayê nûneriya “Teşkîlat-i Mahsusâ” ava kîribû. Şêx Mehmûd pişta xwe ne bi vê û ne jî bi komara nû girêda. Bi hebûn û tûnebûna xwe şerekî giran li hemberî Brîtanyayê da heta ku dîl ket. Ev girêdana kevneşopî ya şêx Mehmûd Berzencî bi destê Mele Mistefa û kurê wî Mesûd iro jî berdewam e.

Iraq, di 26 ê Tîrmeha 1930 îde bi peymana ku bi Brîtanyayê re çekiribû, bi rîberiya Qral Faysal gihîste serxwebûnê. Di 8 ê Tîrmeha 1937 an de, di navbera Tirkîye, Iraq, Îran, û Efxanîstanê de “Peymana Sadabâdê”, tê çêkirin. Di vê peymanê de xala herî girîng a yekemîn e. Di ve xalê de tê gotin ku di karê navxweyî de kes dê dest navêje karê tu kesî. Tiştên ku di vê xalê de dihate gotin, ji herkesî zêdetir kurdên ku

welatê wan hatiye parvekirin eleqeder dikir. Armanca vê peymanê ji çarhêlan ve dorpêç kirina kurdan bû. Bi navê espriya “dijminê te, yê min e, yê min jî, yê te ye” hatibû çêkirin. Bi vê peymanê kurd, di nav ereb, tirk, faris û efxanan de weke dijminê hevpar dihatine ditîn. Her çiqas ku kurdan di nav xwe de hevkariya têkoşînê saz nekirin jî li her beşekî kevnoşpeke têkoşînê hebû. Di vê pêvajoyê de, PDK ê di 22 yê Rêbendana 1946 an de bi alîkariya Sovyeta berê, li Rojhîlatê Kurdistanê, Komara Mehâbatê ya Kurd a ku bi pêşengîya Qazî Mihemed hatibû damezirandin û salakê jiya bû. Piştî ku komara Mehabadê bi destê Îranê ter-

*Armanca vê peymanê
ji çarhêlan ve dorpêç
kirina kurdan bû. Bi
navê espriya
“dijminê te, yê min e,
yê min jî, yê te ye”
hatibû çêkirin. Bi vê
peymanê kurd, di
nav ereb, tirk, faris û
efxanan de weke
dijminê hevpar
dihatine ditîn. Her
çiqas ku kurdan di
nav xwe de
hevkariya têkoşînê
saz nekirin jî li her
beşekî kevnoşpeke
têkoşînê hebû.*

tûbela bû, di sala 1947 an de wezîrê parêzgeriyê yê Komarê Mistefa Berzanî derbasî Kurdistana başûr dibe û bi endamên eşîra Berzaniyan re, di vê salê de Partî Demokratî Kurdistan a Iraqê didamezirînin. Dîsa di vê salê de Berzanî qumandarên pêşmergeyan û endamên PDK ê yên ji qomîteya navendî (ji kesên navdar pêk tê) rê dike hikumeta navendî ya Iraqê. Xwesteka xwe ya lihevhatinê diyar dike. Li pêşberî vê diyariyê Iraq çi dike? Dest datîne ser heyetê. Dadgehekê formalîte li dar dixe û paşê tevan gulebaran dike. Piştî vê bûyerê Berzanî bi 500 pêşmergeyên xwe ve xwe diavêje bextê Yekîtiya Sovyetê. Mistefa Berzanî û bi pêşmergeyên xwe re yanzdeh salan li wir dimîne. Gava ku hevalbendê yekîtiya Sovyetê Evdilkerîm Qasim, di sala 1958 an de Qral Fay-

sal ji text tîne xwar û di şûnê de rûdine. Berzanî li Kurdistana Başûr vedigere û dîsa dibe serokê PDK ê. Ji damezrandina PDK ê vir ve, ji destpekê heta vê rojê, Malbata Berzaniyan her dem di Rojhilata Navîn de a-lîkariya hêzên politîk ên paşverû kiriye. Her tim ji dewletên mêtînger re nokerî kiriye. Nêzî pêncî sale ku geh bi awayekî neeskere destê wan ketiye xwîna welaþparêzên kurd. Geh jî bi eşkere rê li pêşıya hêzên rizgarîxwazên netewa kurd girtîye; jê re bûye kelem.

Di çêkirina zagona bingehîn a Iraqê de, di 26 ê Tîrmeha 1958 an de xala sêymîn wiha bû: "Kurd û erab di welatê Iraqê de xwedîyê mafekî hevpar in." 16ê tîrmeha 1970 yî di nûjenkirina zagona bingehîn de, di xala pêncan de hate gotin ku ev welat ji yekîtiya kurd û ere-

ban pêk tê, û dom dike; ev zagon mafê gelê kurd û kesen ku di Iraqê de dijîn, mafê hemûyan bi awayekî eşkere dipejirîne. Di zagona bingehîn a Iraqê de, xala 7 an wiha ye: Zimanê kurdî dê li navçeyên kurdan, li gel zimanê erabî bi awayekî fermî bête bikaranîn. Li gel ku bi zagona hîmî bi ewletî mafen gelê kurd dipareze jî, dîsan jî bandora hewdanê Ereb xwe dide xuya kirin. Gelê kurd dem bi dem li hember zilma Hikumeta Navendî ya Iraqê bi berxwedan doza mafê xwe kiriye. Lê PDK-I ya ku ji xwe pê ve tu kesî nas nake li pêşıya gel û rêxistinê din bûye kelem. Lewma gelê kurd têk çûye.

BIRÊVEBERIYA OTONOM A KURDISTANA BAŞÛR

Bi sedema pêşveçûna teygera gelê Kurdistana başûr a ku di dawiya sala 1960 û de, Emerîka û Îsraîlê ji ber ku Ebdul Kerîm Qasimê nîjadperestê Ereb alîgirê Sowyetê dixwuya, piştgiriya PDK-I ê kirin. Şahê Iranê jî li nik Emerîkayê bû. Di navbera PDK-I û hikumeta Iraqê ya Navendî de, di 11 ê Adara, sala 1970 yî de peymanek pêk hat. Bi vê peymanê re ji bo Kurdistana Başûr oto-



nomî hate bidestxistin. Ew peyman ji ber nerêkûpê-kiyên PDK-I ê berî ku bê ji-yandin, 4 salan bi şûn ve cû û piştî ku di sala 1974 an de desthilatdarên Baasê bi pêşengiya Sedam Huseyn hate ser kar, peyman bi ye-kalî hate rawestandin. Bi ne-naskirina peymanê şûn de, li çar aliyê Kurdistana. Başûr şer dijwar bû. DEY, Israîl û Iranê ew piştgiriya ku bériya şer didan PDK-I ê piştî li-hevhatina Iran û Iraqê, bi Peymana Cezayir ê şûn ve bi paş ve hate vekişin. Bi dûv vekişîna piştgiriya DEY, îs-raîl û Iranê re PDK ê, li hember êrîşên hikumeta Iraqê ya navendî xwe li ser piyan negirt û têk cû. Xuya dikir ku Berzanî ji pişti stûrkirina bi biyaniyan, ji polîtikayên çewt tu ders negirtibû. Tu ders ji Komara Mahabedê jî negirtibû. Serokê efsane-wî, carek din têk çûbû. Bi dubarekirina van pêvajoyan, xwe û gelê kûrd di nav êş û hêstirebaranê de hişt. Pêşî cû Iranê, piştre heta dawiya temenê xwe li Emerikayê ma.


Piştî têkçûna PDK-I, di sala 1975an de, cihênu ku mirov lê dijîn bi destê rejîma Iraqê hatine hilweşandin û valakirin. Kurdênu ku li van deveran dijîn, li gundênu ku li herêmên hundire Iraqê hatibûn avakirin, hatine bi cih kirin. Piştî têkçûna PDK-I ê ya ku serokê wê li Emerikayê dijiya, partiya herî xurt û ya bi rêk û pêk feliş. Rê li ber şerê navxweyî hew hate girtin. Beko Ewanî bû cûreyekî domandina jiyanê û katda. Komele û sazûmanen ku

hebûn bi dijminên Kurdan re yekîti li darxistin û bi hêza ku ji wan digirtin xwîna bî-rayên xwe yên Kurd rijandin, qirkirin. YNK, piştî têkçûna şerê 1975 an bi destê giregirên Soranan ên ku ji PDK ê veqetiyabûn û di pêşengiya di peşengiya Celal Talabanî de hate avakirin. YNK (Yekîti Niştimanî Kurdistan) di Başûrê Kurdistanê de xurt bû û bû hêza duyemîn. Piştî ku ev her du partî wekî du bendên cihê, wekî Behdinanî û Soranî hattine rêxisti, xwîna gelek welatparêzan ne ji bo tu tiştî, bê sedem hate rijandin.

Di şerê ku di naybera Iraq û Iranê de, di 22 ê Rezbera 1980 û de bi tevayî 8 salan domkir de, bêhtirîn Kurdistan hate wêrankirin. Ji aliyekî ve Iraq, ji aliyê din ve Iran kûjreyên herî giran bidest hêzên arteşe seranser hate hilweşan. Di pêva-

joya vî şerî de PDK-I (Iran) ê, bi Iraqê re, PDK-I û YNK ê bi Iranê re hevalbendî çêkirin û bi hev re şer kirin. Piştî şer, di nav dashhilatdaran de qediya li kurdênu nav xwe vegeyîan û dest tevkuştina wan kirin. Ev tevkuştina ku Kurdistan kire gola xwînê di pêşengiya Sedam Husêyn de pêk hat. Bi destê dewlata Iraqê ku di dîrokê de bi navê "Qetliama Helepçe" tê na-sîn, qewimî. Qirkî-

rîna gelê kurd jî li gel tune kirina mirovan bi xwe ev hêz û rêkxirav li hev û din a-nîn û tovê Beko Ewaniyan neqedand. Deng û awazên komeleyên kurd û rewşenbiran ne hate bihîstin, bêhtirîn dengên wan hate birîn û hin ji wan ji holê hatin râkirin. Rabirdûya PDK-I ji van bû-yînan mişt e. Di rabirdûya PDK ê de ne tenê xwîna kurdênu başûr li gel vê xwîna kurdênu mîna tékoşerê bi rûmet û bi nav û deng bi xwe ku Kurdekkî Bakurî ye, Saît Kirmizitoprak (Dr. Şivan) jî, bi alîkariya sîxurên tırkan qetil kirine. Di demên dawîn de jî, hejmarek ne biçûk gerîlayên ARGKê, bi xayıntî dîl girtin, hin ji wan bi işkenceyên mezin kuştin, hin ji wan jî, beranberî dolaran dane dest desthilatdarên tırk û bi awakî hovane dane kuştin.



**Dr Şivan di bargeheke
PDK ê de hat kuştin.**

KETINA ARTÊŞA TIRK A BAŞÛRÊ KURDISTAN

PKK ê, di 12 ê rezbera, sala 1980 yî de zêdetirîn endâmên xwe kışandin Rojhîlata navîn. Pişî ku perwederdeya leskerî û siyasi qedandin ji bo ku biçin Kurdistan'a bakur, ref bi ref derbasî Kurdistan'a Başûr bûn. Ji bo ku bi hêsanî derbasî Kurdistan'a Bakur bibin bi lezgînî çalakiyên mezin li darxistin û di demeke kurt de çend bargehîn gerîla avakirin. Di vî karî de, li gel ku endamên **PKK** ê yên bijarte hatin kuştin jî, **PKK** ê bi awayekî dostane xwest ku van pirs-girîkan ji holê rake. Li gel ku di nav **PDK-I** de wek kesen bi navê Samî Evdirehman û Fadil Mûtkî ku bi kesatiyeke xwefiroş têne nasîn û hevalbendiya wan û sîxûrên arteşa tirk têne zanîn jî ev nekirin sedema pevcûnê. **PKK** ê, li gel hewldanên van sîxûrên ku bi awakî eşkere têne naskirin, dîsan jî têkiliyên xwe bi **PDK-I** re, di sala 1983 yan de bi peymana "PROTOQOLLA PIŞTGIRIYÊ" danîbûn, xera nekirin û xwe jê berpirsiyar dîtin.

Di livbaziyên li dijî qereqola bi sînor ve girêdayî de, di sala 1983 an di 10 ê gulanê de 3 leskerên tirk bi destê gerîlayên **PKK** ê hatin kuştin. Bi dûv vê erîse re arteşa tirk 25 ê Gulana 1983 yan xwe bera 10 km. kûrayiya Başûrê Kurdistanê da. Yekem car bû ku arteşa tirk bi awayekî eşkere sînor îhlal

dikir. Pişî vê êrişê, di navbera Tirkîye û Iraqê de di heyva kewçêra 1983 yan de peymanek hate çêkirin. Di vê peymanê de dîbin gotinê "Mafê şopîna germ" de li hemberî gerîlayên kurd hate hemzekirin. Arteşa tirk heta ku Iraqê ji aliyê xwe ve ev peyman di sala 1988 an de betal kir, gelek êrişen dorferh pêk anîn. Di 12 ê Tebaxa 1986 an de gerîlayên **PKK** ê êriş birin ser qereqola Çukurcayê. Di vî şerî de 2 serbaz û 12 lesker hatin kuştin. Pişî vî şerî, artêşa Tirk ku leqayı destpêka şerê çekdarî ango 15 ê Tebaxa 1984 an dihat, erîş birin ser Kurdistan'a Başûr û di erîşê de nêzî 150 pêşmerge hatin kuştin. Kesên ku hatin kuştin pirani-

*Iraqê bi navê vê
erîşa "Baboz" ê li
bajarê Helebçe û li
berêma Çemçemalê li
dijî zagonê
navnetewî ku batine
qedexe kîrin dîsan jî
çekêñ kîmyayî û bi
donê xerdelê di 16
adara, sala 1988'an
de bikaranîn û
qirkirinek mezin
pêkanîn. Di vê
qirkirina Kurdan de
zar û zêç, kal û
ciwan nezikî 5000
kes bi awakî bovane
hatin kuştin.*



ya wan bê çek bûn. Armanca wan ew bû ku arteşa tirk a ku bi hêzeke mezin biçe ser Başûrê Kurdistanê, da ku kurdên Başûrî û **PDK-I** yan

çavtirsandî bike. Li dijî vê bûyerê **PDK-I** çiqas ku bi awayekî eşkere nerazîbûna xwe li gel **PKK** ê neanî zimên, têkiliyên xwe nebirîn

jî lê xwestin ku hewldanên **PKK** ê yên li Kurdistana Başûr bi hincetên vala râwestîne. **PKK** ê, bi hevdîtinan çiqas xwest ku astengiyan ji holê rake, lê bi ser netket.

Tirkan bi balafirên şer di 4 ê Adara 1987 an de êrîşeke

Kurdan de zar û zêç, kal û ciwan nezîkî 5000 kes bi awakî hovane hatin kuştin. Bi deh hezeran kurd birîndar û hêjar man. Nêzikî mîlyonek kurdî cih û warêne xwe terikand. Kurd, bi sedhezaran li der û dorêne sînorê Îran û Tirkîyê li ser warê xwe mane

yareke navnetewî bi hêzên leşkerî çûne ser Iraqê. Hêzên Iraqê xwe li hemberî HY ranegirtin û felişin. Kurdish felîşîna Iraqê ji xwe re fersendek dîtin û 5 ê Adara sala 1991 an de bi serkêsiyâ cahsan li bajarê Ranya (kurdên hevalbendên Iraqê, cerdevan) rabûne ser piyan û pêşiyê bajarên weke Kerkük, Mûsil, Silêmanî, Erbil, Di-hok bidesxistin. Piştî raperînê bi çend rojan, pêşmergeyan bi teqandina fişekêji çiyan xwe berdan navce û bajaran. Dest danîne ser bajarên ku gel bidesxistibûn. Gel jî, pêşmerge bi awayê neferê Tekoşîna Rizgarîxwazên Netewa Kurd hembêz kir. Pêşmergeyên ku bi salan e têdikoşîn bi awayekî nedîti, êrîş berdan ser terş û hêjahiyyênu ku gel bi dest xisti bûn. Bi taybetî jî fermardarêne pêşmergeyan bi carekê bûne xwedî gencîne. Eşîr jî, li gorî hêzên xwe bûne xwedîyê hevgirtinan, man li holê û ji berê zêdetir bêçare ketin. Tiştên ku di destê wan de hebû jî, ji dest wan çû. Gel hante şelandin û talan kirin. Li dewsa nijadpereştên faşistên Iraqê axa û kevneperas-tan hespê xwe dibezan edî. Ji aliyekekî **PDK-I**, ji aliyedîn ve **YNK** ê bi axa, mezinên eşiran û caşen hevalbendên kevn ên Iraqê xwes-tin ku hevalbendîyan wan bikin û li tekiliyên wan geriyan. Berjewendiyen Netewa



dijwar pêk anîn. Di ve êrîşe de 30 balefirên tirkan gelek gund hilweşandin. Piştî vê êrîşê, **PDK** ê daxuyand ku têkiliyen xwe û **PKK** ê qedandine û destê xwe yê hevalbendiyê daye Tirkîyê.

Artêşa Iraqê jî di navbera Reşemî û Rezbera sala 1988 an de bi hêzên xwe yê leşkerî bi navê Enfal (Bahoz) êrîşî Kurdistana Başûr kir. Iraqê bi navê vê erîşa "Bahoz" ê li bajarê Helebçe û li herêma Çemçemalê li dijzagônen navnetewî ku hatine qedexê kirin dîsan jî çekên kîmyayı û bi donê xerdelê di 16 adara, sala 1988 an de bikaranîn û qirkirinek mezîn pêkanîn. Di vê qirkirina

penaber. Li dijberî vê hovîtiyê ji qada navnetewî tu deng nehat bihîstin. Lê gava ku dewleta Iraqê berê xwe da şêxê Kuveytê, binpêkîrîna devlemendên petrolê hovîtiya Sedam da eşkerekirin.

Di sala 1991 ê de li Enquerê bi piştigiriya Serokkomar Turgut Özal biroyen kargêriyê yên. **YNK** ê û **PDK** ê hatin vekirin. Tirkîyê yekemîn car bi serokên kurdan re di pêşengiya serokkomar de têkilî danîn. Di çapemaniyê de hate gotin ku "pasaport a sor" ji bo Telebanî hatiye dayîn.

Piştî ku Kuveyt ji aliye Iraqê ve hate dagirkirin Hêzên Yekbûyî (HY) bi bir-

kurd danîn hêlekê, ketin dû berjewendiyen şexsî Kurdistan ji bîr kirin cî û warên ku gelê kurd bi dest xistibûn wêke gund û bajar qışleyên leşkerî, febrîqe, karxâne û bîrêne petrolê ewên çawa bi dest bixin guman dikirin. Di xew û xeyelan de dijiyan. Li dijî vê leşkerên Iraqî ku canê xwe xistibûn devê xwe û ling dabûne bezê xwe amade dikirin ku wê çawa li Başûrê Kurdistan bi dest bixin lê mixabin haya partî û rêxis-

ke din hew jê derên li Kerkuk û Mûsûlê xwe tenzîm kirin. Bi dû ji destçiyûna Mûsûl û Kerkukê Netewêne Yekbûyî dest bi hembêzkirana kurdên bêrê-er xebat lidarxistina biryaran kir. Gelê Kurdistanâ Başûr di bin baskên Neteweyêne yekbûyî de ket bin parêzgeriya cendermeyên Emperyalîst ên Emerîkî. Herdu rêxistinên bi hêz (**PDK, YNK**) ên Kurdistanâ Başûr de xwe amade dikirin ku bibin şaxên (şube)

ji bo parastina wan ketin Başûrê Kurdistanê. Hejmara Hêza Aramîyê kêm kirin di dewsa wê de 1991 an heyva Tîrmehê de "Hêza mudaxelekirina lezgîni ya Hevgirtî" (Müttefik Acil Müdahale Gücü) hate damezirandin. Di rezbera 1991 ê de baskên hêzên leşkerî yên reşayî dane paş. Hêzên asîmanî jî li Încîrlîka Edenê li wargeha balefirî ya NATO yê hatin bi cihkirin. Li hemberî reaksiyonên Tîrkiyê Netewêne Yek-

*Di sala 1991'an heyva gulanê de jî 20 bezar leşkerên
dewletên cûr bi cûr hêzek hate amadekirin û bi navê "Hêza
Aramîyê" kurdên ku li çiya pejigî mabûn, di welatê xwe de mabûn
penaber ji bo parastina wan ketin Başûrê Kurdistanê. Hejmara Hêza
Aramîyê kêm kirin di dewsa wê de 1991'an heyva Tîrmehê de
"Hêza mudaxelekirina lezgîni ya Hevgirtî"
(Müttefik Acil Müdahale Gücü) hate damezirandin.*

tinên kurd û serleşkeriyên Kurdistanî ji wan tune bû. Pişti ku ewletiya **YDE** (Yekitiya Devletên Emerîkî) hilgirtin di demeke kurt de tiştên kurdan girtibûn dest yek bi yek bidestxistin. Li hember êrîşên leşkerî ên Iraqê gelê kurd xwest ku li ber xwe bide lê mixabin pêşmergeyên ku hînî revê bûbûn xwe vekişandin çiya û berxwedana gelê Kurdistanâ başûr bi avê de berdan û gel bê çare û bê rêber hiştin. Dîsan zar û zêçen xwe avêtin sitara çiya û dev ji war û cî berdan xwe li sînorêne Tîrkiyê û Îranê dîtin. Artêşa Iraqê tiştên ku li dû wan mabûn, tiştên ferbûnî, têgihîn û dewlemendiyên bi rûmet bi dest xistin. Bi awakî ku care-

YDE ê li Kurdistan ê. Başûrê Kurdistanê bi dera-nîna biryara 688 an ji alî Netewêne Yekbûyî di sala 1991 an di 5 ê Avrêlê de ket bin siya parêzgeriyê. **YDE** bi vê biryarê ve girêdayî bi balafiran dest bi alîkariya kurdên ku ji ber leşkerên Iraqê direviyan kir. Ji ezmên dest bi barandina pakêtên alîkariyê kir. Kurdên ku ji birçîna mane dilayî û bêmecal di dewsa xwarinê de cil, pêlistikên zarojan û pirtûkên îngilizî para wan diket.

Di sala 1991 an heyva gulanê de jî 20 hezar leşkerên dewletên cûr bi cûr hêzek hate amadekirin û bi navê "Hêza Aramîyê" kurdên ku li çiya pejigî mabûn, di welatê xwe de mabûn penaber

bûyî cî bi cî xwe ji Başûrê Kurdistanê vekişandin. Tîrkiyê, ji vê parastina ku li ser kurdên Başûr hatiye avakirin li gel ku rayedarên wan jî tê de bi cih bûyî bûn dîsa jî ne razîbûna xwe ji hêzên Netewêne Yekbûyî ku li hember zilma Sedam têne parastin hebûna hêzê nedipejirand. Ji ber ku dizaniya pirsgirêka kurdan dê bi awayekî têkeve rojeva civakên navnetewî. Ji derî van kiryan car caran ji bo ku partiyên kurdan ji dest xwe bernede bi alîkariya diravan carinan jî bi sîqirandina diranan ew çavmiçî dihiştin. Ji bo ku van hêzan li hemberî **PKK** ê têxe şerwan di hember hev bide bikaranîn û kuştin ci jê dihat texsîr nedikir.

ZARGOTINA KURDÎ Û METODÊN LÊGERÎNÊ

AHMET ARAS

Dewlemendiya zargotina kurdî her tim bala kurdo-logên Ewrûpî kişandîye. Rojhilatnasê Sovyeta kevn O. Frizov dibêje: "Zargotina kurdan bi piraniya janr û sujeyên xwe ve, di nava zargotina gelên Rojhilata Navîn de ciyê herî pêş digire."

Kurdologê bi nav û deng B.Nîkîtîn jî, bala xwendevanan dikişîne ser girîngîya folklorâ kurdî û dibêje: "Gava meriv bixwaze civatekê baş nas bike, yek ji nêyên herî baş jî zanîn, na-nîn û lêhûrbûna zargotinê ye."

"Gava dengbêjekî kurd qala biserketinê şerîn Yezdan Şêr, yan jî Evdi-rehman Paşa dike û li ser wana dibêje, ew di eynî wextê de bi navê kurdayetiyê, qala tekoşînê kurdan yêl li dijî dijminan jî dike û qala doz û daxwaza kurdan dike."

Rojhilatnasê eyan Vil-çevskî jî weha dibêje: "Di warê edebiyata kurdî de, ji bo kesekî lêger, tiştî herî balkêş dewlemendiya bêhed a folklorê ye."

Vilçevskî vê dewlemen-

diya folklorê, di nav kurdan de bi tunebûna xwendin û nivîsandinê şirovedike.

Sedem ci dibe bila bibe, kurd hemû tiştên xwe di zargotinê de, aingo di kîlam, destan, çîrok û metelokan de anîne zimên.

Zargotina kurdî, him salixê dem û dewranên kevn dide him jî rewşa civakî û mantalîta gel tîne pêş çavê merivan.

Meriv li destan û kilamên kurdî hûr dibe di aliyekî de rîbirî, bac xeracsitandin û anarşî dibîne, di aliyê din de jî merdî, mîrxasî û ruhê şovalyetiyê.

Zargotin, tenê salixê bû-yerên dîrokî, erf û edatên civakî nade, ew dewlemendiya ziman û stîl û awazên muzîka kurdî jî nîşanî merivan dide ku tê zanîn, piraniya zargotina kurdî stran e. Çawa stranên şêhnahî û reqsê, kilamên mîrxasî û dilovaniyê, her wisa jî lorîkîn zarokan, kilamên şînê, beyt û destan stran in, aingo muzîk in.

Herçî kesên ku bi muzîkê re mijûl dibin, an jî li ser ziman xebatê dikin, muhe-qeq dive ku ji zargotinê haydar bin. Ew bêje, terîm û idiomên ku gel bi sedsalan bi kar anîye, bi xêra

zargotinê tê zanîn. Cela-det Bedirxan wexta ku li ser ziman dest bi xebatê kiriye, wî ji welatên dûr û de-reke dengbêj û çîrokbej da-ye anîn, guhdariya wan kiriye, aingo ji zargotinê îstî-fade kiriye û gramera zi-manê kurdî nivîsandiye.

Zargotin di eynî wextê de çavkaniya edebiyata nivîs-kî ye jî, çawa ku Ehmedê

Zargotina kurdî, bîm salixê dem û dewranên kevn dide him jî rewşa civakî û mantalîta gel tîne pêş çavê merivan.

Meriv li destan û kilamên kurdî hûr dibe di aliyekî de rîbirî, bac xeracsitandin û anarşî dibîne, di aliyê din de jî merdî, mîrxasî û rubê şovalyetiyê.

Zargotin, tenê salixê bû-yerên dîrokî, erf û edatên civakî nade, ew dewlemendiya ziman û stîl û awazên muzîka kurdî jî nîşanî merivan dide ku tê zanîn, piraniya zargotina kurdî stran e.

Xanî "Mem û Zîn" a ku ji "Memê Alan" wergirtiye û nivîsandiye, her wusa ji Xarîs Bidlîsi "Leyl û Mecnûn" ji "Leyl û Mecnûn" û zargotinê, Feqiyê Teyran "Şêxê Senan", ji "Şerê Sîsebanê Erebê Şemo "Kela Dimdimê" ji bûyera "Xanê Çengzêrîn" wergirtine û nivîsandine.

* * *

Cara ewil rojhîlatnas Halî Garzonî li ser folklo-
ra kurdî lêkolîn kiriye û ew lêko-
lîna wî di sala 1787'î de li Ro-
mayê hatiye çap-
kirin. Pey re ji
rojhîlatna sên Ewrupî A. Jaba,
P.Lerx, A. Sosin,
H. Maqaş, N.Y.
Marr, İ.A. Orbel-
lî, B. Nikîtin, Mî-
norskî û gelekîn
din lêkolînen gi-
ranbuha kirine.

Kurdan bi xwe, ancax piştî 1920' an de mecal dîti-
ne û li ser çand û zimanê xwe xe-
bat kirine. Li Er-
menîstane di sala 1931'ê de Cer-
doyê Genço, He-

ciyê Cindî, Karo Zakaryan,
Asatur Xaçaturyan, Emînê
Evdal û Casimê Celîl ji bo
berhevkirina zargotina kur-
dî komîsyonek dameziran-
dine û dest bi lêgérinê kiri-
ne. Xebata wê komîtê, di
sala 1936'î de hatiye çapki-
rin. Paşê dîsa li Ermenîs-

tanê, di sala 1957'î de ber-
hovekeke din jî hatiye çap-
kirin.

Ew xebatê Kurdên-Sov-
yetê helbet karên pîroz in,
wan gelek kilamên klasîk û
tiştên din, ji windabûnê xi-
las kirine, lê kêmasiyên
wan jî pir in. Kurdên Sov-
yetê him ji çavkaniyê dûr

nedane qaîdeyên gramerê.

Di wan berhevokan de
15-16 şaxê destana Kerr û
Kulik û gelek şaxê des-
tanê din hene. Ew şaxê
destanan qet nehatine tes-
nîfîkirin, gişk tevlihev in û
jê zêde tiştek nayê famki-
rin.

Bazîl Nîkîtin di pirtûka
xwe de, salixê bernevoka 1936'î
dike. Li gor goti-
na wî, di wê ber-
hevokê de 12 ki-
lamên Evdalê
Zeynikê hatine a-
medekirin. Lê
dema ku meriv li
berhovekê di-
nihêre, dibîne ku
ji kilama Evdal û
Gulê tenê sê çar-
rêz, ji ya Evdal û
Şêx Silê jî çar-
pênc rêz ji aliyê
12 dengbêjan ve
hatine ducarkirin.
Ango ew ne 12
kilam in, çar-
pênc rêzên du ki-
lamân in.

Ji kurdên Sovyetê
hinekan jî, destâ-
na Siyabendê Si-
livî di çarçova
resmî de nivîs-
dine û Siyabend
xistine dirûvê
proleterekî qurna



bûne, him ji wan metodêni
ilmî bi kar neanine. Di
lîgerînê de, ci ku ber çavêni
wan ketiye, wan mînanî
"Hevana Babaemkê" gişk
tijî tûrikên xwe kirine, bê
salix, bê ferheng, bê tesnîf
û bê şirovekirin. Zimanê
wan jî, aloze ye û zêde guh

bîstan. Qaşo Siyabend şî-
vanê pezê axakî dewle-
mend û zorker bûye, dilê
wî û qîza axê (Xecê) ketine
hey, wî li hemberî axê serî
hildaye, lê xistiye axa kuş-
tiye û Xecê ji xwe re revan-
diye biriye.

Me li jorê bi pirs û go-

tinêñ rojhilatnasêñ biyanî, bala xwendevanan kişiñde ser girîngiya zargotina kurdan. Lê mixabin rêxistinêñ kurdan ên çandî hê jî di ferqa vê rastiyê de nînin. Her çiqas rêxistinêñ çandî hisyar bibin, 'hewl bidin xwe, li ser zargotinê bixebitin, ew xebat, di pêşerojê de dê gelek bi kér bêñ. Lewra xezîna çanda kurdî zargotin e.

Lêgerîna zargotinê karekî ne hêsa ye. Di aliyekî de, siyaseta dewletê astengan derdixe pêsiya lêger û lêkolînvanan, di aliyê din de jî, rewşenbir û nivîskarên kurd zêde guh nadine wî karî. Herçî yên ku pir hindik bi zargotinê re mijul dibin jî, bi piranî karê xwe desto-lepo dîkin.

Lêgerîna zargotinê dive ku bi metodêñ ilmî bê kirin. Dema ku meriv li destanekî, li kilam, mesel, yan jî li serpêhatiyekê vekole dive ku di serî de pirsiyarî bike. Ku ew berhem li ku derê, di kîjan zemanî de, di navbera kê û kê de derbas bûye, wan bizaribe.

Pey re jî, dive ku meriv lê hûr bi be, mesaja wê fam bike. Mesaj pir muhîm e, lewra hemû gotin û vegotina bûyerê li ser hîmê mesajê hatiye hunandin. Di nav gel de, bi hezeran, bi milyonan tişt qewimîne, lê jî wana ançax ji hezarî yek bûye bûyera gelêri û bi zarîtiye. Çima ku di wê bûyerê de, ji bo jiyanê mesaj heye. Mesaj, karê lêger nivîskar jî, pir hêsa dike.

Lêger, dive ku bi şaxekî tenê qîma xwe neyine, qe

na du şaxan, heta ku ji destê zêde şaxan berhev bike û pey re wana rûqalî hev bike û tesnîf bike.

Ji dengbêj û çirokbêjan hinek zîrek in, hinek qels in; zimanê hinekan tekûz e, yê hinekan aloze ye; di go-

*Lêgerîna zargotinê
dive ku bi metodêñ
ilmî bê kirin. Dema
ku meriv li destanekî,
li kilam, mesel, yan jî
li serpêhatiyekê
vekole dive ku di serî
de pirsiyarî bike. Ku
ew berhem li ku derê,
di kîjan zemanî de, di
navbera kê û kê de
derbas bûye, wan
bizaribe.*

tinêñ hinekan de mantixeke saxlem heye, di ya hinekan de tune. Ji wan hinek kes gotina xwe fesih dibêjin, hinek jî tevlihev dîkin û pirsan di devê xwe de, di perçînin. Dive meriv vana gişkî bigire ber çav, baş lê hûr bibe û rastiya bûyerê derxe holê.

Çavkanî û navnîşanêñ dengbêj û destanbêjan jî, dive ji aliyê berhevkan ve bêne kifşkirin. Ew dengbêj yan jî destanbêj di dema roportajê de çend salî bûye, ji ku derê bûye, kîngê pê re xeberdan çê bû ye, dive ku bê zanîn. Ev, berî her tiştî ji bo lêkolînvan û xwendevanan pê-wist e.

Ji bo mînak em qala du şaxêñ destana Siyabendê Silîvî yêñ çapbûyî bikin.

Yek ji wan ji aliyê O. Celîl û C. Celîl ve hatiye berhev-kirin, paşê jî H. Erdem ew wergerandiye zimanê tirkî. Wisa dixûyê ku wan herdu bira ji çirokbêjekî nezan tek şaxek girtine û bê pirsî-yarı nivîsandine. Ne guh dane mesaja destanê, ne jî guh dane rastî û xeletiyê.

Ew şax di eslê xwe de çîroka "Keçolekê Qazan e...?", tenê çend motivêñ bûyera Siyabendê Silîvî tê de, cih girtiye. Heke wan biraderan pirsîyari bikirana, şaxêñ din jî bi dest bixista-na, wê rastiya bûyerê bidî-tana.

Saxeke Siyabendê Silîvî ya din jî ya Z.A. Zinar e. Ew jî çend sal berê li Swêd hatiye çapkiran. Di wê şaxê de çirokbêj, an jî nivîskar bi destê Siyabend girtiye, biriye di "Qumistanê Yemînê" ra derbas kiriye, di "Ada Heft Behra" de derxistiye.

Di pirs û gotinêñ vê çîrokê de zerre misqalek mantiq tune. Kurdistan li ku, "Ada Heft Behra" li ku... Tenê meriv navê we-latê Siyabend, navê "Silîva" bîne bîra xwe, Siyabend nabe li "Qumistana Yemînê" nagerîne.

Lêgerîn karekî hunêr-mendî ye. Wisa tê gotin ku hu-nêrmend, hebûnêñ çandî ji gel hildide, careke din raberî gel dike. Lê ne bi a-wayê hişk û xav. Hunêr-mend gava ku hebûnêñ çandî ji gel hildide, wan dipêjine, çêdike û di xemla kubariye de (bi estetîk) careke din raberî gel dike.

SERHILDANA SMAİL AXAY ŞİKAKÊ

(SIMKO 1914 -1926)

ŞIYAR C. OREMAR

Di mêtûya ramyarî ya kurdên Rojhilatê Kurdistanê de bi a-wayekî giştî gelê kurd, ji 300 sal berî niha heya iro ji bo hebûna xwe ya netewî û ji bo parastina xaka xwe ser kiriye. Deshilatdarê İmparatoriya Sefewiyan jî ji bo parastina sînorê dewleta xwe li hemberî împartoriya berfi-reh a Osmaniyan şetî wekî mezhebekî dînî û fermî yê împaratoriya xwe dan xuya-kirin. Lê di împaratoriye de

gelên kurd, Belûç, Efxanî û hwd. mîna dîwarekî hesinî li hemberî vê daxwaza Şîyên desthilatdar li berxwedan. Ji ber ku ew bi mezhebê xwe Suniyên Şafî û Heneffî bûn. Ev ji bo dewleta Îranê ku hebûna hikumdariya wan bi Şîetiye ve girêdayî bû, derdekî pir giran bû. Şah Ebasê Sefewî yê mezin ji bo helandin û jinavbirina gelê kurd, du rê dane ber xwe:

1- Dûrxistina kurdan ji xaka bay û kalên wan, bi hince-ta ku kurd şervan û mér-xasen çeleng in û dikarin sînorê împaratoriya Sefewî ji êrişen Efxaniyan biparêzin. Lê armanca sereke ne ev bû. Armanca wan a mezin xalîkirina xaka Kurdistanê ji kurdên nişteh û di Kurdistanê de bi cihkirina nîjadên din bû. Bo nimûne, ev siyaseten çewt ji sedsala 17an heya roja iro li bakûrê Rojhilatê Kurdistan (Ürmiye, Xoy, Selmas û Mako) tê mesandin.

2- Bi riya propagandayêñ derew û çewt belavkirina mezhebê Şîetiye û li dijî mezhebê sunî bi darê zorê Şîekirina kurdan. Di vî warî de gelekî serkeftin bi dest-xistin. Kurdên herêma Mako û Xoy ku di sedsala 17an de bi darê zorê ber bi Xorasanê

hatin koçberkirin, piştî demeke kurt tev bûn Şîe û heya roja iro taybetiyêñ xwe yên netewî heya radeyekê parastine. Gelek mêtûniyîs dibêjin, heger Şah Ebasê Sefewî yê dawiyê çend salan zêdetir hikumdariya xwe dewam bikira û plan û fer-manen xwe li dijî kurdan berdewam bikira, sedî sed dê Kurdistan ji gelê kurd vala bikira. Lê gelek berxwedan li hemberî wan planen neyar hate dayîn. Yekemîn şerê ku nasnameya neteweya kurd li rojhilatê welatê me heya radeyeke bilind, li hemberî Sefewiyan parast, berxwedana Kela Dimdimê bû. Emîrxanê Bradostî ku dewleta navendî ya Îranê hikumdariya Ürmiyê, Mîrgever û Tîrgever dabû destê wî, bi haydarbûna van siyaseten çewt û dûrî mirovahiyê yên dewleta Sefewî re, bi sazkirina Kela Dimdimê, şerekî dijwar û dirêj li dijî dewleta Sefewiyan da meşandin. Di vî şerî de bi hezaran leşkeren Sefewî hatin kuştin. Lê bi dest xistina Kela dimdimê ji bo eceman negengaz bû. Em baş dizanin ku xiyanet di dîroka têkoşîna gelê kurd de bûye mîrateke dîrokî û çandî. Li dawiya, çend şerîn giran û şkestina Sefewiyan, ji ber ne

Kurdên berêma

Mako û Xoy
ku di sedsala
17an de bi
darê zorê ber bi
Xorasanê batin
koçberkirin,
piştî demeke
kurt tev bûn
Şîe û beya
roja iro
taybetiyêñ xwe
yên netewî beya
radeyekê parastine.

çariyê, Şah Ebbas fermandariya giştî ya şer bi xwe hilda dest. Lê ji ber ku kurd li dijî wan yekbûn, artêşa Sefewiyan li dijî şervanên kurd tiştek nekir. Mehmûdê Alekanî ku xulamekî Emîrzan bû, di şeveke tarî de ji kela Dimdimê reviya û hemû riyên avê yên ku ji derve dihatin nava Kelayê, nîşanî dijmin dan. Sefewiyan riyên avê li ser Kela dimdimê birîn. Şepirziyeke pir mezin kete na-va rûnişvanên kelayê. Bi vî halî dîsa jî ji şes mehî zêdetir bi ava ku berê hatibû ze-xîrekirin û herwiha bi ava baranê ve, parêzvanên Kela Dimdimê şerê hebûna xwe berdewam kirin. Lê sed heyf û mixabin, bi vê xiyaneta Mehmûdê Alekanî re ku heya roja iro jî dengbêjên kurd bi daxbariyeke mezin vî karî şermezar dikin Kela Dimdimê kete destê Sefewiyan. Hemû şervanên Kelayê di gel rêberê xwe Emîr Xanê lepzêrîn heya kîliya dawiyê berxwedan û bi hev re şehîd ketin.

Ji vê dîrokê pê ve, êriş û bi cihbûna ceman li Kurdistanê bi taybetî jî li herêmên Ûrmiyê û Xoy destpêkir. Cih û warêن bav û kalêن me Kurdistanâ ku yek ji xwestirîn herêmên dinyayê ye ji ber vê hindê, bi ferman û qetliamên girseyî dijminê hov êrişen giran bi hemî awayî anîn ser. Gelê kurd jî heya hêz tê de hebû, xaka xwe parast. Di şerekî de ku Efsariyan dixwestin di herêma Ûrmiyê de bi darê zorê bi cih bibin, gelê kurd li derve û li Girê

Qûşciyê hind şer û berxwedan kir bi sedan ji wan hatin şehîd kirin.

Sefewiyê dagirkir heya roja iro jî ji wê derê re dibêjin "Kürtqiran tepesî "(Girê qirkirina kurdan). Li her dera Kurdistanê binêrin, kurdan xwe kişandine herêmên çiyyayî lê li cihêن ku

li hemberî dijmin nikaribûna şerê hebûna xwe bidin, ji ber bêgaviyê hatiye xwelikirin. Ev taybetî li Rojhilatê Kurdistanê tê dîtin..

Heya sed sal berî niha jî dîsa desthilatdariya herêmê di destê kurdan de bû. Pişti Sefewiyan, hikumdarî ket destê Qeçeriyê koçer. Di



parastina kurdan a li dijî vê siyaseta kedxwir a Qeçerîyan de, jî êla bi nav û deng Şikak roleke mezin leyîstiye. Eşîra Şikakan li Rojhilatê Kurdistanê piştî eşîra Kelhor Eşîra herî mezin a kurdan e û di mêtûya ramyarî ya dîroka Rojhilatê Kurdistan de fedakariyên mezin nîşan dane. Cih û warê vê êla mezin, herêma Rojavayê Gola Ûrmiyê û bajarê Salmasê ne. Di wê herêmê de du Mîrekên mezin heya demeke dirêj hukumdarî kirine: Mîrekdaîiya Soma Bradostî di çaxê Emir Xanî Bradostî de û Mîrekdaîiya malbata Simkoyê Şikak li Kela Çariyê. Ev Mîrekiya dawiyê ji bo Şahê İranê tim û tim metirsiyeke mezin bûye. Ji ber ku cih û warêwan, erdnîgariya wan dikete nava hikumdaîiya du împaratoriyan. İran û osmanî herdu aliyan jî dixwestin serokên vê mîrekiyê bikişînin aliyê xwe. Lê serokên vê êlê, li hemberî herdu împaratoriyan jî serê xwe netewandin û heya radeyekê serxwebûna xwe ya herêmî parastin. Di vê riyê de hemû mezin û serokên vê eşîre canê xwe feda kirin.

Serhildana Sîmaîl axa çawa dest pê kir?

Kurê Mihemed Axayê Şikak Cafer Axa bi awayekî fermî, di bin birêvebiriya dewleta Qeçerî de li herêmîn Rojavayê Gola Ûrmiyê hikumdarî dikir. Di sala 1907 an de bi awayekî fermî Nizameltene, hekimê

bajarê Tebrîzê Cafer Axa ji bo gotûbêjê vexwend. Cafer Axa bi heft siwarênen xwe yên navdar û mîrxas re, ji Dilêmanî xwe gihad Tebrîzê. Piştî cil rojan ji Tehranê destûra kuştina Cafer Axa ji hêla Mihemed Şahê Qecerî ve gîhişte destê NizamEl Seltene. Bi pilaneke bêbext ve Cafer Axayê birayê Simko di qesra hikumdaîiya veliehtê (cîgirê) İranê de, li bajarê Tewrêzê (Tebrîz) hat kuştin. Ser di navbera heft siwarênen kurd û parezvanen qesra hikumdaîiyê li Tewrêzê dest pê kir. Pênc siwarênen Cafer axa bi lehengî şerekî dijwar meşandin û dehan leşkerên eceman kuştin û di encamê xwe gîhan din Dîlemanê. Ji wan du heb

jî hatin kuştin. Li dijî vê bêbextiya Şahê İranê şermezarî û rexneyê tund ji layê meşrûtexwazên İranî ve li Tewrêz û Tehranê hatin kîrin. Kuştina Cafer Axayê Şikak hêrs û dijminatiya kurdan li dijî dewleta Qecerî zêde kir. Daxbariyeke mezin xiste dilê kurdên Kurdistanê. Ev daxbariya kurdan, ji ber vê bûyerê di stranên beytbehêjîn kurd de tê dîtin.

Mihemed axa (Bavê Cafer axa) li Stenbolê

Piştî kuştina Cafer Axayê Şikak, barê ramyarî li Kurdistanê teşeyekî şewandî bi xwe ve girt. Mihemed Axayê bavê Cafer Axa giliyê xwe bire cem Siltanê osmanî (Ebdilhemîd 2). Siltan Ebdilhemîd gelek soz û bîyarêne hevkariyê ji bo tolhidanê ji İraniyan bistîne dane wî. Mihemed Axa li stenbolê bi rewşenbîrên kurd re kete têkiliyê. Bi taybetî xortêne Bedirxanî bandoreke mezin li ser wî çêkirin. Ev danûstandinê serokêlê eşîreta Şikak ji çavê kargeriya parastina (îstixbârat) Osmaniyan dûr nebû. Ji bo wan tirseke mezin bû. Dema didîtin du malbatêne kurd ên mezin di gel hevdu pêwendiyê dos-taniyê girêdidin diketin nav metirsiyê. Bi taybetî jî ger ev pêwendî bi Bedirxaniyê ku di seranseri Kurdistanê de rûmet û qîmeteke mezin di nava kurdan de didîtin re bîhata danîn metirsî bêhtir zêde dibû. Ji bo împaratoriya Osmaniyan Bedirxanî di

*Cafer Axa bi heft
siwarênen xwe yên
navdar û mîrxas re, ji
Dilêmanî xwe gihad
Tebrîzê. Piştî cil rojan
ji Tehranê destûra
kuştina Cafer Axa ji
hêla Mihemed Şahê
Qecerî ve gîhişte destê
NizamEl Seltene. Bi
pilaneke bêbext ve
Cafer Axayê birayê
Simko di qesra
hikumdaîiya veliehtê
(cîgirê) İranê de, li
bajarê Tewrêzê
(Tebrîz) bat kuştin.*

Kurdistan de hêzeke dijber dihatin hejmartin. Li Cizîra Botan Birca Belek wargeha hikumdariya wan a mêtûyî bû. Ji aliye din jî dizanibûn ku li Kurdistanâ û Iranê eşireta Şikak demeke dirêje ku xwedî deşhilatdarî ye û ji bo dewleta ûraniye. Ev karê eşireta Şikak bi dilê Osmaniyan bû. Ji ber ku Osmaniyan jî dijminên ûraniyan bûn. Lê yekgirtina wan du malbatê kurd bi dilê Osmaniyan nebû.

Têkiliyên Mihemed Axayê Şikak bi Bedirxaniyan re ji bo ûmparatoriya xwe baş nedidîtin. Bi peymana Qesr û Sirînê di sala 1639 an de Shah Ebasê Sefewî û Siltan Miradâ Osmanî Kurdistan kiri-bûn du par. Li herêmên rojavaya Gola Ûrmîyê û herêmên Hekarî wan û cihêndin mîna berê kurdan ci (tu) qîmet nedidan sînorê destçekirî. Gelo eger Bedirxaniyan kurdê Rojhilatê Kurdistanê û bi taybetî êla Şikak bikişandana li dijî Osmaniyan, bikişandana aliye xwe wê barûdoxa (rewş) Kurdistanê û helwesta kurdan li hemberî Osmaniyan bi ci rengî bibûya? Ev pirs kete serê Osmaniyan û bi planeke Mihemed Axa li Stenbolê winda kirin. Piştî wê hindê, gelek kurd jî hatin girtin. Mîna ku rîspiyyê Şikak û mirovîn ku nêzîkî malbata Simkoyê Şikak dibêjin, Mihemed Axa dixwast hîzr û bîra Bedirxaniyên niştimanperwer li Kurdistanê di bin destê ûraniye de jî belav bikin. Ji ber wê hindê, bi planeke û bi

bêbextî di keştiyekê de li ser Derya Spî bi hinceta geşt û gûzarê bi destê Osmaniyan hat kuştin. Û kîna tirkan jî kete dilê vê eşireta kurd.

Simko bû serokê giştî yê êla Şikak

Simko lawekî jêhatî, siwarekî zîrek û di kar û barê şer de gelekî şareza bû. Ew di sala 1886 an de li Çariyê ji dayika xwe bû. Piştî brayê

*Bi kuştina Cafer Axa
re, êla Şikak bê serok
mabû. Ji ber vê hindê,
rîspiyyê êla Şikak kom
bûn. Simkoyê bîst û
yek salî û ciwan ji bo
serokatiya eşireta
Şikakan bat
bilbijartîn.*

xwe Cafer Axa di nava kurdan de bi taybetî kurdê herêma Somayê, Makû û Şînoyê de gelekî bi hurmet bû. Bi kuştina Cafer Axa re, êla Şikak bê serok mabû. Ji ber vê hindê, rîspiyyê êla Şikak kom bûn. Simkoyê bîst û yek salî û ciwan ji bo serokatiya eşireta Şikakan bat bilbijartîn. Şikak bi xwe jî du mil in. Yek: Ebboyî ku malbata Simkoyan ji pisaxayê Ebboyî bûn. Du: Kardarî ku di bin serokatiya Emer Axayê Şerîfi de heyâ

dawiya şoreşa Simko bi hemû awayî hevkariya dijmin kir. Lê xiyaneta Emer Axa bû sedema wê hindê ku Kardarî bi giştî li dora Simkoyê Şikak kombibin. Xalê Mîrzê, wezîrê Simko ji mezin û aqildarê hemû eşireta Şikak şewirmendiyek pêk anî û her karê Simko dikir. Di pêsiyê de di gel şiwêra xwe dikete danûstandinan. Yanî xalê Mîrzê mîna serokwezîrekî di rîberatiya şoreşê de roleke mezin dileyîst. Baweriya kurdan bi dewleta ece-man şikestitbû û Simko dixwast heyfa xwe ji dewleta ûraniye bistîne. Bi vî rengî, şer û êrişen dijwar dest pê kirin. Bi şiklekî berbelav ji 1907 an heya 1914 an ku Şerê Cîhanê yê Yekem dest pê kir, herêmên rojavayê Gola Ûrmîyê di nava her du hêzan de dest bi dest dibûn. Yanî carinan di destê hêzîn kurd de bûn, carinan jî diketin destê dewleta ûraniye. Derdê mezin ê dewleta navendî ya ûraniye (Qeceriyan) serhildana kurdan bû. Mêjûnivîs, general û serleskerên dewleta ûraniye jî di rojenivîs û pir-tükên xwe de vê rastiyê beyan dikan. Karê Qewamûl Seltene yê çewt (xiyanet bi serokê eşireta Şikak, Cafer Axa) tawanbar dikan. Ji ber ku sedema mezin a destpêkirina şer û serhildana kurdan li herêma Ûrmîyê kuştina Cafer Axa bû.

Simko di nava du rengê jînê de

Bi dîtina min jiyanâ Simko

dibe du beş: Beşa yekemîn ji 1907 an pê de û ciwanekî bîst û yet salî bû û zêde bi kar û barêni siyasî û kurdayetteyiê nasyarî peyda nekiribû. Tenê di fikra wê hindê de bû ku ji dijminên bav û brayên xwe bi awa û rewiştâ eşîrî tolê bistîne. Lê di beşa du-wemîn a jiyana xwe de du ronakbîrên kurd ên navdar bandoreke mezin li ser bîr û baweriyên wî çêkirin. Yek Seyîd Tehayê Geylanî ji binemala Sadatê Nehrî û Ebdilrezaq Bedirxan ji malbata bi nav û deng a Bedirxaniyan. Em dibînin li her derê Kurdistanê gelê kurd serhilda-nekê çêdiķe, rewşenbîrekî Bedirxanî xwe digihînê û bi her awayî hevkariya şoreşê dike. Li jêr bandora wan du kesên niştimanperwer guherandineke bingehîn di bîr û rayên Simkoyê nemir de çêdikin. Helbet hêjayî gotinîye ku ev pêşengê kurd di destpêka jiyana xwe ya ciwanîyê de wekî hindek dostêni wî dibêjin, tim û tim ji bo pêkanîna dewleteke kurd û rizgarkirina gelê kurd ji bin destê dagirkiran, têkoşîn kiriye. Ji ber ku didît ji binemala wî bav û kal û brayên wî tenê ji ber ku daxwaza mafekî rewa ji bo kurdan kirine, tev bi destê ece-man hatine kuştin. Heke em barûdoxa kurdistanê ya heşte sal berî niha bîniñ ber çavêni xwe, em dê bizañibin ku di wê demê de vî sêrokê kurd bi şeweyên rêkûpêk şerê xwe yê partizanî û çepêrî kiriye.

Şerê cîhanê yê yekemîn û Rojhilatê Kurdistanê

Di Şerê Cîhanê yê Yeke-mîn de hêzên Îranî bi giranî ketin ber êrişên şervanên kurd. Herêmên Ürmiye, Selmas, Makû û derdora bajarê Xoy ketin destê hêzên Kurdistanî. Ürmiye mîna serba-jarê dewleta Simko hemû dem û dezgehêن dewletê hatin damezirandin. Ji bo cara yekemîn di Kurdistana Rojhilat de Ebdilrezaq Bedirxan yekemîn rojnameya kurdî bi navê Roja kurd ku rojnameyeke mehane bû bi du ziman-an kurdî û farisî dihat weşandin. Di rojnameyê de helwesta şoreşa kurdî û aga-hiyen eniyênen şerê kurdan di

*Ji bo cara yekemîn di
Kurdistana Rojhilat de
Ebdilrezaq Bedirxan
yekemîn rojnameya
kurdî bi navê Roja
kurd ku rojnameyeke
mehane bû bi du
ziman-an kurdî û farisî
dibate weşandin. Di
rojnameyê de helwesta
şoreşa kurdî û
agabiyen eniyênen şerê
kurdan di gel Îranê
dihatin weşandin.*

gel Îranê dihatin weşandin. Piştî dûrxistina Ebdilrezaq Bedirxan bi destûra Tizarîyen (Çar) Rûs Simkoyê Şikak berpirsiyariya derxistina rojnamê girt stuyê xwe û Mamoste Turcanîzade bû sernivîsar û derhênerê rojnameya Roja kurd. Ev rojname heyâ sala 1914 yan hatiye weşandin. Mamoste Cemal Xeznedar di pirtûka xwe ya bi navê Rojnameya Kurdistanê de dibêje; "Kurdistan kovareke mehane bû ku di Ürmiyê de ji layê Ebdilrezaq Beg Bedirxan ve dihat weşandin. Piştî dûrxistina Bedirxan ji Ürmiyê ji aliyê Tizarê (Çar) Rûsî ve, berpirsiyariya weşandina wê kovarê İsmail Axayê Simko girt stûyê xwe û heyâ sala 1914 yan bi du ziman-an, kurdî û tirkî (ezerî) hatiye weşandin. Ev rojname an jî ev kovar di çaxê hukumdariya Simkoyê Şikak de li Ürmiyê di çapxaneya Temedûn de dihat weşandin. Ser-nivîsarê wê yê giştî Mamos-te Tûrcanîzade bû. Vî rewşenbîre kurd bi destûra Simko ev rojname mîna organa fermî ya dewleta kurd li na-va Kurdistana Îranê belav kiriye. Lê sed heyf û mixabin, heyâ niha ci nisxeyen vê kovarê nehatine ditin. Piştî Ri-za Şah û hêzên Îranî di sala 1926 an de ji nû ve Kurdistan dagir kîrin, hemû şûne-war û berhemêni ku bêhna kurdayetiyyê û Kurdistanê ji wan dihat, bi yek carî winda kîrin."

Di dema hukumdariya Simko de li Ürmiyê yekemîn xwendengeha kurdî di navbe-

ra salên 1912 û 1914 an de bi destê Ebdilrezaq Bedirxan li bajarê Xoy û bi piştgiriya Simkoyê nemir hat damezîrandin. Di merasîmeke fermî de, bi besdariya Simko, Se-yid Teha, Ebdilrezaq Bedirxan û mamossteyên olî yên kurd axa û begên herêma Selmas, Xoy û Makû amade bûn, xwendegeh hat vekirin. Zarokên xwendegehê jî bi rîz û bi cil û bergên paqîj û xweşik di pêşîya besdarêner merasîmê de rawestiyabûn. Bi rêjeya siwarêner kurd, şahiya vekirina xwendegeha kurdî dest pê kir. Li ser girîngîya xwendinê, mamossteyên kurd axifîn. Di wî çaxî de û wan derfetên kêm, yekemîn xwendegeha kurdî dest bi karê xwe kir. Ev du kar di şo-reş û serhildana neteweyî ya Simko de û di hal û mercen wî çaxî de girîngîrîn û me-zintirîn kar têne hesibandin.

Hatina Riza Xanê Mîrpênc û destpêkirina şerên giran ên hêzên Iranî û Kurdistanî (1920-1926)

Şoreşa Simko ji 1920'an pê de rengekî seranserî û berbelav bi xwe ve girt. Ehmed Şahê Qecarî (Şahê Qecarî yê dawiyê) li hemberî hêzên şoreşger ên meşrûtexwaz (azadîxwaz) gelekî la-waz û bêçare mabû. Ingiliz hatina meşrûtexwazan a li ser hikumdariyê ji bo berjewendiyênen xwe yên kolonî mîna metirsiyeke mezin di-hesibandin. Ingiliz casûsên xwe yên Iranî û Ingilizî pê

dihesînin ku mirovekî peyda bikin da ku bi şeweyêñ ew dixwazin hikumdariyeyeke qa-şo li Tehranê damezirînîn û berjewendiyênen wan di Iranâ dewlemed û xwedî çavka-niyêñ nift û madenêñ kevir de bêne parastin. Riza Xanê Mîrpênc ku mîna Qezaxekî Rûsî di bajarê Qezwînê de Emîrhêzek bû ji bo vî karî hat hilbijartîn. Berpirsiyarê Ingilistanî danûstandinan bi

Riza Şahê Pehlewî
PanÎranîstekî dijwar bû, wî dixwest Iranê ber bi pêşve bibe. Lî ew pêşketinêñ ku gelên Iranê dixwastin nebûn.
Hevsarê vîna Şahê Iranê yê nûhatî di desten kolonyalîstên Ingîlîz de bû.

wî re çedîkin û Riza Xan mercen Ingilîzan dipejirîne Riza Xanê Mîrpênc bû şahê Iranê û bi navê Riza Şahê Pehlewî di 1922 yan de li ser textê seltenata Iranê rûnişt. Ehmed Şah jî ku li sefera xwe ya Ewrûpa bû bi destûra Ingilîzan ci (tu) car nikaribû vegere Iranê.

Riza Şahê Pehlewî PanÎranîstekî dijwar bû, wî dixwest Iranê ber bi pêşve bibe. Lî ew pêşketinêñ ku gelên Iranê dixwastin nebûn. Hevsarê vîna Şahê Iranê yê nûhatî di desten kolonyalîstên Ingîlîz

de bû. Di bakurê Iranê de şo-reşek germ û bi hêz di rêberiya Mîrza Kûçekxanê Cengelî de hatibû birêxistin, di Kurdistanê de jî Simaî A-xayê Şikak hêzên kurd ên welatparêz li dora xwe kom kiribûn. Van herdu şoreşan jî bandorek mezin ji şoreşa Oktobera 1917 an ya Yekitiya Sovyeta standibû. Lî şoreşa Kurdistanê berfirehtir û bi hêztir bû. Şoreşa Mîrza Kûçekxanê Cengelî li Reşt û Gîlanê (bakurê Iranê) bi giştî di bin bandora Şoreşa Oktobera 1917 an de bû. Ala sor li her derê hatibû hildan, ev serhildana ku ji aliyê gel ve destek didît ji bo berjewendiyênen Ingîlîzan xeterek gelek mezin bû. Kurdistan jî ji Makûyê heya Saqiz û Banê di bin otoriteya şer-vanêner kurd de bû. Riza Şahê Pehlewî li hemberî du şo-reşen mezin bû: Şoreşa Kurdistan û şoreşa bakurê Iranê. Di herdû herêman de jî ji bo şerê partîzanî şert berfireh bûn. Kurdistan herêmek ci-yayı bû, Bakurê Iranê jî herêmek bi giştî daristan û çiya bû. Lî ev du herêm ge-lek ji hev dûr bûn. Azerbey-can dikete nava Kurdistan û bakurê Iranê. Di pêngava yekemîn de Riza Şahê Pehlewî bi hemû hêzên xwe êriş bire ser hêzên şoreşker ên bakurê Iranê. Lî di êrişâ yekemîn de hêzên Şahê Iranê bi giranî şikest xwarin. Riza Şahê Mîrpenc ji kurdên başûrê Rojhîlatê Kurdistan (Hêrê-mên Sine û Kirmanşah) doza hevkariyê kir, Xalo Qurbanê Ciwanrûdî ku serokeşirekî kurdên herêma Ciwanrûd bû,

çû li ba Riza Şahê Êرانê. Da-nûständin di gel hev kirin. Riza Şah soz da Xalo Qurban ku heke serê Mîrza Kû-çekxan bibe û pêşkêşî wî bi-ke, dê pileya serhengiyê (al-bay) bide wî. Xalo Qurbanê xayîn jî bi gotina; Ez xulamê Şahê xwe me û fermana te bi can û dil dipejirînim û hêzên xwe ji Ciwanrûd ber bi ba-kurê Êranê rêxist. Diyar e kurd di şer û cengan de ge-lek zîrek û şervan in. Bi beş-darbûna hêzên Xalo Qurbanê xwefiroş di demek kurt de hêzên Mîrza Kûçekxan tûşî şikestê bûn. Yekitiya Sovyetê jî bi girêdana proto-

kola kirîn û firotina neftê di gel Êranê pişta şoreşa Cenge-liyan berda. Şerên giran û demdirêj derketin. Lê hêzên Mîrzayê Cengelî bi giranî şkeste xwarin. Rêberê şoreşê di gel çend kes ji siwarên xwe ber bi çiyayê bilind ên Bakurê Êranê vekişiya. Şkes-tek giran ketibû nava refêş şoreşgeran. Xalo Qurban gund bi gund di gel hêzên xwe yên taybet kete dû Mîrza Kûçekxan. Zivistanek sar-bû, berfê herder girtibû. Wî dixwest xwe bigîhîne cem serokê kurdan li Ürmîyê. Lê rîyek pir dûr bû. Sir û se-qemê edî tu hêz di laşê wî de



M.Berzenî

*Li Kurdistanê jî
çeperên şer
batin peyt
kirin. Amir, hêz
û karbîdestêñ
tizarı (çar) yên
Ûris ku ji ber
Bolşewîkan
reviyabûn,
rêbertiya
leşkerên Êranê
girtibûn destê
xwe û Îngîlîz jî
bi hemû
derfetêñ xwe li
dijî şoreşa
Kurdistanê destê
hevkariyê
dabûn Riza
Şahê Pehlewî.*

nehîştibû, sîxûrêñ gerîdok termê wî yê nîvcan di daris-tanekê de peyda kirin. Ew a-nîn gundekî û pêşkêşî Xalo Qurbanê caş kirin. Wî jî bi saxî serê mîrza kûçekxan bi dasê jê kir û li Tehranê di koşka sultaneta Riza Şahê Pehlewî de pêşkêşî wî kir. Xalo Qurban bi pileya Ser-hengiyê, pere û bi xelatêñ din hate xelat kirin. Xalo Qurban kurd bi xiyaneta xwe ya dîrokî derheqê ser-hildana Cengeliyan laperêñ bi xwîn yên dîroka azadîx-waziya gelê kurd lekedar kir, Îraniyêñ azadîxwaz û meşrû-texwaz ji vê kirina axayekî kurd gelek xembar bûn. Helwesta xwe li dijî vî karê çewt di rojname û xebernamayan de derbirin û ev karê Riza Şah û xulamokêñ wî şermezar kirin. Ji bo Riza Şahê Pehlewî û tesbîtbûna hikumdarîya wî tenê asten-gek mabû: Şoreşa gelê kurd li Kurdistanê. Rojnamêñ ku li paytexta Êranê dihatin we-şandin her roj nûçeyên şerê dijwar di navbera kurdan û hêzên dewletê de dinivîsan-din, xembariyek mezin li ser koşkîn hikumdar û karbîdestêñ Tehranê hakim bûbû. Riza Şahê Mîrpênc pişti şiwra ku di gel Axayêñ xwe (Emrikanî Îngîlîzan) çêkir, hêzên xwe ji bo êrişa giran a li ser Kurdistanê amade ki-rin. Li Kurdistanê jî çeperên şer hatin peyt kirin. Amir, hêz û karbîdestêñ tizarı (çar) yênÛris ku ji ber Bolşewî-kan reviyabûn, rêbertiya leş-kerên Êranê girtibûn destê xwe û Îngîlîz jî bi hemû der-fetêñ xwe li dijî şoreşa Kur-

distanê destê hevkariyê da-bûn Riza Şahê Pehlewî. Bi vî rengî leşkerên giran ji Tehran û Tebrêzê ber bi navenda hikumdariya kurdan (Ürmiye) û herêmên din hereket kir.

Êrişa Hêzên Simko ya Li Ser Mehabadê

Hêzên Îranî êrişa xwe ya giran li ser Kurdistanê dest-pê kirin. Serê yekemîn li Sel-

Kurdistan ji bo wan bûbû gola xeniqandina bezaran leşkeran. Ji ber vê yekê êrişeke berfireb li ser Kurdistanê destpêkir. Di rojê destpêka şer de, berxwedana şervanêñ kurd zaiyatêñ mezin dan dewletê.

masê (Dîlman) dest pê kir. kurdan bi giranî hêzên dewletê têkşikandin, kuştiyêñ dewletê zêde bûn. Di sala 1922 an de hêzên Simko bi serokatiya Emîrhêzê şoreşê yê navdar Seyîd Tehâ Gîlanî êriş birin ser Mehabadê. Bi giştî 600 jenderman li Mahabadê parêzvânî dikirin. Şervanêñ kurd ji her hêlê û li hemû herêman (Şikak, ji dêdora Ürmîye, Herkî ji Mîrgewer û xelkê herêma Mukriyan) ji bo azad kirina Me-

habadê ji destê hêzên Îranê şerê giran destpê kirin. Ji jendermên di şer de tenê ke-sek xelas bû. Ewêñ din tev hatin kuştin. Serleşkerê giştî yê artêşa Îranê Riza Xanê Pehlewî ji bo serkut kirina şoreşa Simko dîsa daxwaza yarmetiyê ji Xalo Qurbanê xwefiroş û caş kirin. Xalo Qurban bi siwarêñ xwe yên şerker di gel hêzên leşkerê Îranî li derveyî şarê Miyan-duabê ji bo êrişa giran li ser Mehabadê û derxistina Mehabadê ji destê şervanêñ kurd haziriya xwe dikirin. Fermandarê leşkerên kurd Seyîd Taha pêşdestî kir û êrişâ kurdan bo ser çeperên hêzên Îranî destpê kir. Dî yekemîn teqîna tivinga şer bi guleya tivinga şervanekî kurd bi navê "Suvarê Ehmedî Gulab Axe" Xalo Qurbanê ku Emîrhêzê giştî yê hêza İraniyan bû, ji ser pişta hespê xwe ket xwarê û hat kuştin. Bi kuştina wî reva mezin ket nava hêzên İraniyan. Şervanêñ kurd jî pişti kuştina gelek xwefiroş, leşkerên dewletê û bi destxistina çekêñ sivik û giran heyaradeyeke bilind. Pêwistiyen xwe yên şer kirinê bi dest ve anîn. Ji Makoyê heyâ herêma Mûkriyan û herêmên Saqiz û Banê gelê kurd bi vê serfîraziyê şad bû. Gel pîrozbahiya hev dikir. Ji ber ku hem xayînekî mezin (Xalo Qurban) hatibû kuştin, hem jî erdê Kurdistanê zêdetir ketibû destê şoreşgerên kurd. Bi kuştina Xalo Qurbanê kurd û xulamokêñ dagirkiran aza-dîxwazêñ Îranî jî gelek şad bûn. Ji bo kurdan û dîroka

wan a bi xwînê avdayî ev ka-rekî gelek girîng bû. Xayîne-kî kurd bi destê xebatkar û a-zadîxwazêñ kurd hatibû tune kirin. Serê Kurdan bilind bû-bû. Rizaxanê Mîrpenc ketibû deravêñ tengaviyêñ mezin. Bi hêztirîn û zîrektirîn şer-vanêñ wî (Xalo qurbanê Kurd) bi destê hêzên Îranî hatibûn kuştin. Bi sedan leşkerên wî ji nav çûbûn. Nizanibû wê vê pirsgirêka mezin çawa çareser bike. Ji Simko û hêzên Kurdistanî doza hevdîtinê kir lê baweriya Kurdan lê nedihat. Hevdîtin nehat pejirandin. Simko bi destxistina Mehabadê û herêmên din gihiştibû gelek armancêñ xwe. Ji %50 yê xaka Rojhîlatê Kurdistanê ketibû destê wî. Ji bo her şar û herêmekê hukumranek hatibû hilbijartîn. Di paytexta Kurdistanê de (Ürmiye) rojnameya Roja Kurd (Kurdistan) her meh dihate weşandin. Simko bi şîwra xwe ya berfireh ket dan û standinê. Haziriya ra-gihandina dewletek Kurdî ya serbixwe di dînyayê de dihat kirin. Xalê Mîrze şêwirdarê herî nêzîk ê Simko (Xalê wî) mirovekî bi tedbîr û pir zana bû, heta dawiya temenê xwe li gel Simkoyê nemir jiyana xwe berdewam kir. Ew di dema xebatê de mîna wezîrekî bi serokê şoreşê re dixebeitî. Bi awayekî fermî û mîna deshilatdarekî bi hêz xebitî. Ji sala 1921ê heta 1925 an Simkoyê Şîkakî xwedî her tiştî bû. Ji 1925 an pê de Ingîliz û Emerîkayiyan ji her hêlê ve Riza Şah bi hêz kirin. Artêşek nûjen û xwedî hemû cûre amrozêñ şerkirinê

xistin xizmeta artêşa Îranê. Dîsa artêşa Îranê li ser Kurdistanê dest bi êrîşen giran kir.

Şerê dawiyê li Dileman

Kedxwirên Emerîkayî û Ingîlîzî ku dewlemendiyên ser erd û bin erdên xaka Îranê ya bi petrol û dewlemend dimêtin, herdem ji Riza Şahê ku hevsarê wî di destê wan de bû daxwaza çareseriya serhildana kurdan dikirin û ji bo vê armancê jî hemû derfetên pêwist ji bo wî amade kiribûn. Riza Şahê Pehlewî li hemberî kurdan gelek caran derbeyên giran xwaribûn. Şefen Mehabad, Miyandûab, Ürmiye, Selmas û Makûyê û hwd. ku artêşa Îranê toşî (beramberî) şikestên mezin bûbû tev li ber çavêن wî bûn. Kurdistan ji bo wan bûbû gola xeniqan-

dina hezaran leşkeran. Ji ber vê yekê êrîşeye berfireh li ser Kurdistanê destpêkir. Di rojê destpêka şer de, berxwedana şervanên kurd zaiyatên mezin dan dewletê. Lê bi xiyaneta xwefiroşen mîna Emirxanê Şerîfi û hindek A-xayê din li nêzî Dilmanê kurdan şikeste xwar. Simko ber bi kela Garye' ve, vekişya. Şer giran bû, dijmin ber bi kela Garya ve dihat. Berxwedanvanen Kela Garya zêdetir ji sê rojan bi dijminen dagirkir re şerekî giran kirin. Xiyaneta hinek xwefiroşen kurd û xedariya dijminen hov şervanên kurd û serokê şer neçar kirin ku xwe bigihênin Bakurê Kurdistanê. Sed siwarên mîrxas û leheng bi Simko re derbasî herêma nehriyê bûn. Xembariyek mezin ji bo serokê kurdan çebûbû. Xanima wî Cewahir xanîm bi destê leşkerên Faris hatibû kuştin. Kurê wî yê şes mehî (Tahir Xan) di reva ku çebûbû de winda bûbû. Zerar û ziyaneke mezin gihiştibû kurdan. Li bakurê Kurdistanê ku Kermalistên nîjadperest otorîteya bi xwîn rijandinê damezrindabûn, amhêzên artêşa tirk jî di şeveke tarî de êrîşek giran birin ser biryargeha hêzên Simko. Di vê êrîşâ giran de hemû zêr û tiştên giранbûha yên ku bi wan re bûn hatir alan kirin. Lê serokê şoreş, û hemû şervanên wî bi şiyarî û zîrekî şerê xwe heta dawiyê kirin û gelek leşkerên dewletê kuştin. Ev xiyaneta tirkan şewateke mezin xiste dilê Simko. Wî herdem dixwest ku tola

xwe ji dewleta tirkan bistîne.

Simko li başûrê Kurdistanê

Piştî xiyaneta Emirhêzên tirk Simko bi sed siwarê xwe ve ji riya Nehriyê xwe gîhand Rewandûzê. Şêx Mehmûdê Berzencî şerê xwe yê giran li dijî Ingîlîzan didomand. Li Sulêymaniye mîna şahêkî hukumdarî dikir. Ji bo kurdên Kurdistanâ Iraqê ku di germegerma şoreş û serhildanê de bûn, hatina rîberekî mîna Simkoyê Şikak ku bi salan bû li dijî du Şahên Îranê li Kurdistanê şer û şoreşek mezin li darxistibû dîlxweşiyek pir mezin û nûçeyeke girîng bû. Li şarê Sulêymaniye mîna ku di nîvis û rojenîvisen Remzî Qezaz û mamosteyê nemir Reşîq Hilmî dinivîsinin: Her dera şarê Silêmaniye bi gul û kulîkhan hatibû xemilandin. Şeqama Silêmaniye ya mezin ji aliyê hikumdarê kurd bi awayekî rîk û pêk hatibû paqijkirin. Şervanên kurd li du layêñ rî bi rîz râwestibûn û Emirhêzê dewleta kurdan tevli bend mezintirîn serokê kurdên Rojhilata Kurdistan ya wê demê bû. Bi gîhiştina Simko bo Sulêymaniye bi destûra şêx Mehmûdê nemir sê gulê top hatin avêtin û bi vî awayî li her dera şar şahî û kîfxweşîya hatina Simko destpêkir. Heta wê rojê rûniştvanen şarê Silêmaniye rojek ewqas bi coş û mezin di dîroka weletê xwe de nedîtibûn. Li rîbertiya navendî ya şoreşa Şêx Mehmûd Simkoyê Şî-

*Simko got: Bextê
dewleta eceman
tune, beya niha ci soz
û bîryarêñ xwe di gel
kurdan rast û durust
bi cib neanîne, ezê
biçim û bi wan re
bîkevîm gotû bêjê lê
dîsa jî baweriya min
bi eceman tune,
nebêjin ez ji eceman
ditîrsim lê Cefer axa
ji bîra min neçûye.*

kak jî carna cihê xwe digirt û di bara gelek tiştan de bi wî re şêwir dikirin. Li dûrî rojhilata Kurdistan Simko dest bi jiyanek tal kir.

Simko û Ingîlîz

Îngîlîzên kolonyalîst û kedxwir di dîroka azadiya gelê me de ji destpêkê heya roja îro tim û tim çend rû bûne û herdem bi xapandinê xwestekên gelê me tune kirine, di 1925 an de ku Îraq bi giştî di

destê wan de bû Şex Mehmûdê nemir bi helgîrasandina şoreşek mezin ev dagirkerên biyanî xistibûn nava astengên mezin û şoreşa Kurdistan nedîhişt. Ew nexşeyen xwe yên kolonî li Îraqê û bi taybet li Kurdistana ku kaniyên neftê tê de diyar bûn piyade bikin. Îngîlîzan ji aliyekî li dijî şoreşa Şêx Mehmûdê Berzencî şer dikirin. Ji aliyê din jî dixwestin serokê kurdên rojhilata Kurdistan ji bo xwestekên xwe yên gemar bikarbînin û li dijî meşa azadîxwaz a kurdan bikaranî. Bi vê mebesta qirêj "Major Suanîne" yê Brîtanî ji bo ku xwe nêzîkî Simkoyê Şikakî bike geleki têkoşıya. Lê ev serokê kurd ji berê ve bi plan û nexşeyen Ingîlîzan ên çewt hesiyabû ji ber wê sedemê bi şêwéyekî tund pêşniyareñ Majorê Ingîlîzi red kirin. Li Rewanduzê Seîd Teha bi ferманa Ingîlîzan fermandarî dikir. Seît Teha mîna ku hat gotin ji malbata sadatê nehriyê û di nav gel de malbatake bi rûmet bû Gulîzar Xanima keça Cefer Axayê şikakî (Braziya Simko) xêzana Seîd Teha xani-meke zana û gelek bi biryar bû. Simko demekê inêvanê Seîd Teha bû û Ingîlîzan bi hevkariyâ Seîd Teha xwestin xwe nêzîkî Seîd Teha bikin û wî bikşînîn bin deshilatdariya xwe. Seîd Teha di derbarê vê de bi Simko re şêwir kir, Simko ji ber vê helwesta wî gelekî ji wî zivêr bû. Simko dema bi nûnerê Brîtanî "Major Suanî" re hevdîtinan çedike wiha dibêje: Ger hun

Ingilîz ji kurdan hez bikin hun dê ji bo kurdan dewleteke serbixwe bi hêsanî avabîkin, lê hun dixwazin ku hêza kurdan tenê ji bo planê mêtînger bikarbînin. Ger hun dewleteke kurdan a serbixwe saz bikin ezê bi hemû hêza xwe bi we re bixebeitim lê hun derewan dikin. Tawanbarê mezin em kurd bi xwe ne lewre em di nav xwe de yekîti û hevkariyê pêk naynin, ji mezin û rêberên xwe hez nakin û di navbera xwe de şer dikin. Eger em yek bin tu dewlet nikare me têk bibe. Ez niha li dijî Şahê İranê şer dikim, hêzên dewleta İranê tu caran nikarin bi me re şer bikin lê hêzên we û Emerîkayıyan hevkariya wan kirin û ez têk çûm. Ji ber vê hindê ez tu carî bi we bawer nakim. Gotinê Simko yên rast ji nûnerên Ingîlîz re gelekî tal hatin ji wî re gotin: Bi hevkariya me tu dikanî xwe teslimî Riza Şah bikî. Lê Simko dîsa jî ji wan tore bû û bi torebûn ji wan dûrket. Bi vî rengî Simkoyê Şikak neket dafika siyaset û daxwaza Ingîlîzan.

Kuştina Marşîmûn û Kêmasiyêñ Serhildana Simko

Ürmiye û herêma der û dora wê ji berê ve heya roja îro cîwarê kêmnetewêñ wek Ermen û Asûran bû li Rojhilatê Kurdistan, bi taybetî jî Ürmiye û derdora wê bi kurdan re jiyana xwe didoman-din. Gelek nêzikahî di nav-

Tawanbarê mezin em kurd bi xwe ne lewre em di nav xwe de yekîti û hevkariyê pêk naynin, ji mezin û rêberên xwe bez nakin û di navbera xwe de şer dikin. Eger em yek bin tu dewlet nikare me têk bibe. Ez niha li dijî Şahê İranê şer dikim, hêzên dewleta İranê tu caran nikarin bi me re şer bikin lê hêzên we û Emerîkayıyan hevkariya wan kirin û ez têk çûm. Ji ber vê hindê ez tu carî bi we bawer nakim. Gotinê Simko yên rast ji nûnerên Ingîlîz re gelekî tal hatin ji wî re gotin: Bi hevkariya me tu dikanî xwe teslimî Riza Şah bikî. Lê Simko dîsa jî ji wan tore bû û bi torebûn ji wan dûrket. Bi vî rengî Simkoyê Şikak neket dafika siyaset û daxwaza Ingîlîzan.

bera çanda herdu neteweyan de tê dîtin. Di serhildana Simko de navbera kurdan û Asûriyan xerab bû. Di 1915 an de ku Jon tirkên faşist bi riya Alayên Hamîdiye li Tirkiye û Kurdistanê fermana Ermenan rakiribûn, Asûriyên ku li herêma Hekarî dijîn ji derfetê mifa wergirtin û xwe gihandin Rojhilate Kurdistanê ku ji Makûyê heta Saqiz û Banê di destê hêzên Simko de bû. Marşîmonê ku rîberê Asûriyan yê olî bû bi

hatîye dagirkirin. Niha ev erd di destê me de ye û ez dixwazim em bi hev re mîna brayan li ser vî erdî bijîn û ji xwe re dewletek serbixwe ava bikin". Lê Simko di dil de li van bîr û baweriyyê Marşîmon bawer nekir. Piştî Marşîmon ji malê derket û dawiya hevdîtinê hat, dixwast siwarî faytonê bibê di vê demê de bi guleya demanceya Simko hat kuştin. Bi vê işaretê şervanên ku di berê de xwe li ser banê xaniyan a-

tekê, Emîrhêziya şervanên eşîreta xwe dikir û di navbera van hêzên eşîretî de hevgirtineke bihêz tunebû. Lê di şerê dijî Iranê de ji bo girtina bîyargehê leşkerên Iranê hevkariyeke pir zêde di navbera eşîretan de çedîbû. Û wekî têzanîn hevkarî di van deman de ji bo şoreşê karekî gelek bisûd û baş e. Ev hevrikiya hêzên êl û eşîretên kurdan neyarên dagirker dixiste ser çokan û çeperên xwe berdi dan û direvin. Eşîretên Şikak, Herkî, Begzade, Celâli, Mengur, Mames, Milanî û Zilanî mezintirîn hêzên şoreşa kurdan ên wê demê bûn. Di dema şoreşê de jî fedakariyên mezin nîşan dan. Lê di nava van hêzên eşîri de eşîreta Herkî bi taybetî Reşîd Begê Herkî bi siwarên xwe ve heyâ dawiya şoreşê bi serokê xwe re meşyan. Ebdoiyî jî hêza taybetî ya serokê şoreşê bûn û di bin fermanên wî de şerîn herî giran li hemberî dijmin dikirin. Taybetiya herî balkêş a van eşîretan di wextê êrif û şerê di gel dijmin de ev bû: Siwarê pêşîya refen şervanen peroyekî reş, spî, sor, şîn, zer an jî kesk bi serê darekê ve girê dida û ev dibû nîşana hêzên wê eşîretê. Bo nimûne, eşîreta Herkî hêzên xwe bi aleke ku rengê wê reş bû didan na sandin û hêzên her eşîretê piştî girtina herêmek an jî bîyargeheke dijmin nîşana hêzên eşîreta xwe li wê derê diçeqandin. Bi vî rengî zîrekî û pileya şervaniya hêzên eşîretî ji bo rîberê şoreşê di hat xuyakirin. Helbet di bi-

Marşîmon bi dîtina bindek kesan çewtiyek tê hesibandin. Kêmasiya şoreşa Simaî Xanê Şikak a duwemîn nebûna artêseke rîkûpêk bû. Zêdetir ji bîst hezar şervanên kurd li dijî dewleta Iranê şer dikirin. Lê serokê her eşîretekê, Emîrhêziya şervanên eşîreta xwe dikir û di navbera van hêzên eşîretî de hevgirtineke bihêz tunebû. Lê di şerê dijî Iranê de ji bo girtina bîyargehê leşkerên Iranê hevkariyeke pir zêde di navbera eşîretan de çedîbû.

Ingilîz û Fransizên ku navenda hêzên wan li Bexdayê bû re dan û standineke xurî da nîbû. Asûrî û ermenên nişte cih di Ûrmîyê de ji wan piştevaniya xwe derbirin. Dîsa jî kurd li welatê xwe bûn amraz (amûr) ên destê biyaniyan. Di sala 1922 an de Marşîmûn ji Simko daxwaza hevdîtinê kir. Li Wêranşara Dilemanê (Selmas) Marşîmûn di gel 100 siwarê xwe bû mîvanê Simko û gotûbêjan dest-pêkir. Marşîmon ji Simko re got: "Erdê ku em li ser dijîn Kurdistan e. Lê ji layê dagirkeran ve

made kiribûn, her sed si warên Marşîmon bi çekan gulebaran kirin. Xebera kuştina Marşîmon gîhişte gûnê xwîşka wî Sirme xanimê ku li Ûrmîyê bû. Sirme xanimê ji bo tolhildanê şervanên Asûrî li dora xwe kom kirin û di Ûrmîyê de kurd û azerî bi hev re kuştin. Kuştina

Marşîmon bi dîtina hindek kesan çewtiyek tê hesibandin. Kêmasiya şoreşa Simaî Xanê Şikak a duwemîn nebûna artêseke rîkûpêk bû. Zêdetir ji bîst hezar şervanên kurd li dijî dewleta Iranê şer dikirin. Lê serokê her eşîre-

zava Kurdistanê ya wê demê de serokê şoreşê aleke neteweşî ji bo serhildana xwe çenekiribûn. Şoreş bi giştî xwedî aleke taybetî nînbû ku ev jî kêmâsiyeke din a şoreşê bû.

Simko çima Marşîmon kuşt?

Li ser sedemên kuştina Marşîmon gelek gotin hene. Min di sala 1995 an de li Ûrmiyê bi şervanekî Simko (Mamê Ebdî yê 125 salî) re hevpeyvînek çêkir. Di derbarê vê bûyerê de mamê Eb-

dî wiha got: "Roja kuştina Marşîmon baş di bîra min de ye. Piştî ku Marşîmon bi hejmareke zêde ji Asûriyên Hekariyê ji ber ferma ku Osmaniyan li dijî Ermenan rakiribûn hatin Ûrmiyê roj bi roj zordarî li ser serê Bisilmanan zêde kirin. Kurd û azerî ji vî halî westiyabûn û çend caran gilî û gazincênxwê birin cem Simko. Kîna kurd û Azeriyan piştî ku çend zilamên Asûri di Ûrmiyê de tûşî (tecawiz) pîrekeke azerî bûn, Rûspiyêncem cûn Çariyê û ji destê zordariya Asûriyan gilî kirin. Simko gelekî zivêr bû û bi bihîstina vê xeberê gelekî êşîya û got: Ez dê wan tembîh bikim û nahêlim bisilman ji destê wan nexweşîyan bibînin "Bi vî awayî ji sedemên kuştina Marşîmon yek jî bûyerê bi vî rengî bûn. Ji alyî din mîna ku Simko bi xwe piştî kuştina Marşîmon bi gelek kesan re peyiyyîve tê xuyan ku hatina Marşîmon a li Ûrmiyê ji bo hikumdariya xwe metirsî dihesibîne. Britanî jî ji doza Asûriyan xwedî derdikevin lê tu piştgiriyê nadîn kurdan. Bi dîtina min heger Marşîmon bi destê kurdan nehatîba kuştin wî yê serokê kurdan Simko bikuşa, ji ber ku Ingilîzan ji bo berjewendiyên xwe yên ahorî-ramyarî qet nedixwestin gelê kurd bi-be xwedî dewletek serbixwe. Dema ku Simko li Silêmaniyê bû sîxurên Ingilîzî hemû bizavêñ wî bi rapor ji dewleta Riza Şah re dişandin.

Şehîd ketina Simkoyê Şikak (pûşpera, 1930 an li Şîno)

Riza Şahê Pehlewî bi hevkariya axayên xwe (ingilîz û emîryalîstên Emîrikî) sal bi sal cihê piyê xwe xurttir dikir. Bi girtin, kuştin û kîyarênen hovane li hemberî aza-dîxwazîn Îranî û Kurdistanî disekekinî. Kurdistan ji her alyî ve xistibû gemaroyê. Hemu riyên pêşkeftina civakî, avedanî û bîrkariyê li ser welaletê kurdan girtin. Xwendegî, zanîngeh û navendêñ çandî li Kurdistanê pir kêm hatin sazkirin. Karistan û kargehîn şolkariyê ji bo ku karê aboriya gel geş nebe qet nehatin çêkirin. Xuyaye vê siyaseta kambax a dewleta Îranê hejariya çandî û xwendewarî di Kurdistanê de gelek zêde kir. Hebûna simko tim û tim ji bo dewleta navendî ya Îranê metirsiyeke mezin bû. Bi şikesta şoreşa wî Riza Şahê Pehlewî ji astengek pir mezin rizgar bû lê dîsan jî ji serhildxaneke din di Kurdistanê de pir ditirsiyan. Ji ber ku hêviya gelê kurd bi rîberetiya Simko gelek zêde bû û li benda vege-ra wî bûn. Serleşkerê giştî yê artêşa Îranê Emîrxan Tehmasibî li Kurdistanê bi destûra Riza Şahê Pehlewî ji Simâlxanê Şikak daxwaza hevdîtinê kir. Xurşîd axayê Herkî ji Deştebêlê çû Rewandiz û ev xwesteka dewleta Îranê pêşniyarî Simko kir û bi bawerîyeke mezin ji wî xwest ku di gel Emîrhêzîn dewleta Îranê bikeve gotûbêjan. Sim-

*Piştî ku Marşîmon
bi hejmareke zêde ji
Asûriyên Hekariyê ji
ber ferma ku
Osmaniyan li dijî
Ermenan rakiribûn
batin Ûrmiyê roj bi
roj zordarî li ser serê
Bisilmanan zêde kirin.
Kurd û azerî jî vî halî
westiyabûn û çend
caran gilî û gazincênxwê
birin cem Simko.
Kîna kurd û Azeriyan
piştî ku çend zilamên
Asûri di Ûrmiyê de
tûşî (tecawiz) pîrekeke
azerî bûn, Rûspiyêncem
cûn Çariyê û ji
destê zordariya
Asûriyan gilî kirin*

ko di gel şêwira şoreşê axivî lê şêwra şoreşê bi tevayî ji bo hevdîtinê razîbûn. Simko got: Bextê dewleta, eceman tune, heyâ niha çi soz û bîyarên xwe di gel kurdan rast û durust bi cih neanîne, ezê biçim û bi wan re bikevim gotû bêjê lê dîsa jî baweriya min bi eceman tune, nebêjin ez ji eceman ditirsim lê Cefer axa ji bîra min neçûye. Ji bo wî jî Qurana mor kîri şandin". Bi van axaftinan di gel siwarênen xwe ketin riya bajarê Şîno. Emîrhêzê giştî yê artêşa Îranê li Kurdistanê ji Ûrmîyê bi rengekî nehêni ji serheng (albay) Sadiqstan Nûrozi daxwaz kir ku li derveyî şarê Şîno biçe pêswaziya Simko û siwarênen wî. Simko di gel Xurşîd Axayê Herkî û Xusruxanê kurê xwe û bîst siwarênen din gîhiştin bajarê Şîno. Lê Sadiqstan Nûrozi bi tenê di gel leşkerên xwe hatin dîtina wî. Serokê kurd daxwaza dîtina serlesker Sertîp Hesen Muqedem kir lê berpirsyarê dewletê bi sedema wê hindê ku trimbêla Sertîp Hesen Muqedem ji ber kîmasyek teknikî di rê de xerab bûye, got serlesker iro nikare xwe bigîhîne vir. Simko zû bi derewa dewletê hesiya û xwest ku di pêsiya her tiştî de Sadiqstan nûrozi bikuje û bi vê niyetê çû mala wî lê dewletê pêşdestî kir û bi kemîna ku di berê de li ser çend riyan çêkiribûn re gule li Simko û siwarênen wî barandin û şerekî giran destpêkir, gelek leşker hatin kuştin. Xosroxanê kurê Simko di nava leşkerên Îranê de bi tenê mabû, Simko ve-

geriya ku kurê xwe ji destêwan xelas bike lê di vê navê de bi guleyên ku ji her alî li ser serê wan dîbarîn ev serokê kurd hat şehîd kirin. Bêbextiya dewletê li ser gelê kurd dîsa jî hat dubare kirin. Serokê yekemîn şoreşa netewî Simaîlxanê Şîkak jî gihiştî reza şehîdîn serxwebûna Kurdistanê. Şêx Mehmûdê Berzencî bi bihîstina şehîd ketina Simko gelekî xembarbû. Di hemû Kurdistanê de ev xebera bi pejare (kovan) di nava gel de belav bû. Dilê

dîroka azadiya gelê kurd de serhildana Simkoyê Şîkak cihekî girîng digire. Dijminen dagirker ên niştimana bav û kalêne me serokê kurd li rojhilate Kurdistanê de sîxur, rîgir û cudahîxwaz dinavînin. Heya roja iro jî dîroknivîsen Pan-Îranîst bi teskbîni serokê kurd yêmina Simko û pêşewayê nemir Qazî Mihemed bi xayîn û casusen biyaniyan di nîvîsen xwe de bi nav dikin. Lê ji bo civaka mirovanetiyê pîvan dîtina gel e. Qazî Mihemed û Simaîl Xanê Şîkak heyâ roja iro jî di nava gel de wek sembolên azadiyê têne besibandin.

Di dîroka azadiya gelê kurd de serhildana Simkoyê Şîkak cibekî girîng digire. Dijminen dagirker ên niştimana bav û kalêne me serokê kurd li rojhilate Kurdistanê de sîxur, rîgir û cudahîxwaz dinavînin. Heya roja iro jî dîroknivîsen Pan-Îranîst bi teskbîni serokê kurd yêmina Simko û pêşewayê nemir Qazî Mihemed bi xayîn û casusen biyaniyan di nîvîsen xwe de bi nav dikin. Lê ji bo civaka mirovanetiyê pîvan dîtina gel e. Qazî Mihemed û Simaîl Xanê Şîkak heyâ roja iro jî di nava gel de wek sembolên azadiyê têne besibandin.

dijmin pir xwes bibû. Li Tehranê û li Kaxa Sedabad bi besdariya Riza Şahê Pehlewî û gelek Emîrhêzen dewleta navendî ya Îranê cejn û şahî hatin lidarxistin. Bi vî rengî şahê bêbext ê Îranê fîkr û xiyala wî heyaradeyekê ji şoreşa Kurdistanê rehet bû. Ji ber ku lehengekî mezîn yêmina şêrîn ciyayên Zagros ji meydânê rakiribûn. Lê yêmina ku şairekî kurd dibêje: "Namîrin ewen di dilê gelê xwe de dijin."

Şehîdîn me jî nemir in. Di

hemed û Simaîl Xanê Şîkak heyâ roja iro jî di nava gel de wek sembolên azadiyê têne besibandin. Binaxeyê dîwarê welatekî serbixwe bi serhildana Şêx Seîdê Pîran, Simkoyê Şîkak, Seyîd Rizayê Dêrsimî, Şêx Mehmûdê Berzencî, Qazî Mihemed, General İhsan Nûrî Paşa û hwd. hatiye dariştin û di roja iro de şoreşa nûjen bi şerê giran ê gerîlayen kurd li dijî Jon tirkêñ faşîst awata (mebest) serhildana bav û kalêne me bi awayekî pratîkî digihîne rasityê.

(1)

Wergerandin Ci ye?

Bor Bi

Sazgehêna

Wur Ve

XALID MUHAMMED**Wergerandin Ci ye?**

Wergerandin emnazeke jîndarî, girîng e- seba pê ve gihîstina rewşenbîrî di nav mi- letan de û navîncîyeke xurtî, pêwist e ji dan, sitandin û nêzîkbûna wan re, lewra ew sînorêñ zimanî dişikîne û bi roleke gulvedanî, bajarîtî, nûjen û pêşketî radibe, ji ber'ku dergehêñ naskirinê di nav wan de vedike, di gel ku çandê ji zimanekî di- guhêze zimanekî din, û di vê navberê de jî giraniya cîwaziya⁽²⁾ zimanan sivik dike, lê dîsa ev “cîwazî vê guhestinê aloz dike” û astengan di riya bi serikirina vî karî de datîn e.

Wergerandina Bi Kurdi

Di van salêñ dawî de, gulvedaneke rew- şenbîrî pak li cem me, kurdêñ Sûrî, dest pê bû. Vêca nivîskar, zanyar û xwendeva- nan bêhtir berê xwe dane zimanê dê, û guhdaneke taybetî, mezin pê kirin, lewre pirtûk, kovar, rojname, komik, rûniştin û sevbuhêrkên wêjeyî, çandî pir bûn û dest bi hînbûn, xwendin û firehkirina zimanê kurdî bû, de qe ne xûyanîbe ku ziman di- kare vê qonaxa dîrokî, nûjen ragire. Wer- gerandin jî çalakiyeke hêja bû di vî warî de, lê mixabin hê jî ev kar li cem me, kurdêñ Sûrî, di nizimtirîn payêñ hunerî de ye ji ber van çend sedemêñ jêrîn:

1- Neyîna Sazgehêñ⁽³⁾ Rewşenbîrî:

Bi rastî em vê kêmasiyê ji hev re dikine serhevde⁽⁴⁾, bêyî ku xebateke hêja di ber- de bê kirin. Her weha jî çanda kurdî û ni- vîskarê kurd di nêrîna zar de derbas dibin, balo⁽⁵⁾ gelek ziyan wê bi van kelem û as-

1 Şêlûpêl, Fewda (Erebî)

2 Cîwazî: newekhevbûn, İxtilaf ('E)

3 Sazgeh: mu esseset ('E)

4 Serhavde: Kêmasî, neqîset ('E)

5 Balo: naxwe, êdî

*Di van salên dawi de,
gulvedaneke rewşenbirî pak li
cem me, kurdên Sûrî, dest pê
bû. Vêca nivîskar, zanyar û
xwendevanan bêhtir berê xwe
dane zimanê dê, û guhdaneke
taybetî, mezin pê kirin, lewre
pirtûk, kovar, rojname, komik,
rûniştin û şebubûrkên wêjeyî,
çandî pir bûn û dest bi hînbûn,
xwendin û firebkirina zimanê
kurdi bû, de qe ne xuyanîbe ku
ziman dikare vê qonaxa dîrokî,
nûjen ragire.*

tengan re bêñ. Helbet wergerandin jî ji van ziyanan ne dûr e.

2- Paşvemani⁽⁶⁾ û sistbûna Ferhangâ Kurdî:

Îro roj ferhenga kurdi, bi gelempêri, pir li paş e. Di gel vê jî qels û xizan e, tevî ku zimanê kurdi pir xurt û dewlemend e.

Vêca çawa wergêr dê havilbûneke ji ferhengeke wanî bike.

3- Nivîskarin paye xwe di ser wergerandinê re dibînin, ji ber ku ev iş, di nêrîna wan de, neabetî wana ye, ne jî hêjaye xwe pê bikin. Lê lohrê⁽⁷⁾ wergerandin wi-lo be, lohrê.

4- Nivîskarê qels û ne bi kêrhatî xwe di

vî karê hunerî, dahênan û mezin de derdi-xin bêyî ku tiştekî bi ser tiştekî xin bil ji kuştin û talankirina heybera danyar, wek kitikekê bi dîwarekî şahik ve bixirpiše.

5- Ev sedem bi dirfêñ⁽⁸⁾ wergerandinê ve tê girêdan:

Wergerandina bi kurdî, li Sûrî, bi van dirfêñ jêrîn hatiye naskirin:

a) Kêm wergerandin digihêjin asta biserketinê û hêja ne ev nav li wan bibe.

b) Bêhtirêñ wergerandinê bi kurdî ne yekser in:⁽⁹⁾ Anglo ne ji heybera bingehîn ser rast hatine wergerandin, lê ji wergerandin awê bi zimanekî din, an jî ji wergerandina wergerandineke dîtir.

Helbet ev reng ji wergerandinê ziyanê digihîne "peyam⁽¹⁰⁾ a wergêr"

c) Bi ser sistiya ferhengê de jî hin wergêr xwe bê seri, di sipêrinê, bêyî zanibin ku ferheng hew arîkariyê bi wergêr re dike, ne bêhtir. Ev ji layekî ve, lê ji layê din ve hin wergêr gotin bi gotin werdigérînin û wan dixine şûna hev de, bêyî bi bîra xwe bînin ku her zimanek taybetiya wî heye ci di rêziman de be, ci jî di şîwe û derbirê de be.

d) Wergerandina wêje, nexasim çîrok û helbest, xurtir û bêhtir e.

e) Bêhtirêñ wergerandinan ji zimanê e-rebi ye.

f) Deskarî⁽¹¹⁾ di wergerandina heyberan de pir û geleke:

Deskarî:

Kelem û astengêñ wergerandinê dihêlin ku wergêr deskariyê di peyama xwe de bike, çimkî pir caran li ber gotin, zarawê, an jî hevokekê diraweste belam nizane çawa

6 Paşvemani: texelluf ('E)

7 Lohrê: dûre, heyhat ('E)

8 Dirf: 'Elamet, sifet('E)

9 Yekser: Mubaşer ('E)

10 Peyam: heyber a ku tê wergerandin

11 Deskarî: teserruf ('E)

wergerîne, vêca bi peyamê dilîze û deskariyê tê de dike, lê berî wilo gereke wergêr melavan bike ku xwe ji deskariyê dûrxîne. Carinan jî wergêr zimên, li ser tunebûna hevvateyekê⁽¹²⁾, tawanbar⁽¹³⁾ dike, lew jê tê xwestin xwe pir biwestîne, “ji ber ku dibê ew hevvate di zimên de hebe” lê ewî nebihîstibe, îca hîngâ kêmâsi ji wî bi xwe ye.

Lê heger nedît, hîngâ destê wî jê re ye ku deskariyê bike, lê divê ji wate û angoyên heyberê dûr nekeve, deqene wê neguhere li gor xizaniya ferhenga xwe ya zimanî.

Çawa Gêre di Wergerandina Bi Kurdî de Heye?

Wergerandin guhestineke saz û rast e ji heybera danyarekî biyan re, lema ji wergêr tête xwestin ku vê heyberê xwes binase û li ber keve, berî ku dest bi karê xwe bike. Anglo divê berî her tiştî zana, bîrewer, jîr û rewşenbîr be, di gel ku bi her du zimanan xweş zanibe.

Lê heke em vegeerin çend berhemên wergerandî bi kurdî, li cem me, wê bê xuyanê bê çawa ev gêre di wan de belaqe se demê gelek tiştan, wek: Ne yek seriya wergerandinê û qelsiya wergêran bi zima-

nan û gelek tiştên ku me berî niha li ser deynkir. Êdî ka em riya sazkirinê bidêrin ji bo wergerandineke hêja û xurt li cem me bête peydakirin.

Ber bi Sazkirina Wergerandinê Ve:

Mercê⁽¹⁴⁾ pêşî ji bo sazkirinê bi asta zanîn û rewşenbîrî û xurtiya wergêr ve girêdayî ye. Paşê divê wergêr guhdanê bi xwendina xwe bike û tim û tim ferhenga xwe ya zimanî ferehtir bike. Bi ser wilo de jî divê di wê baweriyê de be ku ew li gorî vî işî ye û kirasekî kurdî li peyama xwe bike.

Ji bilî van mercan divê wergêr xwe nexe bin vegirtina zanyar de û wî jî nexe bin vegirtina xwe de, ango bi watên heyberê re be û wan bi zimanê kurdî biguhêze.

Dûmahîk:

Wergerandin îşekî bajarîftî, bi nirx û hêja ye lewre divê em vê rastiyê di ser guhêd xwe re nevêjin û xebateke hêja di vî warî de bikin, de qe ne em ji xelkên cîhanê dereng nemînin û dûr jî nekevin.

Dawî, çendî wergerandin saz be wilo jî ziman û raman wê sazbin.

12 Herwate: muradif ('E)

13 Tawanbarkirin: ittiham ('E)

14 Merc: Şert ('E)

Jêderk:

1- Kovara "AL-WAHDA" Ribat, El Maxrib, jimara 61-62, sala 1989 z.

2- Kovara "LOTUS" ya nîvîskarêن Asya û Afriqya, jimara 77-74, sala 1990.

3- Çend pirtûkên wergerandî bi 'Erebî û Kurdî.

Kirdar û kat le zimanî kurdî

1) Ser le barî ew kitêb û gotaraney ta êsta derbarey "kirdar û kat"î kurdiyan nûsiwe dû cor regiyan le kurdî da destnîşan kirduve
(2):

1.1– Regî kirdar ke legel pêşgirî "de" da û le komekî cénawî likaw pêk ra kirdarî katî êsta û dahatû daderêjin bo nimûne:

Çawk	regî kirdar	katî êsta/dahatû
Nûstîn	nû	denuwim
Bezîn	bez	debezit
Çûn	ç	deçûn
Mîrdin	mir	demirin
Pêçan	pêç	dêpêçim
Xistin	xe	dêxeyt

1.2– Regî çawk ke bê hîç amraz û pêşgir ya paşgirêk tenha be labirdinî "n"î çawk û pêwelikandinî ranawî likaw, kirdarî raburdû lê heldehêncêt, birwane heman nimûne-kanî jimare "1" le xiştey jimar "2" da:

[2]

Çawk	regî çawk	kirdarî raburdû
Nûstîn	nûst	nûstim
Bezî	bezî	bezit
Çû	çû	çûyn
Mîrdin	mîrd	mîrd
Nûsîn	nûsî	nûsiman
Pêçan	pêça	pêçam
Xist	xist	xistî

Aya be rastî dû cor regîman heye? Regî kirdar û regî çawk? Ci hoyek zimanewanî kurdî berew bawerêkî awha hele be kêş kirduve?

2) Be birway min dû ho zeynî zimanwana-nî kurdiyan be hele da birduve:

A– Têne xwêndinewey nişaney katî raburdû be regî kirdarewe likaw.

B– Legel ewe da ke zorbey herezonî regî kirdarî kurdî be çê yasayekî çespaw û negor heldehêncirên birêkiyan be zeqî diyardey bîzoy û le yasa ladaniyan pêwe diyar e.

Gotarem da hewl dedem, le berewe dû diyardey zeqî pey pênebirdû be xwêner biselmênim:

A– Kirdarî raburdûs be heman destûrî kirdarî êsta/dahatû amrazî aşkira û diyarı xoy heye û le şêwazî paşgirêkî likaw be regî kirdarekewe be derdekewêt.

B– Le kurdî da tenha û tenha cor regman heye, ewîş regî kirdar e. Bo selmandin û rûnkirdinewey ew mebeste û hasankirdinî lay xwêner pêwistîman be çend yasayekî seretayî heye:

2.1– Dirextî wişe: (4)



Wişes wek rîste dirextî xoy heye û her dirextêk le elqeyekî dayk û dû elqey bêçû pêk dêt. Deşêt her elqeyekî bêçûş wek elqey dayk dû bêçûy dîkey lê bikewêtewe:

Dayk

Bêçû bêçû

....

Detwanîn dirextî kirdarî kurdî bem şêweye darêjin:



Diyar e lêre da le “V” (verb) kirdarî kurdi ye, le “Vst” (verb stem) regî kirdar e. “Af” iş wate (affix) le pêş wişe da bêt, debête pêşgir “prefix” û be paşî wişe bîlkêt debête paşgir (suffix).

2.2- Yasay dû pelke (5)

A- Her liqêk le tenha dûpelke pêk dêt:

[8]

* V

(+pres katî êsta/dahatû)
(-t transitiv têper/têneper)
(+pers/num kes/jimare)

[5]

-B

V (+pres)	Af (+pers/num)
+transitiv	

V	V
Af	V Af
	Af V
	V Af

Af (+pres)	V (+transitiv)	-m
de-	X	-ît
		-et/at
		-în
		-n
		-n

B- Nîşane û paşgir û pêşirekan be rîze û yet le dûy yet be regî kirdarekewe delikên.

2-3- Yasay helzinan “Percolation”: (7)

A- Gişt xesletî elqekanî. xwarewe berew jûr heldezinên û qet xesletî elqe balakan berew bêçûwekan da naxizên.

B- Day gişt xesletî bêçûwekanî tê da ye, belam bêçûwekan tenha besêk le xesletekanî daykiyan tê da ye.

P- Nabêt xeslete cudakanî bêçûwekan dijî yet biwestinewe, wek tak û ko, yaxud nêr û mî.

C- Be pêy yasay helzinan, wek le xalî “B” da rûnman kirdewe, le kirdar da dayk xesletî bêçûwekanî werdegrêt û parêzgariyan pêwe dekat, belam le nêw û awelnêw çawk da xesletî diwa hemîn bêçûy dedat ke kirdarekey guzare le katî êsta/dahatû dekat, tîre kewaniyekan çûnyeti helzinanî xesletî bêçûwekan berew jûr pêşan deden. (X) yanî her regêkî kirdarî kurdî ke arezûy bikeyt:

3.2- Kirdarî katî raburdû:

A- Katî raburdû kirdare têper û têneper-kan be yarıdey paşgirî katî raburdû ke be regî kirdarewe delikêt, dâderêjrêt. Deşêt şîra-ney risteyekî serzarekî ke guzare le katî raburdû bikat, bem şeweyle darêjin:


[9]


V.....(V+Af+Af)
(+Past) (+pers/num)
(Raburdû) (Kes/jimare)

B- Le kurdî da pênc paşgirî cudawazman bo kirdarî raburdû heye, ke le sê vokalî “A,Î,Û” û dû konsonantî “D,T” pêk dêt.

P- Le katî raburdû da, paşgirî kes/jimare cudawazî le nêwan kirdare têper û têneper-kan da dekat û bew pêye hendêkiyan birêk goraniyan ber ser da dêt. Nimûnekani xwarewe dirextî ristey serzarekî kurdîman pêşan deden guzare le katî raburdû deken:

[10]





3-3- Cudawazî le nêwan katî êsta û raburdû da:

A- Morfêmî katî êsta tenha pêşgirî /-de/ ye, belam morfêmî katî raburdû pênc morfêmî cudawazan ke be pêy regî kirdareke degorê, ewanîş paşgirekanî kes/jimare “klîtîk” cudawaz in:

Paşgirî kesî sêhemî tak legel kirdare têneperakan da bem şeweyey xwarewen:

[11]

Katî raburdû	Katî êsta/dahatû
ø.....	/C.....êt
	/V.....at

Xiştey serewe pêman delêt:

1- Paşgirî kesî sêhemî tak legel kirdare têneperakan da le doxî êsta/dahatû da du cor in:

A- Eger diwa dengî regî kirdareke konsonantêk bû, ewa paşgirî kesî sêhemî tak debête /-êt/: (9)

[11-A]

Azad bo kurd desûtêt.

Kalê cil deşorêt.

B- Eger diwa dengî regî kirdareke vokalêk bû, ewa paşgirî kesî sêhemî tak debête /-at/ [11-B]

Azad derwat.

Kalê cil de deşwat.

2- Paşgirî kesî sêhemî tak legel kirdare têneperakanî doxî raburdû da, yêkeke lew paşgiraney hey û diyarî niye “Zero morphem” birwane riste bincî û serzarekiyanî dû wêney xwarewe berawirdiyan bike:

[11-P]

Azad nûs+t+ø	Azad nûst
nûs+t+ø	nûst.
[11-C]	
Min nûstim	Min nûst+t+m
nûs+t+m	nûstim

2- Legel kirdare têperekân da:

A- Bo kesî duhemî tak:

[12]

Raburdû	Êsta/dahatû
-t	-ît

Kuştit kuşt+t+t dekujtî de+kuj+ît
B-Bo kesî sêhemî tak:

[13]

Raburdû	Êsta/dahatû
î....	/C.....êt
	/V.....at
P ê	ç a
î pêç+a+î	depêçet de+pêç+êt
Birdî bir+d+î	debat de+be+at
P- Paşgirî koy gişt kesekan bem şeweyan:	

[14]

Raburdû	Êsta/dahatû
-man	-in kesî yekemî ko
-tan	-n kesî duhemî ko
-yan	-n kesî sêhemî ko

Helbet sîntank, wate yasay ristesazî, rêberî mîkanîzmî likanî wişekan dekat û be pêy yasayekî çespaw, wişekan be rêze le şwêni diyarîkirawîyan da cêgir dekat, berkar (object) le paşiyewe dêt, ewca kirdar (verb) dekewête şwêniyan, wate zimanî kurdî lew zimaneyeke be SOV nasrawin, yanî “Subject+object+verb” ewe yekêk e le xeslete here diyar û aşkirakanî zimane hêno-ewrûpâyiyan. Diyar e em yasaye riste serzarekiyekan nagrîtewê û le wan da yasate têk deşewêt û xirap qilp debêtewê, bo nimûne:

To minit nûsî nûsimît nûst+m+t
VOS

Min tom nûsî nûsimît nûsî+m+ît
VOS

Hêr ew mîkanîzme, ew yasaye desepênenê ke karay risteke û kirdarî risteke le rûy kes û jimarewe hawşan û guncaw bin, boye rêgey ewe nadat risteyek darêjêt kirdar yaxud kes û jimarey nebêt ya nîşaney kes û jimare kirdar “klîtîk” û karakey hawcût nebin, çunke ristey babete prînsîpi yasay sîntaks deşewênenê: û ristey neşiyaw desazênê.

3-4- Birêk gorankariy nacarî le hendek regî kirdar da:

Ewey bo rûnkirdinewe û mebestekey ême girîng bêt ew gorankariyanen ke be ser birêk regî kirdar da dên û le yasa giştiyeke layan deden û ew hokaraney ew aloziye desazênin bir û boçûnî hele deriskênin. Bo birwanîne hendek lew kirdar regane lem riste serzare-

kiyaney xwarewe da:

[15]

Vst Tense	(P/N)	Tense	Vst	(P/N)	
regî kirdar	Kes/jimare/kat	regî	kirdar		
Kes/jimare					
bir-d-î	birdî	de-b(e)	-at	debat	1-A
kir-d-î	kirdî	de-k(e)	-at	dekat	
mir-d-ø	mird	de-mir-êt	demrêt		
nar-d-î	nardî	de-nêr-êt	denêrêt		
nûs-t-m	nûstim	de-nû-m	denûm		11-b
xis-t-î	xistî	de-x(e)	-at	dexat	
bes-t-m	bestîm	de-best-t-m	debestim		
ges-t-m	gestim	de-gez-m	degezim		
çû-u-m	çûmde-ç-m		deçim		
bû-u-m	bûm	de-b-êt	debêt		
cû-u-m	cûm	de-cû-m	decûm		11-b
sû-u-m	sûm	de-sû-m	desûm		
Ew nimûney serewe ke dûfaqiy hendek reg deden, besék in le elomomorffi regî kirdarî kurdî. Ew diyardeye hendek car hokarî idyo-sinkratî (15) û hendek car hokarî (fonisyon) semantîkî heye, yaxud car care hendek yasaay morfoloqiy berpêgirîn, ba serincêkî dîkey nimûnekan dideynewe:					

[15-1-A]

bir- d- î	birdî	de-b(e)-at	debat
kir-d-î	kirdî	de-k(e)-at	dekat
mir-d-ø	mird	de-mir-êt	demrêt
nar-d-î	nardî	de-nêr-êt	denêrêt
Wek debînin doxî katî êsta/dahatû regî kirdarekanî “debat, dekat” goranêkî zeq û aşkirayan ‘be ser da hatuve, konsonantî /r/ serî tê da çûwe û le birîti wî bizwêni /e/ qut botewe û ewîş katî yekangîrbûnî legel nîşaney /at/î kesî sêhemî tak da serî têda deçêt, çunke bizwêni /e/ le berdem bizwêni /a/ da xoy pê ragîrnakrêt.			

Edî boç konsonantî /r/î nimûnekanî “demrêt, denêrêt” bew derde naçêt, her çende tewaw hawcor û lêkçûn? Wek le wepaş debînin, ew diyarde morfolojiye, hokarêkî semantîkî heye.

3-4-1- Karî karabizr (passive)

Karî karabizr le kurdî da ke likandinî mormî “ra” be regî kirdarekewe, dirust dekrêt, ke heman kat nîşaney katî raburdûşî pêkelpêke û be biray min bizwêni /a/ nîşa-


ney kateke ye. Diyar e be likandinî paşgirî kes/jimare ristikî serzarekiy katî raburdû desazêt ke şirazekey bem çeşney xwarewe ye:

V.... (V+Af+Af)
 V V
 (+Passiv) (+pers/num)
 (+Tense)
 Nûsrawim nûs-ra-m

Le doxî êsta/dahatû da /a/ wate /a/î nîşaney katî raburdû karabzireke, le rîgey pêşgirî “de” ewe û le kar dekewêt û nîşaney katî êsta zal debêt, çunke bûnî dû nîşaney dû katî [16-b]

V.... (Af+V+Af+Af)
 (+Tense) (+passive) (+pers/num)
 Denûsrêm de-nûs-rê-m

Goranî lew babete le birêk lew kirdaraneş da hest pê dekrêt nîşaney katî raburdûyan bizwêni /a/ ye û fonolojî rîgey sûtam sût-a-m
 desûtêm de-sût-ê-m
 Ke wate karabizrî kirdarekanî “bir-d” û “kir-d” (kird) bem şewaze desazên



Bo ewey dû konsonant /r/ nekewne dûy yek û haletêkî fonetîkiy giran û naqola nesazrêt, dû şêwa heye:

1– Yaxud konsonantinî /d/ dexizêndirête nêwam dû konsanteke û bewe zincîrey /r+r/ depisêndirêt wek xiştey xwarew pêşanman dedat:

[19]

O.....d/r.....r

Em xişteye pêman delêt dû konsantinî /r/ be dûy yek da hatin deşêt le hîçewe konsantêkî /d/ qut kirêtewe û bixizêndirête nêwaniyanewe (11)

2– Yaxud yekêk le konsantekanî le nêw debirên wek xiştey xwarewe boman diyar dehat:

20)

r.....O/C.....r

Xiştey serewe pêman delêt, ger dû konsonantî /r/ le dûy konsonantêk dîkey nîştîne ser yek, deşêt yekêkiyan le nêw berîn. Ke wate be yekêk lew dû yasaye, rîge lewe debestrêtewe ke dû konsonantî /r/ bikewne dûy yek dî belam lem halete da tenha yasay dûhem we ber degirêt:


(21)

Birram bir – ra – m.....bir – oa – m biram
Kirram kir – ra – m.....kir – oa – m kiram
Êstake hewl dedeyn yasay “denûsrôm” bo nîmûnekanî jimare “debat, dekat” be karbihênen:

(22)


de - bir - ra - êt debirrêt
de - kir - ra - êt dekirrêt

Ger bêt û be pêy yasay (20) yekêk le konsonante /r/ ekan le nêw berîn û her dû bîzwêni /a/ û /e/ xo be xo le yek da bitwêne-we, çunke her dûk yek xaletî fonetîkiyan heye, ew dema debînin kareke awhay lê dêt:



Ger regî kirdarekanî “birdin” û “kirdin” gorankariyan be ser da neyet, her be “kir” û “bir” bimênewe, ke doxî êsta/dahatûman lê dariştin, ew deme debînîn çî ser lê şewanêk desazênîn û dezanîn ew gorankarîyey be serîyan da hatuve, çon jîrbêjî û naçarî sepan-dûni. Wek pêşan gutman morfemî kesî/jîmare bo kesî sêhemî tak bo regêk ke be konsonant kotayıy hatîbêt, paşgîrî /êt/ e, belam bo regî be bizwêni kotayıy hatû /-at/ e.


Ke wate ger regeke goranî be ser da neyet, doxî êsta/dahatûy awhay lê dêt:




Wek debînîn çî le rûy morfolojî û çî le rûy fonolojiyewe, hest be hîç cudawaziyek le nêwan dû nîmûney pêşû da nakrêt, her çende le goşenîgay sêmantîkewe hêcgar lêk dûr û cudawaz in. Ta ew aloziye nesazêt, ew gorankariye le regeke da desepêtdena gwêgir, yaxud xwêner natwanêt tê bigat mebest karabzire ya katî êstay kesî sêhemî tak, boye regekan le “kir, bir” ewe debîne....“ke, be” ke wate wek debînîn, şêwazî gerdanî asayiy regî kirdarekanî “birdin” û “kirdin” be hoy şîrazey dariştinî karabzirewe berî pê girawe û helşêwêni rawe.

Lêre da pirsyarêkî be cê xo desepênet: Wa konsonantî /r/ serî têda çû, edî ew bizwêni /e/ ye boç qut debêtewê? Reng e xwêner yekewrast wa bîr bikatewe ke hokarêkî fonolojîy rût le pişt ew gorankariyewe bêt, belam ger be hewri têy birwanin, debînin ger bo kirdarı “kirdin” ew lêkdanewe ye rast bêt, e-wa bo kirdarı “birdin” hokarî sêmantîkî û morfolojîş dête pal û carekî dî regî kirdareke bew derde deben.

To birwane ger regî kirdareke her be ledestdanî konsonantî /r/dakewêt û tenha konsonantî /b/ wekî regî kirdar bimênetewe, ew deme doxî êsta /dahatûy kirdarî “birdin” aw ha denwênêt:




Wek debînîn ewe dekate doxî êsta/dahatûy kirdarî “bûn” û xwêner dextate gêjawewe, nazanêt daxo qiseker mebestî “bûn” e, ya-xud “birdin” boye bizwêni. /e/ le pal regî kirday “birdin” da qut debêtewê û lew sereğejeyesh qutarman dekat. Nîmûnekanî “demrêt, denêrêt” piştgîriy ew bangashayey pêşûman deken, çunke negorranî regekaniyan hîc sereğejeyek nasazênîn, darêjîn, debêt kareke le têneperewe bikeyne “Kausatif” (12) çunke tenha ew kirdareney şêwazî têperiyan heye, detwanrêt karabizriyan lê darêjrêt. Kirdarî têneperi kurdî, be hoy paşgîri “-andin” ewe dekrête kausatif:



Bo mebestî ême lêreda yasay “denûsrêm” girîng e ke risteyekî serzarekiy awhay lê de kewêtewê:

(27)
demrêdirêt denêrêt

Helbet le herdûk nîmûneke da bizwenekanî /e/ û /ê/ ke le rûy fonetîkiyewe her yek ìn, xo be xo le yek do detwênewe. Diyar e debêt eweş aşkîra bikem ke le nîmûney da nedetwanîn û ne pêwîstîş dekat hîc yek le konsonantekanî /r/ serîyan tê da biçêt. Natwanin çunke be ledestdanî yekêkiyan şêwazî karabizir le kirdareke desrîtewe, pêwîst nakat le ber ewey kewtûne dû birgey cudawazewe û zîncîreyekî ne pisawe pêk nahenîn û gokirdiniyan asan e. Ew ca ba le nîmûnekanî “denûsim, dexat” û “debestim, degezim” birwanîn û bizanîn legel lêkçûnî tewawîsiyan da boç regî kirdarekanî destey yekem bo dozî êsta/dahatû degorrêñ û ewaney destey dûhem her wek xoyan demêninewe:



Wek debînîn lew dû demkate da regî kirdarman gorranekî aşkiran be ser da hatûwe, debêt hey ci bêt? Basereta serîncêkî kirdarî nûstîn bideyn û legel herdû demkatî êsta û raburdûy kirdarî nûsîn da berawirdêkî bi-

keyn doxî raburdûy herdûkiyan awha ye:
(28)

nûs -t -m nûstîm
Nûs -î -m nûsîm

Wek debînîn regî kirdarekan xiş wek yek in, tenha dû nîşaney katî raburdûy cudawaziyan heye. Girîman regî hîç yekêkîyan goranî be ser da nayêt ew demedoxî êsta/dahatûy herdûkiyan awha denwênîn:

(29)

*(gwaye mebest denûwime)
de - nûs - m*
de - nûs - m denûsîm

Aweta dû kirdarî cudawaz, dû şîrazey pî rawpir wek yekî lê dekewêtewe, ke le rûy fonolojî û semantîkewe hest be hîç cudawaziyek nakrêt û alozîyek le wate da dirust dekat. Eme hoy ew gorankariye yeke be naçarî debêt be ser regî kirdarî "nûstîn" da bêt û konsonantî /s/ le dest bidat, dena natwanîn bizanîn daxa mebestî bêjer "nûstîn" yaxud "nûsîn" ke wate:

(30)

nûs-t-m = nûstîm
de-nû-m = denûm
nûs-î-m = nûsîm
de-nûs-m = denûsîm

De ba ewca serîncekî karî "xist" bideyn, debînîn ewîş regekey le doxî êsta/dahatû da konsonantî /s/ î le dest dawe û bîzwêni /e/ le cêgey heltoqîwe, birwane ger regekey negorrafa, ew dema kirdarekeçonî denwand:

(31)

xis -t -m *de -xis -m
xis-t-t *de -xis -ît
xis-t-î *de -xis -et

Le her sê nîmûnekanî katî êsta/dahatû da konsantî /s/ /e/ denge kipekey regey kirdareke, ke kewte nîwan dû konsonantî dengkipêkewe, yaxud ke kewte nîwan konso-

nantêkî dengkip û bîzwênekewe, debet xoy be konsonantêkî dengdar bigorêt:

(32)

s..... z/c.....c û v

(kip) (kip)

Ew deme doxî êsta/dahatûy kirdareke aw-hay lê dêt:

de -xiz -m*	dexizim
de -xiz -ît	dexizit
de -xiz -êt	dexizêt

Lêre da le rûy formewe hest be hîç cudawaziyek nakrêt, legel kirdar "xizîn" da, boye tenha kareser bo qutarbûn lew serlêşêwane gorînî regî yekêk lew dû kirdareye bew hoyawe regî kirdarî "xistîn" bew derde deçêt. Lem goran û gorankariyane da "de-bestim, degezîm" le giştian ba be hurdî le nîmûnekanî birwanin:

Bes -t -im = bestim de-bes-t-m = debestim
Ges -t -m = gestim de-gez-m = degezim

Em care regî kirdarî "bestim" le rîgey ledestdanî konsonantêkewe negorrawe, belke rîgey heltoqînî, yaxud destpêwegirtinî konsonantî /t/ewe gorrawe emeyan bo?

Ger ew konsonante nebêt, konsonantî /s/yî regî kirdareke bê saye û pena demenêtewe û le berdem ziryanî gorrane fonolojiye naçariyekan da, xoy pê ragî nakrêt. Wek konsonantekî kip le nîwan vokalêk û konsonantekî kip da, debêt bête konsonantekî dengdar ew deme awha lê dêt:

(34)

de -ç -m = deçim	çu -u -m = çûm
de -b -m = debim	bu -u -m = bûm
de -cû -m = decûm	cu -u -m = cûm
de -sû -m = desûm	su -u -m = sûm

Baş bo kirdarekanî nîmûney /b/ regekanyan hîç negorrawe?

Ey bo binwêni /u/ nîşaney katî raburdûyan le doxî êsta/dahatû da le dest nedawe? Aya eme dîj westandinewey yekêk le mercekanî yasay helzînan niye ke sereta destnî-

şanman kird? Edî ke wa ye boç nimûnekanî /a/ nîşaney katî raburdûyan la dêst dawe? Cudawazî le nêwan nimûnekanî /a/ û /b/ le wedaye ke nimûnekanî /a/ kirdarî têneper û nimûnekanî /b/ kirdarî têper ïn, ger nimûnekanî /a/ regekaniyan negerîn, ew deme katî êste/dahatûyan awha denwênet:

(35)

çu-u-m de -çû -m
bu-u-m de -bû -m

Wek debînin ewe neykirde doxî êsta/dahatû belke eme demkate ye ke be raburdû ïhtimalî "Konjunktîv" nêw debrêt.

3-4-2 dariştî doxî raburdû ïhtimalî "konjunktîv": Wek pêşan le pesey helzînan da diyarman kird, be şêweyekî giştî dû nîşaney dij be yek pêkra naçine ser kirdarêk, belam be pêçewaney zorbey here zorî zimanekanî dikewe, zimanî kurdî le dû nîşaney pêçewane û dijeyekî wek êsta û raburdû dox û demkatêkî dike desazênêt, ewîş demkatî ïhtimalî ye, wate kirdareke hem pêşgirî katî êste deçête ser û hem paşgirî katî raburdû /a/, ew kêşe û dijayetiye doxî ïhtimaliy lê dekewete-we.

Le doxî ïhtimalî da paşgirî kesî/jimare "koray risteke" cudaxwazî le nêwan kirdare têper û têneperêkan da dekat. Bew pê ye paşgirî kesî legel kirdare têneper da dûy nîşaney kate raburduweke dekewêt û legel kirdare têperekân da dûy nîşaney katî êsta dekewêt:

(36)

A: de -cu -u -um = decûm
de-nûs -t -m = denûstîm

de- -m cu-u = demcû
de- -m nûs-î = demnûsî

Detwanin şîrazey nimûnekanî pêşû bem şêwaze darêsin:

(37)

a. Konjunktîv: (Af + V + Af + Af)
(+present) (+într) (+past) (+P/N)

(dahatû/êsta)(Têneper)(raburdû)(kes/jimare)

b. Konjunktîv: (Af + V + Af + Af)
(+present) (+P/N) (+tr) (+past)

Ba bigerênetewe ser weramî pirsiyarekanman der barey nimûnekanî "deçim.debêt, deçûm, desûm". Gişt kirdarekanî wekî "çûn", "bûn", "sûn", "cûn", "grûn", "fermûn", "dirûn" le doxî raburdû da dû bizwêni /u/ le henawiyan da ye, yekêk wek beşêk le regî kirdareke, yekêkî dî wek nîşarey katî raburdû. Ew bizwêni /u/ ey nimûnekanî "deçûm, desûm" le demkatî êsta/dahatûd a destiyan pêwergirtuwe, ewe beşêke le regeke û nîşaney katî raburdû niye û dijî pirisnî pî yasay helzînan nawestêtewê. Tenha nimûnekanî "deçim, debêt" le demhatî raburdû da regekaniyan gorrawe, bizwêni /u/ regekeyan le dest dawe, ta tuşî sergêjeman neken û degel doxî ïhtimalî nimûnekanî "deçûm, deñûstîm" de lêman nealozêt.

4- Serencam:

1- Hîç ristayek bê kirdar, hîç kirdarêk bê kat û hîç katêk bê nîşane nabêt.

2- Ewey ta êsta be hele nêwî regî çawgî lê nirawe qalbî dekatî roburdû kirdarekaye, katî raburdû le regî kirdar û nîşaney katî raburdû daderêjrêt. Nîşaney katî raburdû ew tîpanen ke pêş /n/ çawg dekewin û pênc tîpi cudawazin lêksîkoy zimanake rênîmayiy e-we dekat ke her yek le nîşaneke katî raburdû be regî kirdarî şiyaw û guncawî xoyewe bilkêt, bo nimûne regî kirdar "gir" tenha nîşaney /t/ le gel da deguncêt, paşgirî /d/ yaxud paşgirî /u/ yaxud paşgirêkî dîkey pêwe bilkêt îdi bew cure:

3- Her diyardeyek le ziman da hokarêk û her hokarêk yasayekî le pişteye ye, bew pêye diyarday le yasaladanî hendek regî kirdar, wek pêştir rûnman kirdawe komelêk honkarî xoy heye û jîrbijîrî sepandûnî.

Perawêz û serçawekan:

1- Deqî em gotarem lew korey Silêmanî da

pêşkêş kird, ke rojî 17.9.1992 yekîtêyî nûseranî kurd-lîqî Kerkûk le yaney ezmîr boy saz kirdim. Em gotare la basêkî zor kurt e, lew serbasaney le karnamey doktoriyekem da "Hendek babetî wîsesaziy kurdî" lêykolime-tewe û salî xwêndînî 1992-1991 le zanîstgey Salzburg pêşkêş kirawe. Karnamekem lêkolîneweyekî zimanewaniyaney dûr lew rîbâze klasikaneye ye ke ta êsta bo tojînewey zimanî kurdî girawete ber, hewlim dawe le ber roşnayî teoriyekanî ew şarêcke be şoretî be "Transformation Generative Grammar" wi-sesaziy zimanî kurdî bitojmewe.

2- Tika ye birwane kitabî "Rezimanê Kurdî Berpêy Lêkolînewey Lijney Ziman Zanîstgekanî", Çapxaney Korî Kurd, Baxda 1976 û puxtey ew nûsinaney lem biwareda bo xwêner ragwêzrawin.

3- Le rastî da "denuwim" yaxud "nûstîm" cîdî kar nîn, belke risten. Ew xore ristanen ke le zanistî ziman da ristey serzarekiyan pê delên beramberekeyan ristey bincîn, wek "min denuwim" yaxud "min·nûstîm" ke le berkar (subject) û kar (verb) ranawî likaw (klitik)êk pêk dên. Hênde heye zimanî kurdî wek hendêk zimanî dîke, bo nimûne zimanî îtalî rîgey labirdinî berkareke dedat, çunke ranawe likawêke xoy be tenha detwanêt gûzare, le kesayetiy berkarekê bikat: Denuwit=to denuwît, nûst = ew nûst

Renge xwênerî zît lêre da lêm raperêt û bilêt le ristey serzarekî "nûst" da ranawî likawî tê da niye û legel eweş da rîgey labirdinî berkarekey dirawe. Le weram da delêm le ristey "nûstîm" iş da ranawî likaw heye, belam be der nakewêt, çunke ranawî likawî kesî sêhîmey tak legel kirdare têneperakanî kurdî da, ew core ranawanen ke le zanistî ziman da "zeromorphem"yan pê delên, wate hen belam dijariyan niye û sifrin û nîşaney ø' iyan bo danrawe.

To nûstît To nûs -t-ît = nûs -t -ît (nûstît)
Ew nûst -ø nûs -t = ø nûs -t (nûst)

Selkirk, E., 1982: "The Syntox of the Words", Cambridge, Mass.4-Aronoff, M., 1976: "Word Formation in Generative

Grammar", MIT Press, Cambridge, Mass.5.

6- Ew wîse û ristaney em nîşaney estêreye-yan (*) le pêşewe bêt, yanî hele û naqola û neşiyawin.

Lieber, R, 1980: "On the Organization of the Lexion." Diss.Massachusetts institute of Technolgy.

7- Cemal Nebez, Zimanî Yekgirtûy Kurdî, Bambêrg, 1986, L.44. Her weha birwane: "Zimanî axawîti kurdî be pê lêkolînewey Lêjney Ziman Zanistekanî" Korî Zanyarî Kurd, 1986, L.201

9- Lêre da debêt diyardey niwe bizwenekanî /w/ û/y/ kurdî le yad nékeyn, emaneyş ger kewtine kotayıy regekanewe, wekî konsonant hîsebiyan bo dekrêt û regeke paşgirî kesî sêhemî /-et/i pêwe delkêt /-at/ bo nomûney birwane kirdarekanî "xewtin" .. "kewtin" û "giryan"

de -xew -êt = dexewêt

de -kew -êt = dekekewêt

de -girî (-êt) (degîrî) degrîêt

10- Îdyosînkrat bew halet bêjuwe naçaweriwankirawey wîseke degutrêt ke ladane le yasa giştiyeke û pêşbînî nakrêt û idî wîseke deqî pêwe girtuve, bew hoyewe ew wîşâne debine wîseyekî ferhengî û cêgeyan lêksîkoy zimane.

Bynon, Ih., 1977: "Historische Linguistik", Dt. Ausgabe, München, 1981, Beck Verlag. 11.

12- "Kausative" Kauzatîv ke wişeyekî latînî ye, bew core kirdarane degutrêt ke le bineret da têneperîn, belam be hoy amrazêke-we taray téperyan be ser da dedrêt, le kurdî da paşgirî /-andin/ pirawpir bew erke heldestêt.

13- Boye hendek bizwêñ /ê/m le birtî /e/ be /a/ nûsiwe, ta xwêner bizanêt ewane le bine-çeda /a/, wate /l/ bûn û be tawî pêşgirî /de-/ (de-) kan êsta/dahatû bûnete /ê/.

Mamostay Kurd/ jimare 24-25

Kurdo Elî

Gerendinewey tipî latînî: Samî Berbang

FEQÎ HUSEYN SAĞNIC

Zman, navê wi parça koştê di davên can-darnada hayiye. Ev parça nermê bê hesti tam û lezeta xwarin û xwerekan di-hese û bî hemi temarêñ bedenan dide hesandin. Bi vi qasi ranaweste ew xwarinê jî ber diranan direve û dûr dikeve; wan bî awaki sere-rast dicivine û dide ber dran-an. Peywira wi bî vê yekê ji naqede; Pêşda diçe û alika-riya cütinê ji dike. Dema peywira cütinê diqede, zman disa dikeve dewrê; wê xwa-rina cûti berhev dike û dadibeline. Ew beşa li ber alo-manra, di navber drananda mayi, li derxistina wan dixebite û çi parçen bî dest keti, wan ji bî ali gewriyêve dişine. Di vexwerkanda ji peywirêñ gring benda wi-nin. xwezayı bî van ye-kan tenê peywirêñ wi naqedin, Di peyivinêda ji bandora heri gran behra wi-ketiye.

Belavbûna tama xwarin û vexwarinan: Serê zmên ji şerînayêra, her du rexên nêzikê serê zmên şorayêra, her du rexên li du wi tur-sayêra û pişta wi tehlâyêra û di sehekdar (hesdar) tirin.

Di nexweşiyanda zmên: Jelek nexweşî hene ku ji rengên zmên têne zanin. Ji ber vê yekêye ku gava bjijk kesek di pelidine (miayene dike) di navekra li zmên dinêre û gor vê yekê peli-dandina xwe didomine û di-

ghije biryarek. Çawan hnek nexweşî li zmên bandor dî-kin, wusan hnek nexweşiyê zmên bî xwe ji hene: Bêwe-ku brin û pizrûkên li dorê zmên dertêñ, werimina zmên û qansera wi ji nexweşiyêñ gring tên jmartin. Bi cudayı ew nexweşiyêñ ji dranêñ xrabeyêñ ne xwedikiri çêdi-bin, zmên gelek perişan dî-kin. nexwe dîvê em dranan û devê xwe baş xwdi bikin û ji hemi celebêñ nexweşî û qrêjayan biparêzin.

Piştî vê şirova kurt, êdi dî-karin bêne li ser zmanêñ candaran ku pê hevdu ser-wext dîkin. Nemaze mrov, gel û netewe pê huner, pişê (sene't) û şehrezayê tinin holê. Zêdaya vê yekê bi

tên bî karanin ji.

ZMAN

Zman pergala hevdu ser-wextkirinêye, pergalek wu-sane ku ji dayîkbûn û hya mrinê ji her kësek ra mina xwarin, vexwarin û wergîrtinê (li xwekirinê) peywiste. Hevdu serwextkirin ne tey-betiya kesan tenêye. Dî eyni gavêda ya saziyan, cvatan, gelan netewane ji. Ev yek çawan ne taybetiya kesan tenêye; wusan bî taybetiya mrovan tenê ji nayê hzirin. Lewra hemi celebêñ sawil (ajal - heywan) an ji her celebek bî awayê xwe hevdu serwxet dîkin. hemine ku serwextkirina wan ne weki ya mrovane. Ew bî hnek dengêñ xwerû (besit), bî hevleyistin û alastinê, li hevxistin û dûrbûnê xwestihêñ xwe bî hev didin zanin. Dîvê neyê ji birkirin; gelek ce-lebêñ sawilan hene ku mrov wan hinê zmanê xwe dîkin; bî peyvan û hevokan gelek karêñ gring bî wan di-din krin. Ev yek bî vi qasi ji ranaweste. Hnek jê hinê der-xistina dengêñ têvel ji dibin.

Zman çawan afiriye? Ber-sivadana vê pirsê bî awayek vebir, bî hêsani û zanisti ge-lek zehmete. Tenê bî hnek delilêñ jar û texminan, dikarin xwe nêzikê şirova vê yekê bikin. Jî vê xwe nêzikî-rinê tê zanin ku bî işaretan hevdu serwetkirin, beri bî dev û bî peyvan hevdu ser-wetkirinê hatiye holê. Di demêñ kevnareda, beri jina dewra zêran, ango di ser-

ZMAN

zmane ku di devda heyi tê holê. lewra jêra ji zman tê gotin. Halkubû, di gelek de-veranda bî işareteta çavan, destan, lêvan, bî rû tırşkirin, bri cotkirin, kenin, berken-bûnê, bî curbecur seri hejan-din, beden hejandinê û êd. hevdu serwexkirin pêktê. xwezayı ji van işaretanra ji zman tê gotin. Lê zêdaya van işşaretan tenê bî hevdura pe-yivinêda tên bikaranin. An-go kêra dûrpeyivin û nvisan-dinê nayêñ. Jî vanra, bî zor ew peyvîn ku bî alikariya zmên di devanda hati sazki-rin kërtêñ. Xwzay hnek işa-reten nvisandina ji hene û

despêka jina cvakida, bı işaretên curbecur hevdu serwext krine. Ew işaretên di wan demên kevnarêda hatina bikaranin hê ji hnek ji wan, taybetiyêne xwe winda ne kriñe û wusan dixwiyê dê nekin ji. Bêweku dema em ji keskra (nemâze ewê zmanê me ne zane an ji ji zarokekra) "Were" bibêjin, em destê xwe bı ali xweve an ji serê xwe bı ali berjêrve dihejinin û dema em "Here" bibêjin vajiyê vê yekê dîkin. Gava ji karek aciz bin an ji enirin eniya xwe dîqirmicinin û birhêne (biryen) xwe bı tundi bı ali hevduve dîkêsin û dîkin cot. Gava kêfa me ji karakra, ji mrovekra bê û di dema dilxweşiyekda, eni û birhêne xwe rast dîkin berken dibin. Dema karek, candarek û kesek bihecibinin û tekûziya wi bidin pişan, em tiliyên destek xwe bı drêjayi komê ser hevdu dîkin û awayê rci-fandinê dihejinin. Heger hecibandina me di dereca dawida be mirçinek û dû mirçenan ji lêvên xwe yê komküri ji derdixin. Heger ne ghiştibe tanga hecibandinê, bı tiliyên veküri destek xwe bı ali derve diweşinin û berê xwe jê dizvirin. Gava ji keskra "Ezê te buqutim an ji ezê li te xim" dibêjin, em destek xwe dîkin gulmîst bı hejandin pişa wi didin û gava mebest, daneqtan be, em her du destê xwe dîkin gulmîst, li ber çavêni wi, dusê caran li hevdu dixin. Celebên van curêne işaretan gelekin û ewen ghiştine dema me ji ne hindikin. Lê emê bı

van wekok û minakan bes bikin û bifetilin li ser zmêne yê ali din.

Disa ji wan nêzikayan tê zanin ku pêşveçûna mrovan û peywendiyêne wan rojbiroj zêde bûne û ghiştine hindavek wusan ku işaretan tenê têra hevdu serwetkîrinê nekirine. Vêca dengen xwe-rûyen curbecur şandine alikariya wan. Xebitandina beşek wan dengen kevnare ghiştine roja me û di hevdu-serwetkîrinê hê ji bikartinin. Bêweku dema ber bûyerrek karek bikevin, an ji xem bikin "Ah, ax, wax" dibêjin. Gava bûyerrek, karek li me xweş tê, "oh, ox" bikartinin. Beşek ji van dengan di wêja meda ji ci girtine. Qenc dêna xwe bidinê Melaye Cziri ev deng di nav hilbesten xweda çawan bikaraniye û diwana xwe bı wan çawan xemilan-diye?

Dilberê iro seher, avête cergê min du dox

Yek li sine yek li dil da, lew ji min tên "ax û ox"

"Ah û oxen" min ji dil tên, lê ji ber tira kızıl tên

Yan ji kovanen di kul tên, jê dizêt her xon û zox

Gava em guhdari peyivîna kesek dîkin û domandina wê dixwazin "ê" û gava jê aciz bin "h" dibêjin. Gava ji dervê guman û hêvidariya me bı bûyerrek, agahiyeq di hesin an ji ji mera tê gotin, ji devê me dengê "Him!" derdi keve. Di gazikirinda "Ey, hey!" di ya janda "Lê!" û di yê mîranda "Lo!" dîvê neyê

ji birkirin ku di jina rojaneda ci girtiye. Hejmara celebên dengan ji gelekin. Lê emê li vir bı van çend minakan bes bikin. Dvê bê zanin ku "Deng" weki işaretan ne nav gel û nav netewine. Mercen erdnigari, iqlimi û abori, çawan li ser xwiy, exlaq, çand û zmanê gel û netewan bandor kriye wusan liser dengan ji bandora wan dixwiyê...

Çawan di pêşveçûna mrovan û zêdebûna peywendiyanda işaretan têra hevdu serwetkîrinê ne kriye, deng ji wusan heya ciyek hatiye û êdi ne kariye bersiva, peywistyan bide. vê carê mrovan "Kite" şandine hawara dengan. Di seri pêşida kite ji wek dengan, ji tipek û du tipan hatine holê. Paşı bı ali rîzika tekûzbûneve gav avêtine. Ew ji gor mercen abori iqlim û taybetiyêne zmanan, di kitekda ji tipek heya şes tipan ci girtine. Xwezay

*Çawan di pêşveçûna
mrovan û zêdebûna
peywendiyanda
içaretan têra hevdu
serwetkîrinê ne kriye,
deng ji wusan heya
ciyek hatiye û êdi ne
kariye bersiva
peywistyan bide. vê
carê mrovan "Kite"
şandine hawara
dengan. Di seri pêşida
kite ji wek dengan, ji
tipek û du tipan hatine
holê.*

ev hejmara tipan, gor gelan û netewan dikare biguhere. Bi cudayı zmanê "Çin" ê bi kitan tenö tê peyivin. Ango di dewsa rızkirina peyyanda, tenê kitän lı dû hevdu rêz dîkin û hevokan pêktinin. Çawan tê zanin ku gel û netewê Çinê di rûyê zmanê "Yekite" da ji manendê xwe ne paşveme. Heya di demên kevnareda ji bî manedên xwera kari ne pêsbazi bikin. Bê weku 500 sal beri Zayinê, zanayek wek Konfûçûs ji nav wan rabûye. Dahênen wek dahêna demijmîrê wusan te-kûz ji lı wir hatiye holê. Ji heft sosret (xarêq) ên cihanê yek jê sedê Çinêye ku destpêka çêkirina wi dorê çarsed sal beri zayinêye. Û ev berhemâ mrês bî destê kar-ker, hosta, mimar û mi-hendzên Çini hatiye holê. Di van salên dawida ji ji manendê xwe para ne maye. Nemaze di pergalên elektro-nikda gelek pêşketiğye. Nexwe ji kitän dervazbûna peyvan ne mercê pêşveçûn û şehrezaya grane. yani zanin û şehrezayı, bî kitän tenê ji

hatiye holê. va ye ji malbatê zmanan, malbata "Çin - Tibet" ê gowah (Şahid) ê mijara me ye.

Taybeti û peywendiyê mrovan, carek din ji wusan pêşve çûne ku Zmanê Çinê ne têda, yê din êdi kitän ji bersiva peywesiyan ne dane. Vê carê Kite bî ali peyvan ve herikine. Pêşı bî kitek û du kitän peyv hatine holê. Paşi hêdi hêdi bî ali peyvên pirkiteve ji semitine. Bi vi awayi êdi hêsanter hevdu serwext krine û domekek drêj têra hev serwetkîrinê kriye. Lê borina deman, guherina aboriyê û pêşveçûna mrovan, wusan bandor lı besaya peyvan kir ku ji quweta hevdu serwextkîrinê êxist. Lewra peywistiya mrovan, bî hevdura û bî xwezayêra ghişte derencek wusan ku êdi bî peyvên xwerû çara hevdu serwextkîrinê ne mabû. Bi awayek din bibêjin: Pêşveçûn, peywendi û peywistiya mrovan besaya peyvan ji kevin kir. Dî vê deverêda mrovênek yekdeste ji cere ditina vê pişgirêkê ket. Lewra ji çaredina vê yekêra pispor di-viya. Çareserkirina pişgrêkêne weha dî destê wanda-ye. Vê yekê domekek pir drêj najot; dî nav mrovanda pisporê zmanan derketin. Bê rawestan, rahiştine vê pişgirêkê bî awayek zanisti pişkavtin û xistine bin xî-metâ zaninê û hevdu ser-

wextkîrinâ mrovan. Van zanayen hêja bî awayek hêsan û drîst, peyvv lı dû hev rêz krin hevok anin holê. Pêşı hevokêne xwerû û kurt, paşı gor peywistiya cvatan peyv

û endamên watedar û peywirdar lê zêde kîrin. Van peyv û endamên lê hati zêde kîrin, lı pêşı, paşı û hundirê hevokanda hatin cikirin. Bi vê rewşê ew hevokêne xwerû û kurt bî awayek tekûz hat xemîlandîn û drêjkîrin Pişti vê gehinêkê, êdi karê zmîn radestê rêzimanزانان bû û wan ji li yan dawîyanra rêzman xistine dewrê û dimeşinin.

Pêşveçûna zmîn hê ranewestaye û wusan dixwiyê dê raneweste ji. Em dev ji rawestanê berdin; herçqas hnek celebên pergalan digel nav û peyvên xwe ji holê radibin, hnek peyv ji dema xwe diqedinin û ji zmîn dikevin. Lê zmîn rojbiroj weşa xwe zêde dike. Lawra ji hemi celeb dahênanra pey-vek an ji pir peyv dixwazin. Çqas roj pêda diçe dahênen hê zêdetir dibin û gor dahênan, xwe nûkîrin û hejmara xwe zêdekirina peyvan normale. Xwezay ji bil dahênan, heyberen din ji ku daxwaziya wan ji peyvan heyi rojbiroj curên wan zêde dibin. Dîvê peyv, bersiva van hemi pêşveçûnan bide û ewji dide. Ji ber vê yekêye ku sêhezar sal beri Zayinê dorê hezar û hezar pênsed peyvan têra hevdu serwextkîrinê dikir. Lê iro zmanek normal zêdeyê çilhezar peyvan di binyata xweda diparêze. Dî nav xweşiyêda biminin.

Tebni: Emê di hejmarek dunda, ji demên kevnare heyâ sedsalen dawi, ew gngesün ji ali zanyaranve, lı ser zmîn-hati krin hildim destê xwe û qasi höza me bigiliyê pêşkeshê we xwen-dekarêne hêja bikin.

Pêşveçûna zmîn be ranewestaye û wusan dixwiyê dê raneweste ji.
Em dev ji rawestanê berdin; herçqas hnek celebên pergalan digel nav û peyvên xwe ji holê radibin, hnek peyv ji dema xwe diqedinin û ji zmîn dikevin. Lê zmîn rojbiroj weşa xwe zêde dike. Lawra ji hemi celeb dahênanra pey-vek an ji pir peyv dixwazin. Çqas roj pêda diçe dahênen hê zêdetir dibin û gor dahênan, xwe nûkîrin û hejmara xwe zêdekirina peyvan normale. Xwezay ji bil dahênan, heyberen din ji ku daxwaziya wan ji peyvan heyi rojbiroj curên wan zêde dibin. Dîvê peyv, bersiva van hemi pêşveçûnan bide û ewji dide. Ji ber vê yekêye ku sêhezar sal beri Zayinê dorê hezar û hezar pênsed peyvan têra hevdu serwextkîrinê dikir. Lê iro zmanek normal zêdeyê çilhezar peyvan di binyata xweda diparêze. Dî nav xweşiyêda biminin.

Wergê: Kerem Soylu

Li gor nirxandinên belave, şêrên ku têñ nêçirkirin hinek komên koreografi yên sosret pêşkêş dikin. Di ronahiya firehî ya rojavayê de, hinek pisiken bineve weke xirabîxwazên perwerdekirî, di navber siyê de, derdikeyin û nêçîra ku hay ji wan tune ye dev û dor lê digirin. Şêr, dema ku ji bo şiveke hevpar dixebeitin, têkoşina wan weke tevgera lawirêن civakî tê dîtin. Lê, bi salan e çavdêriyêن ku têñ kirin nîşan didin ku ev komeletiya wan ne hêjayî ewqas pesindayanın e.

Di sala 1978 an de, li ser şêran komeke lêkolînvanan dest bi çavderiyêن xwe dike.

HEVPARİYA ŞÊRAN

"Gelo şêr dema ku ji bo nêçîre bikin, çima koman çêdikin, çima çêlikên xwe xwedî dikin û mezin dikin û çima bi hev re dengê xwe derdixin? Çima gure gur dikin û dij-minên xwe ditîrsînin û didin revandin" Wan bawer dikir ku dê ev tişt bi temamî derxistana holê. Ev yekîti, di warê esasê guhertinê de, tiştekî dernabe. Eger serkeftina lebitîna mîsoger a sewalekî bi pir çêkirinâ çêlikên ku dijîn bê pîvandin gengaz e ku hevkarî her tim çenebe. Heke hevalê yekîtiyê pir comerd be hevalên wî li ser pişa wî pir fêde dibînin û kêf dikin. Her wiha gelo çima rêzikên gurherînî yên berjewendiyên şexsî yên genetik di şêran de nayê dîtin?

"Lêkolînvan fikirîne ku vê rewşê di du sê salan de çareser bikin. Lê şêr di warê tiraliyê de gelek pispor in. Ji bo vî awayî, di der barê

evgera pisikan de, dîtina danan demeke pir lîrêj û pir cûda divê bê lêkolandin û pîvan.

Li şîrê wan, xwîna wan û DNA'ya wan hûr hatiye nihêrandin, tomarêñ banda hatine sehkirin, pêlistok hatine xebitandin û eyarkirin; di her yekî de, gerdeniyêñ teqîba rad-yoyê hatiye biçîhkirin. Lê li gor encamên komeletiyêñ di navbera şêran de, xîmê guherînê ji texmînan zêdetir tevliheviyê derdixe holê.

Şêrên nêr ji yekî heya heş heban bi hinekê din re di herêmekê de heya dawiya jiyana xwe komikan çêdikin. Wan komikan bi tenê ji bo hêviya zêde çêlik çêkirinê nîne, ango ji bo jiyana biratî niyetek wî ya baş nîne. Piraniya hevparan ji dibistana bingehîn hatine perwerde kirin. Birayêñ nêr in, an jî law ap û law xalet in, yên din bi serê xwe, di pey koçberiya xwe de, hatine cihekî û ne xizmê hev û din in, komik ji endamtiya wan pêk tê. Dema ku qoalisyoneñ şêrên nêr digihîjin û pêşve diçin, têñ peywirdarkirin. Bi çavdêriyêñ keriyêñ şêrên mî û di navbera çend salan de, di kerî de çiqas çêlik çêbibin ew ji wan re bavîtiyê dikin. Di pey re qoalisyonek dijber nêzîkî kerî dibe û kerî diqewitîne, ji wan deran dûr dixe Ji bo vî qasî serkeftina şereki nêr bi zêde zayinê ve girêdayî ye. Bi têkoşina, wî ya li hemberî wan metirsiyêñ ji der ve têñ qoalisyone.

Şêrên nêr bi dûr kirin û qewitandina dagirkeran xebat û serkeftina xwe ya herî mezin didin nîşan. Ev rewşa li hemberî xebat û berjewendiyêñ wan tehdîta herî mezin e. Bi sev şêrê nêr bi deng derxistin û gure gura dengê xwe idia dikin ku ev der herêma wan e û bi dor, parêzvaniyê dikin. Lêkolînvanan dema dengê gure gura şereki bi teybê li şereki din didan guhdarî kirin, bersiv di wê demê de dihat. Cihê ku dengê teybê jê dihat şêr lê digeriyan dengê sexte yê di teybê de kifş dikirin û êris dibirin ser. Gelek ceribandinê bi vî rengî didin nîşan ku hevalên hevkariyê yên ne pismam jî wek birayêñ hevpar bi hev û din're girêdayîne û carnan şerek bi tenê bê hevalên hevpar nêzîkbûnâ wî ya bi bal teybê hatiye dîtin. Bi rastî nêzîkayıya şêrên nêr li ba teyba ku bi dengê sê şêran hatiye dagirtin û parastin ve ye, nêzîkî li ba intîxarê ye.

Bi piranî komikên mezin ên biçûk di-parêzin û idare dikan. Di qoalisyonê mezin de bi nêzîkayî şerênen nêr dema têkiliyê bi keriyênen mî re dikan piraniya wan ji ciwanan têن bijartînê. Dî pey re dema hinek cûdatiyan bi dest xwe dixin dema wan dirêj dibe û di bin serweriya wan de şerênen mî bêhtir pir dibin. Ji bo ku pir zayîn bi hevkarî û yekitiyê çedîbe bi serê xwe tenê hinek şerênen ku digerin bi hinek şerênen din ên yekane re hevkariyê çedîkin û hêza xwe dikan yek. Ev hevkariya ku pismamî tê de nîne endamti ji sê kesan zêdetir nîne.

Ew qoalisyonê ku endamên wan zehf in bi piranî pismamên nêz tê de cih girtine. Gelô çîma wan komikên ku ji sê kesan çêbûne û bo serkeftinê bi dest xwe bixin û bigihênen piraniyeke mezin, endaman zêde hilnadîn nav xwe? Sebebê vê dîsa genetik, e, ji bo

Braziyên ku hemantoxim hildigirin hin jî ger bi wekalet be jî êlê didin domkitin. Lê şerêkî bi şerênen nepismam re hevpariyê li darxe ji aliye pismaman ve nayê pejirandin.

Li gor kevneşopiyen şerênen mî ji bo nêçîra hevparî bi rewsek komelî dixebeitin dihat fikirandinê. Lê di lêkolînek pir nêzîk de lêkolînvanan daye zanîn ku wan şerênen bi rewşen qefle nêçîr dikan li gor yên ku bi serê xwe nêçîr dikan rewşa wan û jiyana wan ne rind e. Bi rastî dezavantajîya komikên mezin heye. Ji bo ku hevpar di girtina nêçîre de her tim nêzîkî yekitiyê nabin.

Şerêke mî dema li pey nêçîrekê bikeve di-be ku hevparênen wê tevli wê nêbin. Lê heke nêçîr têra temamê kerî bike ewqas mezin be wê demê hevpar bi astengekê re rû bi rû dimînin. Herçiqas nêçîra bi hevkarî bêtir bi serkeftine lê divê xwe bi zor bidin nêçîre û

Li gor kevneşopiyen şerênen mî ji bo nêçîra hevparî bi rewsek komelî dixebeitin dihat fikirandinê. Lê di lêkolînek pir nêzîk de lêkolînvanan daye zanîn ku wan şerênen bi rewşen qefle nêçîr dikan li gor yên ku bi serê xwe nêçîr dikan rewşa wan û jiyana wan ne rind e.

xwe biparêze bi taybetî ji bo bextewariya ku bibe bavê çêlikan û bextewariya ku bi hêsanî bigihije ba şera mî bi tundî girêdayî bi hevkêseya van herdû navberaye.

Ji bo ku şergelek çêlikan bi dest bixin, dîsa ev di navbera hevparan de digihîje parve-kirineke bi dadî. Di dema sorbûna cotîtiyê de dema şerê nêr şerêke mî dibîne bi kumresî wê diparêze çar rojan bi temamî jê naqete û şerênen nêr ên din, dema, ku nêzîkî wê dibin efiş dibe ser wan. Li DNA yê şopa tiliyan ku ji şeran hatiye hildan çêlikan ku carekê de ji diya xwe dibin ew dibe bavê tevan, pir çêbûna çêlikan di qoalisyonê de bi tenê di navbera du heb şerê nêr de bi wekhevî tê parkirinê. Di qoalisyonê mezintir de çend heb şerênen nêr dibin bavê piraniya çêlikan. Bê zarotî, heke brayê wî an jî pismamî wî ji şerê nêr bextewartir be di warê êlê de ew kotî nîne.

rîska birîndariyê bidin bef çavên xwe. Li a-lijê din bi serê xwe bi tenê nêçîrvanek bi serbikeve hevalê wî yên kerî xwarinek belaş bidesdixin. Ji bo vî awayî serkeftina nêçîrkîrina bi hev re girêdayî pisporiya hevparan e. Heke şera mî bi serê xwe tenê di baweriya serkeftinê de be berjewendiyê alîkariyê ji windayiyê wê derbaz nabe. Lê heke ya mî bi kêmânî be wan hevparan paşê bênen aliye wê dibe ku hinek awantajan bidin nîşan. Şerênen di parqa Serengetî ya netewî de nêçîren wek gakuvî an jî yên wekî zebrayê nêçîren zor de bi hevkarî xebata wan hatiye dîtin. Lê di nêçîrek hêsan de şera mî bi tenê gelek deman nêçîr kiriye; hevparan jî lê çavdêri kirine.

Merc di temamê cîhanê de wekî hev nînin. Şer di nêçîrkirina antîlopêni ku pir bilez direvin meydanê Namîbiyayê de pir pispor in

Lê şerek bi tena serê xwe di girtina vî lawirî de xwedî bext nîne ji bo wî qasî şer tim bi hevkariya şeran dixebeitin. Lékolînvanekî di navbera taktîka nêçirkirina şeran û di nav stratejiya refekî rugby de wekhevî damezrandiye. Di herduyan de wan ên di baskan de û ew ên di navendê de. Nêçîr, an jî topa, ku di navbêrê de ye, di demeke dê erîş dibin ser. Ev stratejiya ku pir pêşveçûye ew şerên Serengetî ku nehatine perwerdekirin li gor wan dijberiyek mezin dide nîsan.

Temamî şerên mî li Serengetiyê an jî li ku dibin, bila bibin dema ku çelikên xwe xwedî

aliyê temamî dayîkên komê ve têr mêtandin. Mêtandina hevparî di nav şeran de rind pêk anîna yekitiyê ye û rewşa herî baše. Endamên kresekê ji yek nêçîrek dixwin û pê têr xwedi kirin û vedigerin liba hevalên xwe ên grubê hinek ji wan xwîşkin; ê din qîzin yên mayîn qizapin. Pirê ji wan bi tinê dudu yan jî sê heb çelikên wan hene hinek ji wan yek hebek, çend heb ji wan jî xwediyê çar çelikanin. Lê kolînvanan gelek şerên mî dotine û şirê ku ji gihanîn hatine têra hejmara çelikan bûye belkî li gor xwarin û xwedî kîrina, dayikan şîr dîtine. Di nav kerî de hinek şerên mî çelikên wan pîrbûn şirê dayikan jî pivana wan wek hev bû wê demê dayîka ku çelikên wê hindikbûn ew tim bi comerdî dihat dîtin çelikên wan dayîkên din jî dimijand. Bi rastî dayîkên ku yek çelikê wan hebû şirê xwe yê zêde ji bo çelikên dîtir dibexşandin. Şerên mî yên di nav kresê de ên ku ji malbatek bûn comerdî di nav wan de pirtir bû. Ji bo vî tewrî belavkiran



û mezin dikin tim yekitî û hevkariyê pêk tînin. Şerên mî bi tewrek dizî dizên çelikin wan dema ku hêj tevnagerin ji bo ku ji êrişa biyaniyan bi parêzin wan di şopa çemek dêm de an jî di çiyayekî asê de, xwedî dikin û mehekê vedîserin. Dema ku çelik hêdî hêdî diliwin dayika wan ji bo ku tev li kerî bikin derdixin holê. Heke mîyek din jî çelikên wê hebin wê demê ew kresê dadimezirînin û ji bo zayînek di sal û nîvê de nêzî hev dissekinin. Cihê nêçîrê dema nêzîk be dayik çelikên xwe tevlî xwe dibin wê derê. Dema ku nêçîr dûr be dayik xwe xwedî dike pişt re çelikên xwe dimijîne û dide têrkirin. Dema dayîk ji nêçîreke dûr vedigere ew westiyayîne çelikên xwe di xew.de di mijînin. Di gelek kreşan de lêkolîn hatiye kirin ku çelik ji

na şîr girêdayiyê bi şirê zêde û xwîna di navbera wan de bû. Van faktoran tevgerên şera mî di nav geranda (Tur) dide xuyan. Şîrdayîna ku girêdayî bi komînê ve ye di navber, mişk, beraz û goşpereyîn ku ji malbeteke ne û di nav komîn hindik de bi piranî tê dîtin.

Şerên mî dema ku çelikên şerên mî yên din jî bimijînin berê çelikên xwe dimijînin wan çelikên din red dikin. Lê hewcedariya wan jî bi xewê heye. Bi saetan dema ku radikevin wê demê ji çelikan re mecal çêdibe. Çelika ku dayika wê tuneye dema ku bixwaze bimije divê ku li hêviya raketina şera mî bisekine an jî li hêviya belavbûna bala wê bisekine. Ew çelikên anîzaz ku ji westandina şerên mî feyde dibînin divê ku pir bi balkêş

bin. Comerdiya di navbera şêrên mê girêdayî yê bi guhnedayînê ye. Ewêñ mê yên ku naxwazin dev ji xewê berdin an çêlikên wan hindik in an jî ewêñ ji koma lêzimiyê ne kîjan bimije lê nanêrin. Keftara bi xal a mêt, vê pirsgirêkê bi birina çêlikên xwe li şikeftekê an jî li cihekî nepenî hel dike. Bi çûyin hatinêñ kin dayik tê cem çêlêkên xwe wan dimijîne û diçe cihekî din radikeve. Keftarêñ mê êwir-gehande çêlikan çavdêr dikan ew jî wek şêran ji aliye gelek çêlikên din ve têne zivêrkirin lê keftar ci ku pir çav vekirîne çêlikên ku ne yên wan in jêre astangî derdixin. Wan demêñ ku şêrên mê pir bi çêlikên xwe ve giredayîne jiyana bi komelî di nav wan de wê demê zêdetir bûye hatiye dîtin; êwirgeh (kres) a zarokan di rewşa navenda civakî de ye. Dayikêñ ku çêlikên wan tunene

**Lê belê şêrên nêr ji ên mê % 50 gi
ku mezintir in sedî sed dayik şer
winda dikan. Di rewşa xwîşk tiyê de
di şerekî wiha de bextê wan bêtir
zêde dike; di pir waran de hevparêñ
kresê bi hevkârî çêlikên xwe di-
parêzin û bi serdikevin.**

dema ku wan dayikan bi hevparêñ xwe re serlêdan çêke bi serê xwe tenê çûyine di eci-bînin, jiyana baş bernade ji xwarin û mêtjandina civakî dixwaze dûr bisekine. Dayikêñ ku civakî ne li gor ên tenha jiyan û xwedîkîrina wan kêmîtir e, ji bo xwarineke tim bi destê xwe bixe sistemekê wan a ji bo lê nihêrandina çêlikan tune ye. Ew dayikêñ ku li êwirgeha zarokan in, bi tenê xwe û zarokêñ xwe diparêzin.

Şereke mê ji bo ku çêlikan serbest bike hewceyiya wê bi du salan heye lê dema ku çêlikên wê bimirin di nav çend rojan de ji bo ku cot bibe li hevalên nêr digere û wê demê navbera herdu zayinan berjêri salekê dibe.

Şêrê nêr pir kêmî nêzikî li ba çêlikan dibe. Lê parêzvaniya herêmê bi rewşeke çalak didomîne, di gel vê rewşê dema ku civaka (qo-alîsyon) bavan (şêrên nêr) xera bibe şêrên dagirker zû dikan ku çêlikên nû çêkin.

Çêlikêñ ku ji qoalîsyona ewil ji para ve dimînîn dibin asteng, ji bo cotbûna wan dagirkeran bi şêrên mêt re. Ji ber vê divê ku bêñ tunekirin. Ji çaran yekêñ çêlikan ji aliye dagirkeran ve têñ kuştin. Dayik pir caran dibin qurbana vî şêrê bê dawî û pir caran çêlikên xwe li hember van dagirkeran diparêzin. Lê belê şêrên nêr ji ên mê % 50 ci ku mezintir in sedî sed dayik şer winda dikan. Di rewşa xwîşk tiyê de di şerekî wiha de bextê wan bêtir zêde dike; di pir waran de hevparêñ kresê (ewirgeha zarokan) bi hevkârî çêlikên xwe diparêzin û bi serdikevin.

Pirsgirêka şêrên mê şêrên nêr bi tenê nîne. Şêrên mê jî bi warê xwe ve girêdayîne. Qada nêçîra xwe, êwirgeha xwe û çavkaniyêñ xwe yên avê ji şêrên mê yên din diparêzin. Keriyeñ mezin ên piçûk idare dikan ên mê êrîş dikan û cîranêñ xwe dikujin. Cotîtiya şêrên nêr girêdayî yên bi salek û duda be jî lê cotîtiya yên mê dema wan heya 11 saliyê dajo. Bi vê sedemê şêrên mê şêrên wan ê sînorî ji qoalîsyona mîran dirêjtir didomîne û dema ku ewan rastî biyaniyan têñ êdî stratejiyeke bi tedbir pêk tînin. Şêrên mê dema ku dengê sexte yê teybê ji duda zêdebin êrîşa wan li ser reqîbê wan ê teybê hatiye dîtin. Şêrên mê dikarin bihejmîrin û terciha wan a sînorekî bi ewle heye. Hejmar mesela mirin û mayînê ye.

Kariyeñ şêrên mê li hember êrîşen dijiminê xwe amede ne û ji bo zêdebûna çêlikan jî civîna wan li cem hevûdin di şikeftekê de çêdibe. Dijminê di navbera nêr û mê de tu demê dawiya wan nayê. Di lêkolîna salan de ku domkiriye, lêkolînvanan bi sedan şêrên nêr hatin û çûne di nav tevaya qoalîsynê de xwe nîşandane û dagerkirine. Di pey cînayet û hevcotbûnê de belavbûne. Şêrên mê di serengetiyê de qâidîn herêma xwe danîne û ji bo her kerikî nû yekî din ji holê rabûye. Şêr ji bo xwelî û warêñ xwe bi cîranêñ xwe re şerkirina wan, ne bi kêfa wan e. Nêzikatiyê di vî warî de ji para venâgerîne. jî bo doza xwe ya hevpar şerekî esil ji bo dîtbariyê didin nişan. Lê qiralê temamê lawiran, li ser van tevan di nav civakekê de bi çekirina koperatîf û potayek malbatî di rewşek vekirî de, vekok daye xuyan.

LI PEYKA MARSÊ LI PEY ŞOPA JIYANÊ TÊ GERÎN

AMADEKAR:

Memed Serhedî-Turabi Şen

Di meha tûrmehê de, li fezayê mirovan, ga-va herî mezin a du-wemîn avêtin. Mirovan navgîna fezayê, ya bêmirov şan-de Marsa ku cîrana nêzîk a cîhanê ye û di nav gel de peyka sor” tê binavkirin. Piştî çûyîna mirovan a heyyê ku gava pêşîn a herî mezin tê pejirandin, mirovan ji bo li derveyî peyka cîhanê jiyan heye an tuneye lêkolînê bike berê xwe dane peyka sor a ku tê de hebûn û tunebûna jiyanê tê guftûgo kirin. Li marsa ku heta niha şopa jiyanê lê nehatiye dîtin lêge-rîn didomin.

NASA'ya ku di sala 1976'an de-bi navê Viking 1 û Viking 2, du navgînên fezayê şande Marsê 21 sal berê bi rîya van hacetan, ji marsê 50 hezar wêne şandin. Ev di dîroka lêgerînên fezayî de bû sedema dengvedaneke mezin. Lê belê van wêneyan di derbarê marsê de agahiye-ke xurt û fireh neda pisporan. Bi van navgînan re di sala 1982 yan de, danûstân-dina agahiyân qut bû. Dîsa jî, lêkolînerên fezayê, şopa vê peyka nepenî bérnedan. Di 4'ê Tûrmehê de navgîna fezayê ya bi navê Pathfinder (dahêner-Kaşîf) a ku NASA'yê şand dakete rûerdê

Marsê. Navgîna Fezayê ya ku piştî rîwîngîya heft me-han û bi leza di demjimêre de 2896 km'yî daketiye atmosfera Marsê ya bi navê dahêner (Kaşîf), bi “paraşûta supersonîk” ya ku cara yeke-mîn tê bikaranîn daket erdê. Pêşî “paraşûta supersonîk” vebû, pişt re bi riya balîfîn hewayî bi pekîn dakete rû-erdê Marsê.

Di hundirê navgînê de, bi n a v ê “Sojourner” ha-ceteke ku dirêjahi-ya wê 65 sn, bilind-a h i y a wê 30 sn, giraniya wê 10 kg ya bi 6 toterîk h e y e . Navgîna ku di hundirê wê de wêneger (kamera) û hacetên zanyarî hene wê m i n a - relên di zinaran de kifş b i k e . “Sojour-

ner” a ku di saniyeyekê de hûrdemekê dibeze û li ser rûyê Marsê digêre, bi tevâyî di 11 demjimêran de wêne şandin cîhanê. “Sojourner” a ku wêneyên rengîn dişine wê li herêma “Ares Vallis'a” ku li gor hin ramanan demekê av lê hebûye jî lêko-lînan bike. Zanyaran daxu-yandin ķu wê bi saya wêneyên ku ji “Sojourner”ê bêne şandin bigihêjin aga-



hiyên girîng û di dawiyê di derbarê çêbûna rûyê erdê de û li Marsê di rabirdû de hebûn an jî tunebûna jiyanê bigihêjin encamên girîng. "Sojaûrner" a ku navê parêzvanekî mafêñ mirovan ku di sedsala 19 an de jiyaye lê kîrine malîyeta wê 25 mîlon dolar e.

Zanyaran di wêneyên ku hetanî niha hatine şandin de di derbarê marsê de daxuyaniyên cûr bi cûr belavkirin. Li gorî zanyaran dema ku bi 1-3 mîlyar sal berî niha li Marsê karesateke lehiyê çêbûye, li cîhanê jiyanê dest pê kiriye. Her wekî ku tê zanîn li cîhanê, jiyanê 4 mîlyar sal berê dest pê kiriye. Dîmenenê ku navgîna fezayê briya pêlên radyoyî ji Marsê sandiye cîhanê, ji wan yek jî wêneyê kevirekî biçûk e. Li gorî hin zanyaran tê zanîn ku kevirê ku bi navê "Branecle Bîl" (Bîlê Zeliqok) hatiye binavkirin di encama teqîna Volqanê de gîhiştiye ser peykê. Kevirekî wekî wî, li Andêñ başûrê Amerikayê jî heye. Şopa ku avê li ser kevirê navborî hiştiye hate çewsandin. Ev jî di qonaxêñ Marsê yên pêşîn de hebûna avê nîşan dide. Li gorî daxuyaniyeke din jî, zemîna Marsê li gorî baxçeyê zarakane û erdkêşî li Marsê, weke ji sêyan yekê Cîhanê ye. Bi riya vê zarok dê karibin li gorî kêfa dilê xwe bilîzin, lotikan biavêjin û di ser zinarêñ yek mêtro re gav bikin. Li gorî pisporan, li wir pirsgirêka herî girîng ew e ku xîza sor wê zarokan bileyitîne, lê çareseriya vê jî,

cilêñ sor li zarokan kirin e. Ji ber vê, wê navê lehengêñ xêze filiman li zinaran bikin.

Berpirsên NASA'yê, di daxuyaniyên xwe de gotin ku, peywira wan a sereke li marsê ne peyitandinâ hebûna şopêñ jiyanê ye, lê derdorêñ zanistî ji ber ku du zanyaran sala bihûrî hin dîtin diyar kirin rexneyên tûj lê girtin. Li gorî daxuyaniyên berpirsên NASA yê, mirovê yekemîn wê di sala 2011 an de, here marsê û wê heta 2011 an ji bo mebestêñ cihê nêzî deh navgînêñ fezayê bişînin wir. Di vê navberê de navgîna. duwemîn "Mars global Surveyar" a ku wê di 11ê razberê de dakeve rûyê marsê dê li ser atmosfera marsê lêgerînê bike û hewl bide ku erdnîgariya wê xêz bike. Di derbarê wêneyên ku navgîna bi navê Sojourner sandiye de, hetanî iro daxuyaniyên cûr bi cûr hatine belavkirin.

Taybetiyêñ Peyka Sor Marsê

Rûpîvana wê6787 km

Hilmên di atmosfera wê de Qarbondiyoksît	%95
Azot	%27
Oqsijen	%0.13

Mars bi dema cîhanê ve Salek	687 roj
Rojek	24 demjmîr
37 deqîqe	
Bi şev germa herî kêm ...	73c
Bi roj germa herî bilind ..	27c
Germahiya giştî	-63c
Leza bê (ba) ...Di dem-	
jimîrê de 200 km	

Ji MIR ê re Alikarî Hate Şandin

Ji aliyekî , mirov ji ber ku navgîna fezayê ya bêmirov çû Marsê, şad û kêfxweş di be, lê ji aliyê din , ji ber qezaya ku li ıstgeha fezayê, MIR ê çêbû, di derbarê rewşa qozmonotêñ Ûris de ketin guman û metirsiyê.

Lê di encamê de Yekîtiya Dewletêñ Serbixwe (BDT) ji Qozmonotêñ xwe yên ku di rewşa tengav de mabûn re alikarî şand. Her wekî ku tê zanîn du qozmonotêñ YDS ê li Marsê bê oqsijen û elektrîk mabûn.

Ji navgîna fezayê, MIR a ku di dema qufilandin (kilitlenme) a ceribandinê de, qeza derbas kiribû re, bi keştiya Progress kargo ve alîkarî hate şandin. Keştiya ku ji bo yarmietiyê, ji balafirgeha Qazakîstanê hate şandin, di encamê de, bê qeda û belakete MIR ê.

Di 25 ê pûşperê de, di dema bi hevgirtinê de, di ıstasyona ku qeza derbas kir de, 4 panelên rojê yên ku di hundirê Spekt modul de, ji hevbelav bûbûn û ji hundir besekî oqsijenê derketibû valahiya hewayê.

Sê astronotêñ ku di hundirê navgîna fezayê, MIR ê de bûn demeke dirêj, di tengasiya elektrîk û oqsijenê de mabûn. Keştiya Progress kargoya ku ji bo alîkariyê hate şandin, têl û mistemoreke nû bir.

Metirsiya Kevirên Li Asîmên

Pêşnûmeya Çavdêriya Kevirên li nêzîkî Cîhanê (NENT) ya ku ji aliyê çavdêrîgeha Amerîkayê ya Bostonê ve hatiye sazkarin daxuyand ku li gor encamên lêkolînên ku kirine hin jî kevirên mezin ên ku li ser cîhanê gefan dixwin (Tehdit) di navbera cîhan û rojê de dicin û têñ.

Berpîrsa pêşnûmeyê Eleenor Hêlinê di dermafê mijarê de daxuyand ku mezinahiya ji 99 kevirên li asîman ên navborî her yekî km' yeke. Dîsa li gor Hêlinê ger ji wan keviran yek bê xwarê dê rûxandineke (tahribat) mezin rûbide.

Kevirê ku 65 mîlyon sal berî niha li cîhanê ketiye û dînazor ji navê rakirine mezinahiya wî 8 km bûye. Ji wan keviran nemaže 7 heb xetereke erjeng û mezin pêk tînin.

Di encama ji wan keviran yek bê xwarê de karesateke mezinê biqewime. Atmosferê di nav mij û dûmana ku wê ji erdê rabe de bimînê û sermahiyeke erjeng dê dest pê bike. Piraniya sewal û gîhayan dê bimirin.

Kevirên asîmên ên ku 8 mîlyon km nêzîkî cîhanê diborin dibe ku ji ber erdkêsiyê (yerçekimi) bikevin jêrê. Zanyar dibêjin ku ger ev kevir, xeterekê derxin holê wê bi moşekan (Füze) ji jêr ve bêñ lêxistin. Lê Elenor Hêlin der dibe ku ji kevirên herî mezin ên asîmên -rizgarî

ne gengaz e.

Li gor zanyaran piştî deh salê pêşıya me û beriya sed salî mîsoger metirsiya ketina ji van keviran yekî an jî çendan heye.

Navgînên Ku Sîxûr Herî Zêde Serî Lê Didin

Li sûkê peydakirina navgînên guhdarîkirina têlefonan ên ku hemî sîxûrên cîhanê bikar tînin êdî, pir hêsan e. Kesênu ku xwediyê van amûran in kîjan mirovî bixwazin, pir bi hêsanî dikarin guhdarî bikin. Bi pêşveçûna zanîstê re, bêtir biçûkbûna amûrên guhdarîkirinê dibin sedema mudaxale kirina jiyana taybet. Bi hêsanbûna van haceten ku sîxûr bikartînin re, êdî polîs û rîbir jî pir hêsanî dikarin nava jiyana mirovan a taybet.

Li Ewrûpayê, di markêtên mezin de, bi destxistina berhemî navgînên teknolojiya bilind pir asayî ye. Ji bo firotina wan, rîzik û zagonek tûne. Navgînên ku bi gelempêri, bi navê TX têñ nasîn, yêñ ku rîexistinê saloxdayînê bikartînin ev in:

- UXW 'ya pêlweş: (Veri-

ci) Bi pîl ve dişixule.

Dirêjahî: 6.5 cm ye.

Berahî: 2.9 cm ye. Wek quitiyeke biçûke. Di cihênu ku dê bêñ guhdarîkirin de, têñ bi cihkirin.

- UXB 'ya pênûs a pêlweş: Di pênûsekê de, têñ bi cihkirin. Hêza wê ya girtinana dengan bilind e.

- UX-CARD: Mezinahiya wê weke qarreve krêdiyê ye. Qarta guhdarîkirinê ya zirav. Dikeve binê deriyan, navbera pirtûkan an jî hundire bêrikan. Bi vî rengî guhdarîkirin pêk tê.

- UZC 1 an jî UZC 2: Amûra jimartinê (Hesap mk.) Di kargeh û ofesan de bi pîl û elektrikê ve bê balkêşî dixebyte.

- UZ-TMS: Di prîzen têlefonan de, têñ bi cih kirin. Kesê ku bi têlefonê ve digere û kesê ku guhdarî dike diyar dike.

- UXS. Bihîstok a (Ahize) telefonê: Kêliya ku axaftina têlefonê dest pê dike ji xweber hevdîtinê tomor dike. Ev navgînên ku di têñ û prîzen têlefonan de têñ bi cih kirin, ên guhdarîkirinê, ji km' yan dûr dikarin dengan bigirin.

- UXR-Centeyê Bond: Weke centeyê karsazan e. Cihê ji xwe re kiriye mebest, ji wir hemû dengan digire. Dikare dengê mirovan ji dengê din veqetîne.



Çalakiyên Enstituya Kurdî

Ferheng

Kar û barêñ ferhengê didomin. Ferheng dê kurdî-tirkî,tirkî-kurdî derkeve. Ji bo amade kîrina ferhengê komisyonek hate saz kirin. Ev komisyon ji hin sazî û kesan pêk tê. Dîsa ji bo ku ferhengeke zengîn û fireh derkeve holê ji hemî ferheng û ferhengokên heyî sûd tê wergirtin. Ferheng dê di bihara sala pêsiya me de di destê dilxwaz û evîndarêñ zimanê kurdî de be.

Çavkaniyêñ Ferhengê Endamêñ koma ferhengê

- | | |
|--|------------------|
| -Ferhenga Izolî | 1) Hesen Zinar |
| -Ferhenga Torî | 2) Zana Farpînî |
| -Ferhenga B.Rizgar | 3) Jiyana Rewşen |
| -Ferhenga Elî Seydo | 4) Samî Berbang |
| -Ferhenga Hêjar | 5) Kerem Soylu |
| -Ferhengoka ku F. Huseyn Sağrıç amade kiriye | |
| -Çavkaniyêñ ji her aliyê Kurdistanê | |

Zargotin

Koma vê xebatê ji endamêñ ku li Stenbol, Ahmed, İzmir, Mêrsin, Edene, Enqere, Erzerom, Mêrdîn û Wanê rûdinêñ pêk tê. Ev endamêñ vê xebatê ji bo ku xwe bigihînin çavkaniyêñ zargotina kurdî di nav hewldanê de ne. Kar û barêñ berhevkirin û hêjandinê didomînin. Di encama van hewldan û xebatan de berhemêñ wek çîrok, pêkenok, gotinêñ pêsiyan û hwd. ketin destêñ me. Di demeke nêzîk de ev berhem dê bêne çapkirin.(Hinek ji wan di A. We-lat de hatine weşandin)

Arşîv

Kar û barêñ vê besê didomin. Armanca vê besê ew e ku ci çavkanî, agahî, belge û qasêtêñ ku di derbarê kurdan de hene werin berhev kirin.

Konferans panel seminer

Di dermafê ziman, çand, wêje, dîrok, rewşa kurdan a ramyarî û hwd. de çalakî têne li dar xistin û dê bêne li dar xistin.

Panel û seminerêñ di van heyvîn borî de li

NÇM ê hatine li dar xistin:

-Arkeolog S.Bulut di 21.5.1997an de bi navê Li Mezopotamyayê Heterodoksî semînerek pêşkêş kir. Di semînerê de li ser têkoşînêñ cî-nî yên gelên Anadol û Mezopotamyayê û têki-lî û dan û standinê wan ên bi kurdan re ra-westiya.

-Di salvegera şehîdbûna Apê Musa de ji bo bîranîna wî panelek hate li dar xistin. Di panelê de jina Y.Kaya Yurdagül Kaya, kurê Apê Musa Dîcle Anter û rewşenbîrê kurd F.Huseyn Sağrıç bîranînê xwe yên di derbarê Apê Musa de anîn ziman.

-Dîsa nivîskar Ahmet Aras di 5.11.1997an de li ser zargotina kurdî semînerek da. Aras diyar kir ku di warê zargotina kurdî de herêma herî rengîn û fireh serhed e. Sedemêñ vê yekê jî di warê civakî û çandî de zengîniya vê herêmê ve girêda.

Pirtûkxane

Pirtûkxaneya Apê Musa ya ku di bin banê Enstituya kurdî de hate sazkinir ji bo lêkolîner û lêgerînerêñ ku li ser ziman, çand, huner, wêje û zargotina kurdî û hwd. lêkolîn û lêgerînan dikin di xizmetê de ye.Ji bo bêtir mezinkirin û firehkirina pirtûkxanê em li benda alîkarî û piştgiriya kes û saziyêñ welatparêz û pejnkîr in.

Qursêñ zimanê kurdî

Enstituya kurdî ji bo di nav gel de belavkirina zimanê zîmkârî û bersîvdayîna hêvî û daxwazîn gel xebat û çalakiyêñ xwe didomîne. Di vê havîna borî de ji bo gihadina mamosteyêñ zimanê kurdî qursek vebû. Kesêñ ku di dibistanê tirkî de mamostetiyyê dikin û kesêñ ku di saziyêñ wekî NÇM ê û hwd. de dixebeitin besdarî vê qursê bûn. Ev qurs nêzîkî sê mehan domiya. Kesêñ ku ev qurs qedandine li navçeyêñ HADEP ê û saziyêñ wekî NÇM ê û EGIT-SEN ê qursan didin û dê bidin. Qurs ji aliyê cîgirê serokê Enstituyê Hesen Zinar û endamê kargeriya Enstituyê Sami Berbang ve hate dâyîn. Dîsa di mehîn borî de li navçeyêñ HADEP ê yên Bağcılar, Bahçelievler, Fatih ê qursêñ zimanê kurdî hatin li dar xistin. Niha li cihan qurs hêj didomin.

Bernama Perwerdeya Zimanê Kurdî

Feqî Huseyn Sağrıç	Dîroka Edebiyata Kurdî
Şefik Beyaz	Dîksiyon
Torî	Çand û Edebiyat
Zana Farqînî	Dahûrandina Peyvan
Hasan Kaya	Edebiyata Nûjen
Samî Berbang	Gramera Kurmancî
Raif Yaman	Fonetika Kurmancî
Muhammed Salayî	Zaravayê Soranî

5 Berfanbar	saet 18.00	Samî Berbang
6 Berfanbar	saet 14.00	Muhammed Salayî
12 Berfanbar	saet 18.00	Samî Berbang
13 Berfanbar	saet 14.00	Feqî Huseyn Sağrıç
19 Berfanbar	saet 18.00	Samî Berbang - Hasan Kaya
20 Berfanbar	saet 14.00	Torî - Zana Farqînî
26 Berfanbar	saet 18.00	Raif Yaman - Şefik Beyaz
27 Berfanbar	saet 14.00	M.Salayî - Zana Farqînî
2 Rêbendan	saet 18.00	Raif Yaman - Şefik Beyaz
3 Rêbendan	saet 14.00	Feqî Huseyn Sağrıç
9 Rêbendan	saet 18.00	Samî Berbang
10 Rêbendan	saet 14.00	Torî
16 Rêbendan	saet 18.00	Samî Berbang
17 Rêbendan	saet 14.00	Muhammed Salayî
23 Rêbendan	saet 18.00	Samî Berbang
24 Rêbendan	saet 14.00	Zana Farqînî - Hasan Kaya
30 Rêbendan	saet 18.00	Samî Berbang
31 Rêbendan	saet 14.00	F. Huseyn Sağrıç - M. Salayî



ZEND

FORMA XWASTINÊ

NAV
 PAŞNAV
 NAVNİŞAN
 TAX/NAVÇE
 BAJAR
 WELAT
 KODÊ POSTÊ
 TELEFON
 FAX

Piştî ku we berdêla kovarê avêt bankê, bi
dekonta xwe re vê formê bi postê an jî faxê
bigihînin navnîşana me.

Navnışan: Atatürk Bulvarı Ceylan Palas Apt. No:154/12
Aksaray /İstanbul Tel:527 19 11 Fax:527 61 49

DEM...../...../.....

Min berdêla kovarê razand hesabê Turabi Şen ê bi nimroya 1050300 î yê
Türkiye İş Bankasıyê şûba Aksaray a Stenbolê.

Li gora welatan buhayê Zendê: Almanya 10 DM, Amerika 8\$, Avusturya 35 S, Belçika 150 BF Fransa 35 F İngiltere
5 P İtalya 6500 Liret Hollanda 10 Fl Swêd 30 Kr



ZEND

FORMA XWASTINÊ

NAV
 PAŞNAV
 NAVNİŞAN
 TAX/NAVÇE
 BAJAR
 WELAT
 KODÊ POSTÊ
 TELEFON
 FAX

Piştî ku we berdêla kovarê avêt bankê, bi
dekonta xwe re vê formê bi postê an jî faxê
bigihînin navnîşana me.

Navnışan: Atatürk Bulvarı Ceylan Palas Apt. No:154/12
Aksaray /İstanbul Tel:527 19 11 Fax:527 61 49

DEM...../...../.....

Min berdêla kovarê razand hesabê Turabi Şen ê bi nimroya 1050300 î yê
Türkiye İş Bankasıyê şûba Aksaray a Stenbolê.

Li gora welatan buhayê Zendê: Almanya 10 DM, Amerika 8\$, Avusturya 35 S, Belçika 150 BF Fransa 35 F İngiltere
5 P İtalya 6500 Liret Hollanda 10 Fl Swêd 30 Kr



SEMPOZYUM

ÇAND-CIVAKA SIVİL-DEWLET

BERNAME

Rûniştina yekem: 10.00 -13.00

Birêveberê civîne: Doç. Dr. Sungur Savran

Axaftvan:

Drûvekî civakî, civaka sivîl û bi dewletê re pêwendiyên wê
Prof. Dr. Mete Tunçay (Endamê Hîndekariyê yê Zanîngeha Bilgi)

Di rastiya çanda pir zimanî û pir kulturiya Mezopotamya û Enedolê de dewlet û
rêxistina birêvebiriyê

Cengiz Çandar (Rojnamevan - Nivîskar)
Şefik Beyaz (Serokê Enstîtuya Kurdî)

Têkiliya çand-ol û dewletê
Mehmet Metiner (Nivîskar)

Rûniştina duwem: 14.00 - 17.00

Birêveberê civîne: İsmail Göldas (Lêkolîner-Nivîskar)

Axaftvan:

Bandora zanîngehan, partîyan û çapameniyê ya li ser pêvajoya demokratîkbûnê
Doç. Dr. Haluk Gerger (Nivîskar)
Koray Düzgören (Rojnamevan)

Drûvê pir çandî yê Enedol û Mezopotamya
A. Melik Fırat (Mebûsê Erzeromê yê berê)
Prof. Dr. Mahir Kaynak

Cih: Mecidiyeköy Kültür Merkezi

Dem: 13.12.1997

Saet: 10.00 - 17.00

